Armanc

Danerê rojnameya pêşî ya Kurdî
Miqdad Mîthed Bedirxan

Hejmar - No: 1 Tîrmeh -July 1995 Buha - Price: 40 000 TL. 20 SKR. 4 DM.

Roj baş, Ey welatê şêrîn!

Di mirin û jiyana te de, di axîn û şekirrêjîya kenê te de, di serkeftin û têkçûna te de, di xewn û realîteya te de, di ewrên reşî giran de, di çirûsîna stêrkên te de, di bêrîkirin û şehîdbûna te de roj baş... Roj baş!

Li te vedigerim wek pinpinîkekê xwe li dora tîrêjvedana hinarkên te li ba dikim û sirûda te ya bi bendemanê rapêçayî bi nermebaskên xwe av didim, wek mêşa hingiv xwe li ser kulîlkên heftreng ên gerdena te datînim û te dimijim, ji bin zimanê xweyî birîndar bazbenda te, bend û ayet û govendên te derdixim da ku di guhên te de bi kurtepisteke lerzokî bibêjim: Roj baş ey welatê şêrîn!

Min şazdeh sal ji temenê xwe ji bo parastina kila subhanî ya çavên te terxan kirin... Min xwe bi nav û dengê te paye dikir û min di nûçe û bûyerên te de porê xwe sipî dikir lo!!

Şazdeh sal welato da ku rojekê tu pîrozbahîya bişirîna xwe bihingivînî ronahîya subehên miş-extî û penagehê.

Sipîndar û berû û kajên te, tirîyê Mûşê û mewijên Hebabê, şengebîyên Wanê û bastêxa Çêrmûgê, xizêmên rûperîyên Şernexê û teşîrêsên Diyarbekirê, dewkêlên Botan û Mîrê zimanê jêkirî, di bin çermên me de û di bin zimanên me de, di bînahiya çavên me de geş dibin, dibişkivin û di şevên seqemdar û tarî de li ber pencereyên giyanên me semageriya Xelefê Kinik dikirin lo!

Şar û gundên te, kolan û kuçe û duryan û tengerêyên te, havîn û zivistan û ne-buhara te, erê welato zerporê payîza te, şevbuhêrk û leylan û hêlînên qulingên perşikestî û kewên te yên xemgîn û çavxweşik, em hînî bilêvkirina sipehî ya navê te dikirin, em hînî mirina rewan û bêkêferat a di himbêza te de dikirin, em hîn dikirin welato:

- Ku çawan em dê ji te hez bikin.
- Ku çawan em dê lêvên kevirînî yên deşt û zozanên te, yên kuwîstan û havîngehên te gez bikin.
- Ku çawan em dê li ser sînga te nexşeya evîna xwe nîgar bikin û ku çawan em dê umîd û hêvîya xwe di şevistana serdemên te de cîwar bikin.

Nexwe piştî vê halanê, piştî vê sosretê û vê talanê, piştî wêranbûna jiyanê careke din rojbaş ey welatê şêrîn!

Em dê bi çi rûyî li hevdû temaşe bikin?

Şazdeh salên min di xunav û nimebarana te de, di dûman û barûda laşê te de, di birîna te de, di nav destên te de dimirim û ji xweliya xwe wek teyrê Sîmir (Anka, Phoenix) careke din ji dayik dibim da ku jiyana xwe bi jena dilê te bidomînim û bi zimanekî şêrîn ji te re bibêjim roj baş.

Armanc

Bîranînên Celadet Bedirxan

cara pêşîn di Armancê de

rûpel: 8-9

Piştî 16 salan...

Mumtaz Aydin

Armanc piştî 16 salên penaberiyê (maciriyê) wê bi vê hejmarê êdî li Stenbolê derbiçe. Helbet ev ji bo xwendevan û dildarên Armancê gaveke girîng e, çunkî, dema mirov tiştekî xweş, balkêş dixwîne dixwaze hinên din jî bibin şirîkên mirov, ew jî jê bêpar nemînin. Di vê manê de derçûna Armancê li Stenbolê ji bo xwendevanên wê yên nuha jî ciyê kêfxweşiyê ye, lê bêşik yên bi vê bûyerê herî kêfxweş dibin û ji bo wan herî muhîm e, xebatkarên Armancê ne; yên nuha û yên berê keda wan derbas bûne.

Dema mirov darek, kulîlkek çand, dûre êdî ne ya mirov be jî mirov dixwaze her şîn be. Dema têkoşerekî tê girtin, di dema wî ya girtinê de ji bo wî bûyera herî girîng domdariya ew xebata ku ew ji ber hatî girtinê ye. Ji bo her kesê ku şehîd dikeve ji bo wan, tiştê herî girîng piştî şehîd ketine wan domdariya xebatê ye, gihîştina armancê ye.

Armanc 16 salî ye. Di van 16 salan de gelek endamên redaksiyonê hatine û çûne. Gelek kesan nivîs tê de nivîsandine, nivîs rêz kirine, çapkirine, firotine, mîzanpajkirine û keda wan lê bûye. Çi bigre hemû jî bêyî feydeya wan a şexsî tê de hebe, bi dilsozî xebitîne. Yek ji xewn û daxwaza wan ew bû ku rojek ji rojan Armanc li welêt derbiçe û bigihe hemû Kurdên ku dixwazin, bixwî-nin.

Ez ji hejmara 50'yî, ji sala 1984'an vir ve di redaksiyona Armancê de me. Di salên 80'yî de, salên tarî yên di bin dîktatoriya leşkerî de, derketina Armancê li Tirkiyê yan li welêt ji me re qonaxeke pir dûr xuya dikir. Di nav nameyên xwendevanan ku ji me re dihatin yekcarna em leqayî nameyên ku bi daxwaziya "em hêvîdar in Armanc rojekê li welêt derbiçe" dawî lêdihatin, dibûn. Çavên me dibiriqîn, xweziyeke bêsînor bi me re çêdibû.

Herçiqas Armanc heta nuha li Swêdê derdiket jî, li hemû Ewrûpayê, DYA, Avustral-yayê, Cezayirê, Lîbyayê, Kanadayê, Qibrisê, Japonyayê li Suriyeyê, li Kurdistana Başûr, li Kurdistana Rojhilat digihîşt xwendevanên Kurd. Bi sînor be jî digihîşt hin navnîşanên Kurdistana Bakur. Heta serpêhatiyek me ya di vî warî de heye. Di salên 80'yî, di wan salên tarî de, carekê em wek redaksiyon li hev rûniştin, em fikirîn emê çewa bikaribin Armancê bighînin Kurdistana Bakur. Li ser pêşniyara hevalekî me biryar da ku Armancê ji hemû belediye û hin dezgeh û rêxistinên legal yên Kurdistana Bakur re bişînin. Me wextek dirêj ji wan navnîşanên ku me tespîtkiribûn re şand, herçiqas du-sê ciyan me agahdarî girt ku Armanc digihe destê wan jî, bi piranî me nizanibû, digihe destê wan an ne. Baş nayê bîra min, lê ez texmîn dikim sala 1987'a bû, hevalek ji Wanê hatibû, digot Armanc dighîje belediya Wanê. Dema cara pêşî ketiye destê wan, çend kes li serê kom bûne, rûpel bi rûpel qelibandine, lê tiştek jê fêm nekirine. Her yekî tiştekî gotiye. Hina gotiye bi Rûsî ye, hina gotiye bi zimanê Ermenî ye, hina gotine bi Kurdî ye, hina gotiye bi Latînî ye.... Ji nav wan, yekî ku bi jîrîtiya xwe nav daye, jixwe bawer gotiye bi Afganî ye. Wê demê pirsa bicîkirina hin penaberên Afganî li Tirkiyeyê aktuel bû. Ew fikra ku Armanc bi Afganî ye ji aliyê hemûyan ve maqûl tê dîtin.

Armanc şahida 16 salên dawî ya dîroka miletê me ye. Di manşetên Armancê yên 16 salan de, piştî hilweşandina Şah Riza Pehlewî, rizgarkirina Kurdistana Rojhilat ji aliyê PDK-Î ve, cuntaya 12 Îlonê li Tirkiyeyê, qetlîam û serîhildanên di girtîgeha Diyarbekirê de, şerê rizgarî û avakirina cepheya Kurdistana Başûr, qetlîama Helepçe, avakirina Tevgerê, serîhildana gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê, Enfala Reş, îlankirina Kurdistana Federe, vekirina parlamentoya Kurdistana Başûr, hilweşandina hezaran gundên Kurdistana Başûr, kuştinên "qisas ne diyar" dibîne.

Dîsan di nav rûpelên Armancê de gelek nivîskar, lêkolîner û siyasetmedarên Kurd yên hîn sax û hinek jî çavên xwe li jiyanê girtî, hene.

Hejmara Armancê ya yekem di Gulana 1979'an de li Swêdê derketiye. Heta hejmara 61'an ew bi du zimanan; bi Kurdî û Tirkî derçûye. Bi hejmara 62 û heta îro Armanc seranser bi Kurdî û li Swêdê derçûye. Ji vê hejmarê û pêve em dilniyaz in ku Armancê li Stenbolê çap bikin.

"Divê herkes ji xwe dest pê bike"

R. L. Seydo

Ava ku li sirgûnê pingiriye, ji bakurê dinyayê wek lehiyeke boş berê xwe dide cuhokên welêt û ji bo bi avên cuda yên welêt re bibe yek û erdên bi bereket yên Mezopotamyayê av bide, pêl bi pêl û bi hêvî diherike.

Tevî dijwariyên dûrbûna ji welêt jî, Armanc li sirgûnê hêvî ji dest berneda. Xebatkarên Armancê hêvî, bi lêmiqatebûneke mezin di dilê xwe de xwedî kir û nuha jî bi vê hêviya serîhildayî, berê xwe dide, kaniya hesretan.

Va ye Armanca şanzdehsalî di nava we de ye. Armanc, dixwaze wek yek ji wan kulîlkên cur bi cur ên ku bexçeyê di dilê me de dixemilîne, li welêt dest bi jiyana xwe ya weşanî bike. Hêvî ew e ku armancên we bi Armancê rohnîtir bibin.

Armancê şanzdeh sal berê wek gelek kovarên Kurdan bi Kurdî-Tirkî dest bi jiyana xwe ya weşanî kir. Lê ev rewş, tevî ku ji ber sewiyeya şiyarbûna neteweyî û nemaze ji ber sewiyeya şiyana(qabiliyeta) bikaranîna zimên dihat jî ne li gor dilê Kurdan bû. Têra bersiva xurtkirina wan daxwazên ku di warê xwendin û nivîsandina Kurdî de hebûn, nedikir. Armancê ji ber vê yekê, di qonaxa jiyana xwe ya weşanî de, îmkanên sererastkirina vê rewşê bi dest xist û xwe di vê nuxteyê de guherand û bi perspektîva ku dibêje; "divê mirov beriya her-tiştî xwedî li zimanê xwe derkeve", jiyana xwe ya weşanî heta nuha domand.

Îro pêwîstiya Kurdî, ji her zimanî bêtir bi xwedîlêderketinê heye.

Asîmîlasyona ku bi îmkanên teknolojiya nuh dijwartir bûye, zi-manê me ji her wextê bêtir tehdît dike. Kurd divê ne bi tenê di sloganan de, di jiyanê bi xwe de, li dîjî vê asîmîlasyonê rawestin. Awayê herî xurt yê derketina li dijî asîmîlasyonê jî hem di warê axavtinê hem jî di warê nivî-sandinê de, bi israr û bi berdewamî bikaranîna zimên e. Ger ev neyê kirin, pêşveçûn dê li hêviya me raneweste û wek ku heta nuha hatiye kirin, wê alternatîvên din li ser me ferz bike.

Divê herkes ji xwe dest pê bike. Ji bo ku em bikaribin yên ji derveyî xwe îqna bikin, divê em berê xwe sererast bikin. Armancê jî ji xwe dest pê kir. Ew, ji wê gava ku seranser bi Kurdî dest pê kir û heta nuha, di warê rakirina tesîrên asîmîlasyonê de fonksiyoneke mezin dileyize. Kurdîbûna Armancê ya seranser, di warê xwedîlêderketin û pêşdebirina Kurdî de îmkaneke xurt e. Wer xwuya ye ku Armanc dê ji îro û pê ve jî ji bo bicîhanîna berpirsiyariyên di vî warî de û bi wê perspektîva ku dibêje "neteweyê ku nikaribe li zimanê xwe bi xwedî derkeve, dê nikaribe daxwazên xwe yên din jî pêş ve bibe", her numûneyeke balkêş be.

Jiyana weşanî ya li Tirkiyeyê, bi giştî gelek dijwar e. Ev, ji bo weşanên bi Kurdî, qat bi qat bêtir e. Ez dizanin bê zehmetiyên der-xistina rojnameyên neteweyê ku hem ziman û hem jî hebûna wî tê înkarkirin, çi ne. Îro li Bakurê welêt, hemû gel mîna "talûkeyeke potansiyel" tête dîtin. Weşanên Kurdan perçeyekî pirr girîng ê vê "talûkeyê" ne. Érîşên ku tên ser van weşanan, roj bi roj dijwartir dibin.

Li welêt, wêranewarên li şûna bi hezaran gundan û dixanên ku ji wan diçin, bi isrardarî şahidiya dîrokê dikin. Jiyan wek feqeke vedayî ye. Xeta navbera jiyan û mirinê, pirr zirav bûye. De-mografiya welêt di tu demên dîrokê de marûzî mudaxeleyeke weha mezin nebûye. Çareserkirineke leşkerî, çav kor kirine û mejî rawestandine. Welatê me bi hêzeke mezin, ji nû ve tête dagirkirin. Di demeke weha de jî gelê Kurd li gel xebatên xwe yên din yên ji bo parastin û pêşdebirina maf û azadiyên demokratîk û neteweyî, bi awakî xurt xwedî li çand û zimanê xwe derdikeve..

Agahdarî

Aboneyên me yên birêz ên li derveyî welêt

Ji vê hejmarê û pê ve Armanc dê ji Istenbolê ji bo we bête şandin. Aboneyên ku naxwazin Armanc ji wan re ji Istenbolê bête şandin, divê me agahdar bikin da ku em ji wan re ji Swêdê bişînin.
Herweha aboneyên me yên li derveyî welêt divê heqê abonetiya xwe dîsa wek berê bişînin ser postgîroya Swêdê.

Armanc

Armanc

Rojnameya Kurdî ya Mehane
&
Monthly Kurdish Magazine

Hejmar, No : 159 (1)

Redaktorê Berpirsiyar:
Remzî Kerîm

Redaksiyon:

Mumtaz Aydin
Faris Can
Mûrad Ciwan
Nihat Elî
Ehmed Huseynî
Yakup Karademir
Mahmûd Lewendî
Hesen Mizgîn
Emîn Narozî

Berpirsiyarê beşê Dimilî:
Malmîsanij

Şertên Abonetiyê/
Prenumeration

Abonetiya Salekê
Maqam/Myndigheter
450 SKR

Skandînaviya: 250 SKR
Ewrûpa : 60 DM
Derveyî Ewrûpayê: 50 $

Anons / Îlan

en halvsida
Nîv-rûpel
2500 SKR
500 DM

Adres:
Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden

Tel: +46-8-803135
Faks: +46-8-801825

Postgiro: 4972255-6
Sweden

Adresa Tirkiyeyê:

Guraba Huseyinağa Mah.
DağarcPk Sok. Mehmet Han
No: 327 B, D:23
Aksaray-Istanbul / Türkiye

Tel-Faks: 212-6312515

Utges av:
Kurdiska Demokratiska
Arbetarunionen

ISSN: 0348 7385

Mûrad Ciwan

Rojev

Aha "Dewrana Kurdan"!

"... di dewrana zanyarî û veguhaztinê de, têkilî, dezge û wasiteyên wiha peyda bûbûn ku ji bo hevnasîn û nêzîkbûna Kurdên hemû perçeyên Kurdistanê, ji bo bihîstina hemû lehceyên Kurdî li çar aliyê welêt, ji bo belavbûna kultur û şuûra millî, agahdarî, zanîn û her awe rûdanên civakî yên ku yekîtiya miletekî tekûz dikin, endamên wê bi hev dikelînin û têkiliyên kûr û piralî di nava civaka wî miletî de dihûnin îdî ne şert bû ku mirov bigotaya divê Kurdistanek serbixwe û yekbûyî ya bi wê mahneya xwe ya heta roja îroyîn hebe."

Berî demekê min di kovareke hefteyî de maqaleyek li ser xusûsiyetên dem û dewrana îroyîn a nuhdestpêkirî nivîsî û min xwest ez tê de bidim xwiyakirin ku dereca pêşveçûna hêzên berhemhênanê (quwetên întacê); ilim, teknîk û wasiteyên civakê yên ku bi vê demê destpêkirine, li ser rûyê erdê, di navbera însanan de çi di çarçeweya navneteweyî de be, çi jî di ya neteweyî0 de be, têkiliyên bi wî awayî ava dikin ku civak û miletên herî zeîf, bêxwedan û bêîmkan ên wekî Kurdan jî xwe bi hebûn û îrada xwe dikarin di nava van têkiliyan de bibînin. Loma jî belkî bi awayekî provakatîf min navê nivîsa xwe kiribû "Dewrana Kurdan"*

Hin hevalên hêja yên ku ev nivîs xwendin, diyar e ji bo ku nebêjin "tu xeyalperest î" bi nazikî gotin "tu piçekî zêde optîmîst î"! Hûn li rastiyê bibpirsin min ew fahm dikirin û piçekî heq jî dida wan, lê di kujekî dilê min de ev tesbît her û her wekî ronahiyeka lerzok be jî berdewam dikir, dijiya.

Çendekî berê, gava di MED TV de min bala xwe dida munaqeşeyên hin zimanzanên Kurd yên li ser lehceyên Kurdî û li ser zimanekî yekbûyî yê nivîskî, wekî meriv gazê li agirekî ke, awirdanek di ronahiya lerizokî ya dilê min de pêl da. Min li ber çavên xwe dît ku îmkanên ku dewrana zanyarî û veguhaztinê pêşkêş dikin eger Kurd wan bi kar bînin, ji niha ve dikarin bi hebûn û îrada xwe di nava civakên din ên ser rûyê erdê de ciyê xwe bigirin.

Di wê bernameyê de, zimanzanên Kurd, li ser wê yekê radiwestiyan ku mesela yekbûna lehceyên Kurdî meseleyeke dûr û dirêj e û bi serxwebûna welêt û yekîtiya hemû perçeyan ve girêdayî ye.

Zimanzanan, ji alî nezerî ve rast digotin, lê nizanim ew dîmena ku di dema axaftinê de di mejiyê min de peyda bû, bala wan jî kişand an na, cara pêşîn min bi zelaliyek mazin dît ku di dewrana zanyarî û veguhaztinê de, têkilî, û dezge wasiteyên wiha peyda bûbûn ku ji bo hevnasîn û nêzîkbûna Kurdên hemû perçeyên Kurdistanê, ji bo bihîstina hemû lehceyên Kurdî li çar aliyê welêt, ji bo belavbûna kultur û şuûra millî, agahdarî, zanîn û her awe rûdanên civakî yên ku yekîtiya miletekî tekûz dikin, endamên wê bi hev dikelînin û têkiliyên kûr û piralî di nava civaka wî miletî de dihûnin îdî ne şert bû ku mirov bigotaya divê Kurdistanek serbixwe û yekbûyî ya bi wê mahneya xwe ya heta roja îroyîn hebe.

Her çendî Kurdistan hîn bindest bû û hudûdan ew perçe kirîbû, li her perçeyekî dijminekî zordar hukum dikir jî, bi rêvekirina satelîtê, li derveyî bin hukmê dijminan, televîzyonekê bi zimanê Kurdî bernameyên xwe diweşandin, li hemû perçeyan û li derveyî welêt, Kurdan li mala xwe ew temaşe dikirin, ne rejima Tirkiyê ne jî yên Iraq, Iran û Sûriyê nedişiyan rê li ber vê yekê bigirin. Bi vê wasiteyê Kurdên hemû perçeyan hay ji hev dibûn, lehceyên hev, stran û çîrokên hev, derd û kulên hev dibihîstin deng û silavên xwe digihandin hevdû. Li aliyekî Kurmancî, li aliyekî Dimilkî, li aliyê din jî Soranî li hemîû deverên Kurdistanê dihat bihîstin. Rast e bi milyonan Kurd cara pêşîn bû ku ev lehce dibihîstin û belkî jî jê fahm nedikirin. Lê min anî bîra xwe, ger ev tv tekûz û dewlemend û gurr û geş bibe, ger çend kanalên televîzyonê yên dîtir jî dest bi jiyanê bikin, ger em beşê Kurdî yê radyoya Dengê Amerîkayê di nav vê de bihesibînin û gelek radyoyên Kurdî yên din jî li gel wan peyda bibin û em bere bere heta deh panzde salên din dezgehên dîtir jî bi vî awayî ava bikin, ma gelo wê wextê jî Kurd wê ji lehceyên ku dibihîzin hinde xerîb bimînin, an na? Gelo lehce wekî îro wê dûrî hev bin, an na? Çend rojan piştî vê munaqeşa zimannasan guftû-goyek bi dîroknasekî Soranîaxêv re dihat kirin. Wî muhawele dikir bi awayekî welê biaxêve ku Kurdên Kurdistana bakur jî jê fahm bikin. Loma jî axaftina wî ne bi Soranî ne jî bi Kurmanciya adetî bû, tiştekî di navbera van her du lehceyan de bû. Ez fikirîm ku gelo dibû ku ev destpêka avabûna zimanekî yekgirtî yê seranserî Kurdistanê be. Gelo dibû ku piştî deh panzde salan yan jî demeke hîn dirêjtir zimanekî yekbûyî yê ber bi vî awayî de peydabibe?

Bi kurtî, min zelaltir dît ku gava di nivîsa xwe de, min navê wê dewranê kir "dewrana Kur-dan", ez hinde ne xeyalperest bûme, para rastiyê jî heta dereceyekê di tesbîtên min de hebûye.

Piştre ez kûrtir û firehtir li ser vê bûyerê fikirîm, min dît ku mesele ji bo Kurdan ne tenê bidestxistina tv û radyoyan e û ev yek ne ku îro peyda bûye.Vê qonaxê ji bo Kurdan deh-panzde salan berî niha dest pê kiriye. Hat bîra min ku îmkana derketina derveyî welêt bi wê hêsayî û berfirehiya îroyîn, berdewamî û himbiziya têkiliyan li gel welêt, avabûna komele, enstîtu, weqf û dezgeyên dîtir li derveyî welêt, weşandina kovar, rojname û pirtûkan destpêkên sivik ên basît ên vê qonaxê ne. Televîzyon û radyo bi ser da hatin ku ne otoriteyên serdest ên dijmin di hesêb de hiştin, ne jî hudûdên ku Kurd parçe parçe kirine. İmkana agahdariyên ku dezgehên derva û yên hundurê welêt bi hev diguhêzin; faks, komputer û bi taybetî jî telefonên bêrîkan yên seyyar berî panzde bîst salan belkî jî nediketin xeylên mirovan. Bi saya telefonên seyyar, radyo, televîzyon û merkezên nûçeyan bi hêsanî dikarin ji her gund û bajarekî Kurdistanê ji mala her Kurdekî yan jî ji serê her çiyayekî Kurdistanê ji pêşmerge an gerîlayan saniye bi saniye xeberên taze werbigirin û her di wê saniyê de li welêt û li cîhanê belav bikin.

Rûdan, divê di çerçewa hêzên berhemhênanê, teknîk û ilim de neyên mehdûdkirin; têkiliyên netewî û navnetewî yên ku vê pêşveçûnê bi xwe re tîne jî van îmkanan bi cîh tînin. Piçûkkirina dewletê bi bere bere rakirina mulkiyeta dewletê, mulkiyet û teşşebusa şexsî, têkiliyên civakî yên ku bi serbestiya veguhastina zanyariyê, xizmetan, sermiyan û gellek tiştên din tê, reqabet û serbestiya di karûbarê berhemhênanê, bazirganiyê, pêşkêşkirina mal û xizmetan de geş dibe, qelskirin û rakirina bendên gumrukan zêdetirîn xusûsiyetên ve dewranê ne ku rê li ber ferdan, hêzên sivîl ên li dervayî dewletê û civatên bê dewlet yên wekî miletê Kurd vedikin. Bînin bîra xwe, di dîroka Kurdistanê de wan demên ku hukumetên welatên serdest ên dagirker, siyaseta millîkirina petrolê, madenan û dewlemendiyên din dane ber xwe, dîwarên gumrukan rakirine, erd ji şexsan girtine û bi navê kooperatîfiyê an tiştekî din dane dewletê, demên herî qelsbûn, talanbûn û bêhêzbûna miletê Kurd in. Cardin, bînin bîra xwe, heke îro bi her awayî îcaza avakirin û meşandina radyo, televizyon, weqf, dibistan, çapxane û h. w. d. tenê di destê dewletan de bûna, Kurd wê bi tevayî ji van dezge û wasitan bêpar bimana.

Lê îro di piraktîkê de hatiye dîtin ku ji alî têkiliyên nava civakan, ji alî huqûq û peymanên navnetewî û bere bere jî netewî, Kurd dikarin bibin xwedanên gellek dezgeyan. Ji radyo û televîzyonan bigre heta bi avakirina dibistan û unîversiteyan enstîtuyên ilmî yên lêkolînan, dezgeyên kulturî û civakî yên din mumkin in. Şert û firsendên ku îro bere bere derdikevin, pirtir rê li ber sermiyandarên Kurd vedikin ku fabrîke û şîrketên şexsî yên biçûk û mezin deynin, di her aliyê kar û barê aborî de xwe bidin diyarkirin. Mulkiyeta dewletê çend biçûk bibe, qeyd û bendên resmî çend ji ser jiyana aborî rabin, serbestî têkeve nava vê jiyanê, Kurd ewende wê bikaribin pêşdetir û bihêztir bibin. Ciyê ku dewletçîtî tê de ye dewlet ji xwe wekî hêza miletê serdest rû dide û qanûn jî maf û îmkanan didin ferdên miletê serdest, şovenîzma wan xurttir û hartir dibe, miletên biçûk ên bindest bi muesese û ferdên xwe talan dibin, bêhêz dikevin, li bin piyan dipelçiqin. Ev diyardeya wê yekê ye ku çend serbestî têkevin tekiliyên hemû warên jiyana aborî û civakî, çend dewlet bi mulkiyet dezge û kar û barên xwe biçûk bibin, Kurd dikarin bêtir bîhna xwe vedin û imkanên pêşveçûn, dewlemendbûn û bihêzbûna civakî bidest xin.

Ev dezge, wasite û têkiliyên ku dewrana nuh bi xwe re anîne, hîn yên destpêkî ne, hîn bi kil û kêmasiyan malûl in û di qonaxa cenîniyê de ne. Têkilî, dezge û wasiteyên dewrana kevn a riziyayî hê mixabin li ser Kurdan serdesttir in, loma jî êş û azar hîn xurt in.

Lê ne lazim e ku em xwe di tengasî û kurtbîniya rojane da hebis bikin, çêtir û rasttir e ku di tesbîta rewşa xwe de, di ya îmkan û firsendên pêşiya xwe de, em xwedan perspektîfek dûr û dirêj, xwedan asoyekî kûr û fireh bin ku bîhnfireyiyek dîrokî dide mirovan.

Bawer bikin ku ez ne hinde jî xeyalperest im "dewrana Kurdan" destpê kiriye. Kurd û berî herkesî jî ronakbîrên Kurdan divê bi zanebûn û hişyarî dest bavêjin qevda vê dewranê û wê hişk zeft bikin.

"Lê îro di piraktîkê de hatiye dîtin ku ji alî têkiliyên nava civakan, ji alî huqûq û peymanên navnetewî û bere bere jî netewî, Kurd dikarin bibin xwedanên gellek dezgeyan. Ji radyo û televîzyonan bigre heta bi avakirina dibistan û unîversiteyan enstîtuyên ilmî yên lêkolînan, dezgeyên kulturî û civakî yên din mumkin in. Şert û firsendên ku îro bere bere derdikevin, pirtir rê li ber sermiyandarên Kurd vedikin ku fabrîke û şîrketên şexsî yên biçûk û mezin deynin, di her aliyê kar û barê aborî de xwe bidin diyarkirin".

** Ciwan Mûrad- "Kürt Cağı" Realite, hej. 7, 8-14 Adar 1995, Iatanbul*

Nûçe



Qurana Kurdî

Qurana Kurdî ya ku berî demekê ji aliyê seyda Abdullah Varli ve hatibû çapkirin, li gor biryara Heyeta Bilind a Karûbarê Dînî, hat qedexekirin. Vê heyetê biryar da ku nabe Quran wergere ser zimanê Kurdî, ji ber ku dema werdigere maneya wê xera dibe, loma jî ji bo parastina neguherandina Quranê nabe ku ew bi zimanê Kurdî bê çapkirin.

Wek tê zanîn seyda Abdullah Varli ji bo çapkirina Qurana Kurdî gelek caran ji Serokatiya Karûbarê Diyanetê daxwaz kiribû ku ew alîkariya wî bikin da ku vê wergera Kurdî çap bike, lê belê bersîva Serokatiya Karûbarê Diyanetê neyênî bû. Dûre wî bixwe bi îmkanên xwe ew çap kir û nusxeyek wê jî bi destê xwe di-yarî Serokkomar Suleyman De-mirel kiribû.

Alîkariya DYA

Alîkariya aborî ya ku DYA`yê pîlan kiribû ku bide Tirkiyeyê, di Meclîsa Nûneran de bû sedemê gengeşiyên mezin. Lobîyên li gel û li dijî Tirkiyeyê, li hember endamên Meclîsê argumentên xwe raxistin pêş çavên wan. Lobîya ku li hember mîktara mezinbûna vê alîkariyê derdiket, pirsa Kurd û rewşa mafê mirovan a li Tirkiyeyê raxistin pêş çavan û di encamê de sibeha 29`ê Hezîranê de alîkarî bi 26 milyon Dolarî hate sînorkirin ku ev mîktar ji pêncan yekê mîktara ku hukûmeta Clinton pêşniyar kiribû.

Rewşa awarte

Rewşa awarte ya ku li piraniya Kurdistana Bakur li dar e, careke din ji bo çar mehan hate dirêjkirin. Wek tê zanîn ev bû gelek caran hukûmet her dibêje ev cara dawîyê ye piştî mohletê ew dê vê rewşê rakin, lê piştî mohletê careke din li gor biryara MGK (Konseya Ewlekariya Millî)yê dirêj dikin.

Li Kurdistana Bakur ev serê 17 salan e ku çi bi navê îdareya urfîbe û çi jî bi navê rewşa awarte be, îdareyeke taybetî heye ku tu maf û qanûnan nas nake.

Raman

Rewşenbîr û Tabloyeke Rewşenbîrên Kurd

Serdar Roşan

Rewşenbîr kî ye, di nav civatekê de mirov ji kê re dikare bêje rewşenbîr, aya çi ye ku mirovê rewşenbîr ji kesên din cuda dike? Bersiva van û hin pirsên din di vê çerçewê de hertim di nav civatê de hatine munaqeşe kirin. Lê li ser vê kategoriya civakî lihevkirineke hevbeş nîne.

Dihête zanîn, di nav civatê de rewşenbîr bi xwe çînekî pêknaînin. Lê ji hemî çînan takekes di nav vê kategoriyê de cih digrin. Rewşenbîr dibin zimanê fikir û berjewendiyên cûr bi cûr. Bi karê xwe yê eqlî, fikrî û lêgerînê, ji ferdên civakê yên din cuda ne, heta radeyekî bi şêweyeke abstrak pirs û pirsgirêkên civakê munaqeşe dikin, didin munaqeşekirin. Heger mirov rol û xebata rewşenbîran di çarçoweya fikir û eqil de bibîne, wê gavê dîroka çêbûna vê kategoriyê, ji me gelekî bi dûr û kevin dest pê dike. Ango ji feylesofên kevin bigire heta bi rewşenbîrên îro rêçeke mezin û kevnare xuya dibe. Weke potansiyel kesên xwende û xwedî fikir ronakbîr in, lê her kesê xwende bi karê fikir û afirandina fikir ve mijûl nabe. Ji ber vê yekê hejmara mirovên ronakbîr di nav civatê de ne pirr e.

Di nav civatê de li ser rewşenbîrên kurd û rola wan bêşik hatiye nivîsîn. Lı vir bi gelemperî rola rewşenbîr di çerçeweya pirsgirêka netewî ya kurd de û li ser rola rewşenbîrên Kurdistana Bakûr dihête rawestin.

Rewşenbîrên civatekê berî her kesî li ser pirs û pirsgirêkên civatê dinivîsin, difikirin û munaqeşe dikin. Ji ber karê wan ev e. Madem hiş, fikir û rewşenbîr sê gotinên bi hev ve têkel in, wê gavê wacibiya karên di vê çerçeweyê de her barê rewşenbîran e.

Herweha di şirovekirina pirs û pirsgirêkên civatê de, derecaya yekemîn rewşenbîr xwediyên berpirsiyariyê ne.

Her rewşenbîrek li gora bîr û raya xwe, bi dîtinên xwe di nav civatekê de mecbûrî bingehekî xwe yê taybetî ye. Her ew cihê xweser dibe hoya hişazahiyê. Bêşik ev nahête vê maneyê ku kesên rewşenbîr di tu warî de nikarin bi kesî re kar bikin, an jî di nav kolektîvîteyekê de cih bigirin. Lê divê bête gotin, rola wî/wê ya rexnelêgirtin, ronîkirin, şirovekirin û lêhûrbûn li ku dibe bila bibe, divê nehête guhertin û windakirin. Gava ev rola wî/wê jê bihête girtin fonksiyona rewşenbîr winda dibe; û li cihê rewşenbîriyê **karmendî** dest pê dike. Di rejîmên dîktator, rêxistinên totalîter de hin caran ji ronakbîran karmendî hatiye xwestin û çi mixabin hin mirovan wazîfeya nîşankirî qebûl kirine û bûne berdevkên kardarên xwe. Bi vî şêweyî ji hişazahiyê xwe paşte dane, an jî mecbûrê xwe wekêşanê mane!.

Wek misilman dibêjin, mirovê rewşenbîr li ser pira siratê dimeşe, ango riya wî/wê şiverê ye, bi xwe rê û fikrên xwe diafirîne. Kesên ku li ser riya xwe bitirsin û veciniqin nikarin bi hişazayî bibin hoyê nuhkirin, xurtbûn û pêştebirina pêlên ramaniyê. Her-weha rexnelêgirtin û munaqeşekirin ne tenê li hêlekî mêze kirin e. Zordestî, neheqî û bêedaletî ji kû derê tê bila bê, divê mirovê rewşenbîr wacibiya xwe ya rexnelêgirtinê ji dest bernede. Ango divê ne cot stendard be.

Rewşenbîr ne kesê wergêr e. Divê di fikir û afirandinên nuh de xusûsiyetên xweser, yên taybetî, xwediyê giraniya berhemên ronakbîr be. Helbet ji dewlemendiya ramanên kesên din û ji gencîneya ramanî û kulturî sûd wergirtin pêwist e. Lê kesê ronakbîr divê li gora pirs û pirsgirêkên civata xwe ramanên nuh yên pêwist biafirîne. Xwe ji dubarekirina fikir û teoriyan biparêze. Ji vî aliyê xwe ve mîna hunermendekî vejêner û bi pênûsa xwe ronakbîr be. Jixwe pirs ne afirandin an jî peydakirina fikrên mutleq e. Di prosesa fikrî de ji bo mirov û civatê, ya girîng raberzîn (munaqeşekirina), ronîkirin û lêhûr-bûna pirsgirêkan e; bihêzkirina zanîn û ramanê ye, firehkirina çerçeweya munaqeşeyan e. Ma gelo diyarkirina çewtiya rastiyê û rastiyan! ne karê rewşenbîran e?

Rewşenbîrên Kurd

Li ser rewşa ronakbîrên kurd nivîsîn helbet ne karekî hêsa ye. Ev nehêsayî ji hevbeşıya civatê, zehmetiya rewşa kurdan ya li Tirkiyeyê û ji penaberiyê dihêt. Lê ligel van dijwariyan jî divê bête gotin ku, cih û rola rewşenbîrên kurd bi giştî hewceyî munaqeşeyê ye. Yên ku civatê munaqeşe dikin û li ser ramanê radiwestin divê karibin rewş û rola xwe jî munaqeşe bikin. Bi gotineke din divê rewş û rola wan bête munaqeşekirin. Aya rewşenbîrên kurd pêwistiya ku ji rewşenbîrekî dihête xwestin bi cih tînin an na? Gelo rewşenbîrên kurdan ji bo civata xwe rola xwe pêk dihînin? Ango bûne rewşenbîrên civaka xwe?

Munaqeşeyên ku di derheqê rewşenbîrên kurdan de, di çerçeweyeke teng de dihêne kirin û pirî caran nahêne nivîsîn, mirovî raberê dîmeneke(tabloyeke) ren-gîn dikin. Herçiqas ev bîr û rayên derbarê rewşenbîr û nivîsevanên me de zêde xwediyê bingeheke lêkolînî nebin jî, lê di warê rewşa rewşenbîran de fikrekê didin mirovî, an jî hasil dikin. Bi kurtî ev dîmena ku bi munaqeşeyan derdikeve holê, li vir bi şêweyekî din, ango bi nivîsê dihête gotin. Di xwendina vê kurte nivîsê de, mimkun e dîmenek guhertî ku dil pêxweş nabe û em napên derkeve holê. Armanc ne li ser takekesan nivîsîn û munaqeşe vekirine. Armanc munaqeşekirin û lêgerîna rol û pêwistiya vê kategoriyê ye û di vî warî de berbiçavkirina rastiyê(realîte) ye. Ez bixwe gava li ser vê pirsê fikirîm, min xwe di hin waran de xerîb hîs kir. Mimkun e hoyên vê yekê di nav rêzên jêr de bihête dîtin. Herweha pirr mimkun e ku gelek kes hin aliyên xwe di nav paragrafên jêrîn de bibînin. Lê ya girîng zelal kirina vê mijarê ye. Belê, ka em binêrin wêneya ku derdikeve ber çavên mirovî û dîmena ku dixuye, çawa ye.



1- **Melayên me**, yên ku li medreseyên klasîk ders wergirtine û bi giranî bi şêweya îlîm û olî perwerdebûne: Rewşenbîrên civaka kurd yên deverî ne. Têkiliyên wan bi civatê re germ û xurt in. Bi zimanê gel û bi şêweyeke ku gel fahm dike pirsan şirove dikin. Hizirkirina wan bi zimanê wan yê zikmakî ye. Ji klasîkên kurdan yên edebî haydar in. Di çarçoweyeke teng de difikirin, konservatîf in, ango di pêwistiya şirovekirina gelşeyên civakî de ne xwediyên ramanên ayende ne. Ji bajaran bêtir li gundan dimînin û mêla wan zêdetir li ser gundan e.

2- **Rewşenbîrên xwende**, yên ku di dibistanên "nûjen" de xwendine û bi zimanê tirkî difikirin: birek ji wan hewldanên ber bi zimanê kurdî nîşan didin. Lê di prosesa hizirkirinê de xwe ji tirkî fikirandinê rizgar nekirine.

- **Nimûneyek**: Bi xwe ne bawer e. Her cara ku nivîsekê binivîse çend entellektuelê bi nav û deng ji xwe re dike heval û şahid. Xwe dispêre wan. Dibêje "heger hûn ji min bawer nakin, va ye ji we re çend kesên bi nav û deng". Bi kêfxweşî zanîna xwe diyar dike. Di nivîsên xwe de feylesofên qedîm, entellektuel û navdarên heyî hertim bi bîr tîne. Bi vî awayî em haydarî deryaya zanîn û ramana rewşenbîrê/a xwe dibin û pê kêfxweş dibin! Pêwist nabîne zêde bifikire. Rastiyên ku bi gelemperî dihêne qebûl kirin dubare dike. Berê ku li gundê xwe di nav gelê xwe de bê naskirinê, dixwaze li bajarên mezin û bi taybetî li Ewrûpayê bi nav û bang be. Ji kevirên mermer gelekî hez dike. Heger ji ber wan keviran carna bilikume jî, zû bi zû acizbûna xwe eşkere nake.

- **Rewşenbîrê/a çep**; bê pêxemberan nikare bifikire. Lê xwe jî ji pêxemberan dizane. Ji ayetan gelekî hez dike. Her cara ku devê xwe vedike melayê gundan tîne bîra mirov. Bi zimanê gel nafikire. Bi zimanê gelê xwe hizirkirin û axaftinê karekî giran dibîne û gava bi zimanê xwe yê zikmakî dipeyîve, ziman di dev de diwerime. Di prosesa hizirkirin û afirandinê de bi gelşeyên civata xwe qîma xwe naîne. Berz û kûr difikire. Çareserkirina pirsgirêkên civata xwe, di çareserkirina gelşeyên okyanosê de dibîne. Pirr enternasyonalîst e!. Ji xwe mec-bûrî vê usûlê ye. Lewra "zanîna"! xwe ya kûr û fireh ji dergah û deryaya pêxemberên wê dinyayê wergirtiye. Derveyî ramanên deryaya xwe zêde napeyîve. Ji teorî û îdeolojiyê pirr hez dike, lê fikrên xwe bi dinyayê naguhere! Di vî warî de çîroka du bizinan tîne bîra mirovî!

- **Rewşenbîrê/a devşewitî**; ji pêxemberên xwe yên kevin gelekî aciz e. Lê ji mentalîta fikirandina berê xwe rizgar nekiriye. Dixwaze fikrên nuh biafirîne lê pirr lezok e. Sebra lêhûrbûnê nîşan nade. Dikare xewna xwe ya duhî-şeva berê-, wek teoriyeke nuh pêşkêş bike. Heger piştî çend rojan xewneke nuh bibîne, divê mirov mat nemîne. Fikrên wî/wê li ber vexwarinê meze(pêvexwarin) û li ber xwarina giran jî dikarin bibin saleteyeke baş!

- **Rewşenbîrê/a pîkbûyî** (tehmandî); bi xwe kurd e, lê xwedî li etnîtiya xwe ya netewî dernakeve. Zane ye, lê berhemên wî/wê ne ji bo rehên wî ne. Enternasyonalîstekî biyanî ye. Di bingehê xwe de ji enternasyolalîstî tûre dibe, lê ji bo xatirê pîka xwe, bi dil û can xwe bi şaxa xwe ve girêdide, da ku karibe rehên xwe ji bîr bike û xwe jê bi dûr bixe! Ji ajên hevetnogrûbiya wî/wê nebin, dê tu car bîr nebe ku kurd e! Derdê wî/wê, yê giran ne-karîbûna bilêvkirina dengên tirkî wek tirkekî ye, "Rojhelatiya" wî/wê bela serê wî/wê ye.

- **Rewşenbîrê/a çepikçî**; ji "govendê" hez dike, lê ji ber nekarîbûna rîtmî nakeve nav govendê. Li kêlekekî disekine, her cara fersend çêbe baş çepikan lê dide. Heger bê hemdî û bê wext çepikan lê bide jî li xwe nagire. Dixwaze hevalên wî/wê, hemî mîna wî/wê û bi heyecaneke mezin beşdarî xebatê bibin. Pirr realîst e! Ji ber realîstiya xwe newêre gaveke çewt bavêje. Dizane ku şiverê teng e.

- **Rewşenbîrê/a "Kurdçî";** bi vî navî tê naskirin. Tirkî baş dizane. Kurdî, ango zimanê neteweya xwe an nizane, an jî hindik dizane. Fikrên xwe yên derbareyê kurdan bi zimanê tirkî dinivîse, lewra ji bo kurdan be jî "tirkî" difikire. Bi dehan salan, beşdarî karê polîtîk bûye û ji bo rizgariya gelê xwe hewl dide, lê ji bo fêrbûna zimanê gelê xwe, zimanê xwe yê zikmakî wextê wî/wê nîne! Gelo kesek xêrxwaz heye ku trajediya vî/vê rewşenbîrê/î ji min re îzah bike!

Herê tu bi xwedê ma di vê dîmenê de we tu rewşenbîrên kurd dîtin? Bê şik rewşenbîrên kurd hene. Lê di maneya xwe ya ku divê mirov rewşenbîr be û pêwistiyên ronakbîriyê bi cih bihîne, rewşenbîr hene an na, ez bi xwe nizanim! ❐

Nûçe

General gefan dixwin

Çîroka guhartina hin xalên destûra esasî (anayasa) ya Tirkîyeyê her ku diçe dirêjtir dibe, parlamento ku xwedêgiravî organa herî bilind a dewletê ye, ji tirsa generalan nikare di destûrê de guhertinan bike.

Ordiyê ji devê cîgirê Serokerkan Ahmet Çorekçi dîtinên xwe li ber rayagiştî ya Tirkiye û Kurdistanê da diyarkirin ku ew, bi taybetî li dijî guhartina xala 8`an a destûrê ye. Ev xal hemû kesên ku bi çi awayî dibe bila bibe piştgiriya kurdan bikin wek terorîst îlan dike. Li gor vê xalê bi rehetî hemû kes dikare bibe terorîst. Ji yekê ku bibêje Kurd hene heta kesê ku ji bo rizgariya kurdan çek bi kar bîne dikare têkevin ber vê qanûnê.

Tîm meşiyan

Li Dersîmê tîmên taybetî ku li dijî kurdan şer dikin, di cenazeyê sê hevalên xwe de ku ji aliyê PKK`ê ve hatibûn kuştin; meşî-yan û li dijî parêzgerê (walîyê) Dersîmê slogan avêtin. Wan di meşê de slogana "PKK di nav me de" avêtin û parêzger sûcdar kirin ku wî emir nedaye ku ew Dersîmê bikin çol. Diyare piştî kuştina sê tîman, tîmên taybetî xwestine ku bajêr tarûmar bikin û ji xelkê gelek kesan bikujin.

Li Tirkiyeyê heta nuha ordiyê her tişt weka xwe dikir, lê diyuare tîmên taybetî û polîs jî ew in hêdî hêdî di nav dewletê de dibin xwedî hêz û peyv. Wek tê zanîn beriya demekê Mudurê Emniyeta Stenbolê Necdet Menzîr di cenazeyê polîsekî de li dijî hin berpirsiyarên hukûmetê ku ji CHP`ê ne peyivî û got: "Hin wezîr bi navê mafê mirovan terorîstan diparêzin û di şerê li dijî terorê de dibin asteng."

DDP li pêş dadgehê

DDP (Partiya Guherandina Demokratîk) ku berî demekê ji aliyê Îbrahîm Aksoy û hevalên wî ve hatibû damezirandin, beramber talûkeya girtinê ye. Dadgeha Destûrê (Anayasa Mahkemesi) ji ber di programa partiyê de behsa kurdan dibe, di derheqê vê partiyê de dawe vekir.

Li Tirkiyeyê ji ber sedema qanûna partîyên siyasî ku hebûna kurdan wek perçekirina Tirkiyeyê dibîne, partiyên ku di programa xwe de behsa pirsa Kurd dikin bi talûkeya girtinê ve rû bi rû ne.

Roj derket

Piştî derketina rojnameya hefteyî **"Ronahî"** yê, van rojan rojnameyeke din a hefteyî bi navê "Roj" dest bi jiyana xwe ya weşanî kir. Lê hem "Ronahî" hem jî "Roj" ê wek her tim nesîbê xwe ji berhevkirinê girtin. Çi hejmarê ku derketin, piştî çend seetan hatin musaderekirin û di derheqê berpirsiyarên wan de mahkeme hatin vekirin. Dewlet ji bo pêşîlêgirtina xebata legal a kurdan çi ji destê wê tê dike û dibêje em bi demokrasiya îdeal diçin.

Tiralî û Nezanî

Li gora lênerîna min, meqaleya Mûrad Ciwan a di quncika "Rojeva Mehê" ya Armancê de (hejmara Çileya Paşin 1995-an) balkêş e û hêjayî xwendinê ye. M. Ciwan di vê meqaleya xwe de, li ser tiraliya me radiweste. Meqaleya M. Ciwan ji min re bû wesîle ku ez hinekî li ser têkiliyên tiraliyê û nezaniyê rawestim. Dema min li unîversîteyê dixwend gelek hevalên min ên ji welatên Asyayê, Afrîkayê û Latîn Amerîkayê hebûn. Her çiqas em ji welatên ji dûrî hev bûn jî xusûsiyeteke me ya wek hev hebû; em ji welatên bi axê ve girêdayî û paşdemayî bûn û tiral bûn. Nexwe têkiliya van herdu xusûsiyetan bi hev re heye.

Pêvajoyên civakê ne wek ên xwezayê ne. Mirov dikare pêvajoyên xwezayê tecrûbe bike, bipîve, bi alîkariya hin metodên matematikê hesab bike, wan têxe bin mikroskopê, bi hinek aletên din li wan mêze bike û hwd. Lê hinek Pêvajoyên civakê ne wisa ne. Ji bo fêrbûna wan, mirov nikare metodên zanistên xwezayê bi kar bîne. Divê mirov li pêvajoya civakê mêze bike da kû ew li gelek deveran û gelek caran taybetiyên nêzî hevdû nîşan bide, mirov dikare wan abstrak bike û bighêje netîceyên zanistî. Ez li ser vê metodê rawestiyam û li gora xwe gihaştim netîceyeke weha: Têkiliya tiralî û çandiniyê - berhemê axê- heye.

Hinek taybetiyên ku berhemên axê, ji yên makînasanayiyê cûda dikin hene. Li gor sanayiyê berhemên axê weha ne:

1)- Pêşketin û xebitandina teknîk û zanistê di warê berdayina axê de derengtir û kêmtir e.

2)- Ev berdayin zêde bi xwezayê ve girêdayî ye.

3)- Li cihê xwe dimîne û bi tevayî nayê guherandin.

4) Mirov nikare berên ji berhemên axê wek ên sanayiyê bi şikil bike,

5)- Mirov nikare axê wek sanayiyê fireh û zêde bike.

Ev taybetî dibin sedemên bingehîn ku mirovên bi axê girêdayî ne, tiral in û zanîna wan kêm e.

Gava mirov bixwaze van taybetiyan bi numûneyekê veke, ya herî baş mirov gundiyên me yên Kurdistanê wek numûne bistîne. Gundiyên me tovên xwe payizê diavêjin axê û li bende rehma Xwedê dimînin. Ger axa wî avdayî be jî, ne avdayî be jî ew ê di mehên zivistanê de nikaribin di axê de karekî weha berdawamî bikin. Wekî din jî cihê kar tûnene yan jî cihê kar pirr kêm in. Ji ber ku tu karê din jî tuneye, bi şev û roj li ber sobeya germ, xwe dirêj dikin. Biharê di axê de çend karên ne berdewamî hene, lê disa jî pirraniya demên xwe de bêkar in û li ber dîwara ne. Havînê karekî pirr dijwar dikin ji bo berê xwe hilînin, bi şev û roj dixebitin. Ger weha nekin, ji bo berheman talûkeyên mezin hene. Payizê dîsa divê erdê xwe biçîne, ev jî demeke ne pirr dirêj e û piştî wê dîsa bêkarî dest pê dike. Her sal çi bigre eynî karî dikin. Ger ev awayê jiyanê, mirovan tiral neke, wê wan çawa bike?

Lê jiyana sanayiyê tersî vê ye, ji derveyî roiên rehetiyê her roj li gor programa ku karsaz daye ber karker, û memûran divê ew biçin ser karên xwe û karên xwe li gora ku hatiye tesbitkirin, bi cîh bînin, ya na makîne û kar li bende wan namîne. Ev jî kesan dike xebatkar, xusûsiyeteke xebatkariyê bi wan re peyde dike. Ji ber ku guherandina karên makineyan û idarekirinê dînamiktir e û zû tên gûherandin, zanistiyeke zêdetir, kûrtir û firehtir divê. Yekî Tirk ji kurê xwe re weha digot: " Lawo tu dê bixwînî, bibî muhendis, ma çi dikeve destê muhendisekî! Were di tûtinê de kar bike, perê qezenca tûtinê pirtir e."

Ger ez li ser qezenca kîjan karî pirr e, ranewestim, divê ez bibêjim ku wî kesê Tirk rast digot. Ji ber ku ji bo muhendisekî xwendineke bilind divê, lê ji bo karê tûtinê xwendineke pirr bilind navê.

Em Kurd ruhên kalikên xwe bi xwe re didin jiyandin, ev jî normal e. Adet û psîkolojiya civakên kevn zû bi zû nayên guherandin û zû bi zû ji ortê ranabin. Carinan ji bo ji ortê rabin, sed sal divê. Ev nayê wê maneyê ku dest û lingên me girêdayî ne, em nikarin li himberî tiralî û nezaniyê têkoşînê bidin. Şêweyên têkoşînê pirr in, yek ji wan ku ji bo me ya bingehîn e,"Xwendin" e. Ji ber ku aboriya welatê me di destên mêtingehkaran de ye, em nikarin siyaseta aboriya welatê xwe li gor menfaet û kara welatê xwe biguherînin. Lê em dikarin xwe biguherînin û ji bo ku em bikaribin zincîrên tiralî û nezaniyê bişkînin, divê em ji xwe dest pê bikin.

Bê guman hinek taybetiyên din yên berhemên axê hene. Ji wan hinek henin ku nêzîkiya wan û problemên me yên aktuel heye. Ez dixwazim bi kurtî behsa wan jî bikim. Yek ji wan, ji xwe nebawerbûn û ji qeweta dervayî xwe bawer kirin e. Bêguman li welatên sanayiyê jî ji xwe nebawerbûn heye, lê ev li welatên bi axê ve girêdayî ne, pirr zêde ye. Seddam li Îraqê, Ataturk li Tirkiyeyê, Xumeynî li Îranê û yên wek wan li dewletên wek van dewletan derdikevin ortê, ev ne tesadûf e. Li gel gelek sedemên din, sedema vê yekê paşdemayina civakê ye. Ev di tu civakên ku bi axê ve girêdayî û pêş de ne tûneye û na be jî Ev nayê wê maneyê ku li dewletên sanayiyê diktatorî tûneye û nayê holê. Gava mirov ji bo berhêmên xwe werbigre û jiyana xwe bidomîne, li bende qewetekê be, li bende hinekan be ku bên mirov îdare bikin, ev bi sedsalan di bin mejiyên mirovan de hêdî hêdî tê holê. Ma ne divê hinek ji bo mirovan jî bifikirin, ew jî serokên partiyan in yan jî kesên xerîb in. Ew ê bifikirin, emir bikin, yên din jî wê wan tekrar bikin. Bêyî kû li ser wan bi kûrayî bifikirin û bêyî ku bikaribin hesab bipirsin, wê wan bi cîh bînin. Yek radibe dibêje ev gelê Kurd bûye heywan, beşek ji gelê Kurd û di nav wan de jî hinek entellektuel, ji bo wî dibêjin "Bijî..... bijî....." Ev çi diyar dike? Madem ew îro xurt e, ew rast dibêje (!) bêyî ku rastiyê û çewtîtiyê li mêzîna faktayê bixin, biryara xwe didin. Gava beşeke mezin ji gel û di nav wan de jî entellektûelên Kurd bikaribin bi serê xwe bifikirin û bi xwe bawer bin, wê tu kes cesaret neke ku tiştên weha çewt û ne di cîh de bibêje û bike. Ev tişt li wan welatên ku hevalên min jê hatibûn, bi rengên cûda, lê bi eynî naverokê çêdibûn.

❒

Neynik

Selîm ACAR

Nûçe

Ordiya Tirk ket Kurdistana Federe

Di daxuyaniya PDK`ê de tê gotin ku sê gundî birîndar bûne û du gundî jî wendayî ne. herweha tê gotin ku gundiyên 18 gundan ku 800 malbat in û nufûsa wan ji 3 hezaran zêdetir e ji ber bombebarana ordiya Tirk ji gundên xwe revîne çûne devera Dîyana û Sardarê.

Ordiya Tirkiyeyê careke din ket axa Kurdistana Federe. Li gor agahdariyên ku PDK a Îraqê belav kirine ordiya Tirk di 6'ê Tîrmehê de bi balafir û tanqên xwe ji herêma Mizûra, qezaya Mêrgesorê bi firehiya 15 Km. ketiye nava axa Kurdistanê. Di daxuyaniya PDK`ê de tê gotin ku sê gundî birîndar bûne û du gundî jî wendayî ne. herweha tê gotin ku gundiyên 18 gundan ku 800 malbat in û nufûsa wan ji 3 hezaran zêdetir e ji ber bombebarana ordiya Tirk ji gundên xwe revîne çûne devera Dîyana û Sardarê. Li gor berdevkên ordiya Tirkiyê di vê operasyonê de 75 gerîllayên PKK'ê hatine kuştin. Heta rojnameya me ket çapê PKK'ê di vi warî de tu beyan nedaye.

Di 20'ê Adarê de jî ordiya Tirkiyê 35 hezar leşkerên xwe xistibûn Kurdistana Başûr û li Zaxoyê buroya informasyonê jî vekiribû.

Gundên ku gundiyan jê barkirine: Şîvê, Birkela, Mîroz, Bûsa, Bizyan, Koran, Balan, Dîzo, Sipîndar, Binavê, Bêndero, Çema, Gwîza, Sîlka, Sitûba, Sînya, Moka û Soma ne.

❒

Sûriye

Girtiyên Kurd ên Newrozê

Li gor daxuyaniya Rêxistina Derve ya **Partiya Yekîtîya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê**, 48 kurdên ku di Newroza 1995`an de bi biryara Wezareta Karûbarê Hundur a Sûriyeyê hatibûn girtin hîn nehatine berdan û li Heleb û Şamê di girtîxaneyan de ne. Di daxuyaniyê de tê xwestin ku dezgeh û kesên demokrat û mafperwer dengê xwe ji bo berdana van kesan bilind bikin. Kesên girtî ev in:

A- Girtiyên Kurdaxê (Efrînê) ku li Zîndana Merkezî ya El Mislimiyê ne:

Şaban Mihemed Hesen, muhendîs ji gundê Tirmûşa, **Ahmed Betal Kurdo, muhendîs Efrînê**

Ehmed Besrawî, muhendîs ji gundê Xirabê Silak, **Nûrî Reso, muhendîs ji gundê Xilalka**

Mihemed Camo, ajovan-şofêr-ji Efrînê, **Azad Elî Nahsan, ji gundê Heyderkê,** Osman Nesîb Îbrahîm, ji gundê Raco, **Ebdulmenan Husên Hec Xelîl, ji gundê Zecrê,** Ehmed Ebdul.-menan Hec Xelîl, ji gundê Zecrê, **Mihemed Henîf Yûsif, ji gundê Raco,** Mihemed Tahir Birîmo, ji gundê Gazê, **Henîf Abdîn Hemreş, ji gundê Kaxirê,** Ehmed Mihemed Îbo, ji gundê Kurzêlê, **Hemîd Mihemed Yûsif, ji Efrînê,** Şukrî Bekir Seydo, ji gundê Mûskê, **Nûhad Ebdo, ji gundê Kaxirê,** Cemal Arif Mihemed, ji gundê Zivingê

Ehmed Îsa Xalib, ji Efrînê, Mihemed Ehmed Elî, ji Efrînê, **Macid Ebdulrehîm Direê`î, ji taxa Şêx Mêxsûd, Heleb**

Mihemed Îbrahîm Şemo, ji Efrînê, **Fadil Sofî Osman, ji Efrînê,** Husên Ehmed Hec Reşîd, ji gundê Alemdara, **Ehmed Hemo Cafer, ji Efrînê**

Mihemed Bîlal, ji Efrînê, **Ehmed Îbo Kurdî, ji Efrînê**

Şukrî Ehmed Birîm, ji Efrînê

Mihemed Henîf Bîlal, ji Efrînê, Hesen Reşîd, muhendîs ji gundê Hecî Xelîl

B- Girtiyên di Newroza Şamê de hatine girtin û li Şamê di zîndanê de ne:

Arsilan Hesen Elî Goçar, ji Kurdaxê, **Îsmet Bekir Piling, ji Kurdaxê,** Mihemed Ebdulqadir Alo, ji Kurdaxê, **Ebdo Mihemed Ebdo, ji Kurdaxê,** Ciwan Ebdulrehman, ji Kurdaxê, **Mihemed Fewzî Hemze, ji Kurdaxê,** Îdrîs Husnî Sefer, ji gundê Qêrîk, Cizîrê, **Kamûran Husnî Sefer, ji gundê Qêrîk,** Cizîrê

C- Girtiyên ku di navbera 10-21`ê Adarê li Şam û Helebê hatine girtin:

Teyar Mistefa Bekê, ji Serêkaniyê, **Mihemed Amîn Ehmed, ji gundê Şîtika, Efrîn**

Ebdulrehman Horo, ji gundê Kotanlî, Efrîn, **Îbrahîm Betal, ji gundê Çeqelç-Cindêris, Efrîn**

Ferîd Horo, ji gundê Kemrok, Efrîn, **Hesen Zîbar, ji gundê meamel Qişaxî, Efrîn,** Ehmed Kulîn, ji gundê Şêx el Hedîd, Efrîn, **Bedirxan Mihemed Azîz, ji gundê Qetme, Efrîn**

Kamûran Hennan Mennan, ji gundê Kurda-Cindirês, Efrîn.

❒

Welatê ku nizane mafê mirovan çî ye

Di 1995'an de Amnesty International li ser girtiyên sîyasî li Sûriyê raporek derxist. Rapora ku bi navê "Îşkence û Ceza li ser kesên Jibîrkirî" ji 35 rûpelan pêk tê û careke din daxwaz dike ku rejîma Sûriyeyê di siyaseta xwe ya mafê mirovan û girtiyên siyasî de guhertinê bike.

Rapor dide xuyakirin ku hîn bi hezaran kes di zîndanên Sûriyeyê de ne. Ev kes zêdeyî 30 salan dûrî çava mane û li gor "Qanûna Rewşa Awarte" (Halet Tewarih) hatine mahkemekirin. Ev qanûn her tiştî dixe bin kontrola Muxaberatê.

Amnesty Internationel di rapora xwe ya ku di Tîrmeha 1994'an de şandibû de navên 1000 kesî dabûn di nav wan de hin Kurd jî hebûn û ji Sûriyeyê xwestibû ku rewşa wan diyar bike. Lê belê heta amadekirina rapora dawîn jî ji Sûriyeyê tu bersîv negirtine.

Rapor li ser gelek aliyên rejîma Sûriyeyê radiweste, lê bi kurtî dixwaze bala raya giştî bikişîne ser xalên jêrîn:

1.Nerehetiya Amnesty International ji rewşa girtiyan

2. Girtinên bi neheqî

3. Mahkemeyên siyasî yên berî 1992'an

4. Mahkemeyên siyasî yên piştî 1992'an

5. Bêmehkeme û bêsebeb girtinên demdirêj

6. Mirinên di bin îşkencê de

7. Wendakirina mirovan û tirsa kuştinê

8. Cezayên îdamê û bicîanîna wan

Rapor her weha li ser Mahkemeya Bilind ya Parastina Dewletê jî radiweste. Vê mahkemeyê ji 1992'an vir de, bêyî ku bihêle ku girtî xwe biparêzin û ji xwe re avukatan bigirin, ceza daye nêzî 500 kesan ku ji wan hinek jî Kurd bûn. Kesên ku Muxaberat navê terorîstiyê li wan kiribe, ji aliyê vê mahkemeyê li gora xalên 304 û 306'an ên Qanûna Rewşa Awarte ku di sala 1965'an de li Sûriyeyê hat deranîn, ji 3 heta 15 salan tên cezakirin.

Rapor, wek peyva dawîn, Sûriyeyê bi vî awayî dide nasandin: *Li dinyayê welatê yekemîn ku nizane mafê mirovan çî ye.*

Azad Ibrahîm-London

Zanist û Teknîk

Amadekar
Hesen Mizgîn

Jibîrkirina elektronîkî <

Peter Nilsson

Lêkolîna di warê dîroka malbatî de hobîyeke muazzam e. Min heta deh bavan peyde kir û ez di pirtûkên dadgehê de li ser pevçûn, şer û wan prosesên ku ew beşdar bûne, dixwînin. Pirtûkên dêrê, behsa dawetên wan, waftîzkirin û veşartina mirîyan dikin. Ez carinan meraq dikim; gelo dinya dê derheqa me yên ku di salên 1990-î de jiyane, çi bizanibe? Lêkolînerên dîroka malbatî yên pêşerojê dê li ser kîjan materîyalan bixebitin?

Ya rastî, mixabin ku dê tiştekî wan tunebe. (Belkî ew ê qet nizaninbin ku em jiyane jî - belkî jî wê haya wan ji hebûna me tunebe) Teknolojiya înformasyonê ya dema me -ji bo me çiqas muazzam be jî- wê ji bo jiyana pêşerojê bibe felaketek. Teknîk ewqas bi lez pêş ve diçe ku hemû sîstemên nuha hene dê di hundurê çend salan de kevn bibin. Dîsketên gelek kesan ji nuha ve kevn in û mirov dikare wan ancax bi saya cîhazên ku li muzexaneyeke kompîturan in, bixwînin. Enformasyonên di disketan de an yên di "harddisk"an de hene, ji notên li ser kaxizan hesastir in. Nepaqijîya hewayê û tîrêjên "kosmisk" wan xera dikin. Ji bo bi temamî wendakirina enformasyonan û xerabûna dîsketan, nêzîkbûna miqnatiseke biçûk têrê dike.

Xwendina belgeyên kevn dikare zehmet be. Ji ber ku destnivîs û hecekirin bi demê re tê guhertin û gotin tên jibîrkirin. Belgelên elektronîk yên çaxa me - ger ew bimînin- wê ji dinyaya piştî me re bibe pirsgirêkeke weha ku em nikarin tesawûr bikin. Tu sîstemên de-ma me dê bi sîstemên ku di salên 2000-î de bên bikaranîn re li hevdû neke. Mayîna Cîhazên ku ji bo dîsket û CD-ROMên dema me hatine çêkirin, ne bes e. Enformasyon kodkirî ne; ew ji yekan (1) û sifiran (0) pêk tên û ger mirov wan kodan nizanibe, ew enformasyon dê bê mane bin. Pêwîstî bi programek e ku li enformasyonê bigere û derxîne pêş û bi programa ku wan tercume bike, heye. Wekî din jî pêwîstî bi programên ku bikaribin bi hevdû re bêne girêdan da ku bikaribin enformasyonê bidin hevdû (Ev hemû weha tevlihev e ku ji bo îzahkirina vî tiştî rûpelekî temam ê Metroyê divê).

Kesên ku li dû me bên, wê çawa bizanibin bê di sala 1995'an de ji bo dîsketa min û ji bo sîstema min, kîjan program û kîjan kod hatîye bikaranîn,

Program bi xwe di medier elektronîkê de qeyd dibin. Di hin salên 2000-î de muhtemelen nefahmkirina dîsketên me û CD-ROMên me dê ji nivîseke Kîlî ya ji bo kesên ku bi Benbilî an jî bi zimanê Asûrî nizanibin bêmahnetir be û xwendina wan mîna Televîzyona kalikê mirov a ji sala 1920-î maye -ku wergireke kristal e-, nikare bê fikirandin. Ferqa lêkolînerê zimên ev e; tevli ku bi hezaran sal berê bi wî zimanî hatibe peyvandin jî ew dikare zimanê kevn tercume bike. Jînûveafirandina programên jibîrkirî yên ku bi zimanên kevn û ya progrogramên komputerên di dema kevn de hatibin çekirin bi peyva kurt ne mumkun e.

Jeff Rothenberg ê li **"RAND Corporation"**ê wek lêkolînerê komputerê dixebite, "di van nêzîkan de, di **Scientific Amerikanê** de meqalaleyeke reşbîn nivisand. Ji bo parastina enformasyonên elektronîk ên dema me metod hene, lê pirr tevlîh in û zehmet in, buha ne û wext dixwazin. Gava sal di ser wan re derbas dibin, bikaranîna wan bêtir ne pratîk û ne ekonomîk dibin. Em ê belkî ji mecbûrî bifikirin ku tiştên em di "medier"ên xwe yên elektronîk de qeyd dikin, wê di demeke kurt de nikaribin ji alîyê tu kesî ve bên xwendin.

Bê kaxizî, belkî fikreke baş be, lê bi tenê nihîlîstekî heqîqî dikare civateke bêkaxiz xeyal bike.

Metro 28. Wergera jiSwêdî
Mustafa Aydogan

Li dinyayê zarokên di navbera (10-14 salî) ku bi zorê tên xebitandin (%)



Li asîmana Seyahat

stendin.

Ev mesafeyên ku hatine stendin, helbet hilberîna zîrekî, cesaret û qewîbûna xeyala wan bû. Şîrketa Zanistî ya Pêkanîna Navnetewî ya Amerîkî (SAIC) qewîtiya xeyalê dide pêş û salnama xwe ya zanistî pêşkêşî însana dike û derîyê zanistîya lêkolîna asî-manê ji bo hemû dinê vedike. Programa SAIC a 12 mehî wiha ye;

Çileya Paşîn - 1996: Keştiya asîmanî ya ku bi sîstema laserê dixebite û enerjîya xwe ji tîrêjên rojê distîne, dest bi seyahata xwe dike.

Sibat - 1996: Keştiya asîmanî dê bigihîje îstasyona Amua-lsenê ku 20 km derê hîvê hatiye avakirinê.

O P
O
O O P
P O P
P O
P

Adar - 1996: Robotên ku ji alî teknîkî pirpêşketî ne, di hezaran km kurahîya bin erdê hîvê de lêkolînê bikin û wê agahdarî bidin keştîya merkezî.

Nîsan - 1996: Eger tu tişt - wekî fosîl, hilberînên însanî û şariştanîyê neyê dîtin, merheleyek nuh wê dest pê bike.

Gulan - 1996: Ekîp wê dest bi vatîniyeke nû bike. Ew ê nêzî merkeza stêrka bi dûvik a ku bi navê Wilson Harrington hatiye navandinê, lêkolînê bikin.

Hezîran - 1996: Ewê li hîvê tesîsek ku wê oksîjen hilbirîne, ava bikin.

Temmûz -1996: Ev xebata ku navnetewî ye, valahîyên sosyolojîk û teknolojîk yên di navbera welatên ku tevlî vê xebatê bûne, dê bête tijekirinê.

Tebax - 1996: Keştîya asîmanî wê dest bi seyahata xwe ya ber bi rojê bike.

Îlon - 1996: Lêkolînerên ciwan wê sîmulatorên xwe yên rastî yên sanal bi kar bînin û weke ku li rûyê hîvê bin wê lêkolîn bikin.

Çiriya pêşîn - 1996: Keştiya asîmanî dê piştî 500 rojan bi nimûneyên xwelî vegere dinê.

Çiriya paşîn - 1996: Jeolog wê li hîva stêrka Îda Dactylê lêbikolin.

Çileya Pêşîn: Alimên asîmanî wê piştî xebateke dûr û dirêj dest bi îstirehetê bikin. Ewê îstireheta xwe li otêla ku li hîvê hatîye avakirinê, bikin.

Nivîskarê çikos û mêrxas

Azîz Nesîn mir

Nivîskarê bi nav û deng yê mîzahê Azîz Nesîn di 6'ê Tîrmehê li bajarê Îzmirê li qezaya Çeşmê çû ser heqiya xwe. Azîz Nesîn 80 salî bû.

Azîz Nesîn nivîskarê mîzahê yê Tirk bû, ji 100 kitêban zêdetir berhemên wî hebûn û kitêbên wî li gelek zimanê biyanî jî hatibûn wergêrandin. Gelek diyariyên edebiyatê jî wergirtibûn.

Nivîskarekî ateîst û li hember fundementalîzmê bû. Di jiyana xwe de tu carî bi dewletê re li hev nehat.

Ji bilîî nivîskariya xwe wî bi dîtinên xwe yên orjînal rojev tayîn dikir û li hember fundementalîzmê şerekî bêhemba dida. Ji ber wê jî gelek caran jiyana wî ketibû tahlûkeyê. Berê mirina



Foto: Armanc

xwe du sala ew li bajarê Siwasê ji şewitandine bi zorê xelas bûbû ku di vê buyerê de 37 ronakbîr û hozanên pêşverû hatibûn şewitandin.

Nesîn bi beyanên xwe yên li ser pirsa Kurdî gelek caran ketibû rojevê û hatibû mahkemekirin. Wî dîtinên xwe li ser pirsa Kurdan eşkere digot: "Çi mafê Tirkan heye bila yên Kurdan jî qasî yê wan be." Lê ew li hember Kurdistaneke serxwebû bû û sedemê wê jî weha diyar dikir; "Ji ber ku Tirk ev 600 sal in dewlet in lê hîn jî nebûne serbixwe, dê Kurd çawa bibin serbixwe?".

Azîz Nesîn di eşkerekirina dîtinên xwe de cesûr bû û tawîz ne dida. Di axaftinêke xwe de digot; % 60'ê Tirkan ahmeq in". Li ser vê gotina wî Tirk gelek aciz bibûn.

Azîz Nesîn bi navê Weqfa Nesîn weqfek li Stenbolê damezirandibû û tê de zorakên sêwî xwedî dikir. Di beyaneke xwe de digot," ji ber ez çiqûs im naxwazim di baxçeyê weqfê de pisîk û kûçikan xwedî bikin, di şûna wan de mî û çêlek hîn bi feyde ne ew ji aliyê maddî ve min naxusirînin".

Bi her awayî xwe Azîz Nesîn nivîskarekî cûda bû. Di wesiyeta xwe de jî nivîsandibû ku wexta ew bimre cenazê wî bê merasim bê rakirin û li ser gora wî tu nivîs nehên nivîsandin. Daxwaza wî ya herî mezin ew bû ku meyitê wî li baxçeyê Weqfa wî bê weşartin. Hukûmeta Tirkiyê vê wesiyeta wî bi cî anî.

Bi mirîna Azîz Nesîn edebiyata mîzahî ya Tirkan sêwî ma.

Seydo Aydogan (1963-1992)

Roja ku welatê me jî
buharê bibîne
Em dê bi gurzek gulên
azadiyê bên ser te
Û ji bo te stiranên
azadiyê bistirên

Birayê te
Mustafa Aydogan

Serokê Navenda lêkolînên Kurdî li Moskovayê Şakirê X. Mihoyan

"Xebata bingehî nivîsandina dîroka gelê Kurd e"

Hevpeyvîn

Navenda lêkolînên Kurdî li Moskovayê ev demek e ku hatiye damezrandin, lê heta nuha ji bilî nûçeyên pirr biçûk di masmediya Kurdî de nasandina vê navendê nehatiye kirin tevî ku bi baweriya Armancê yek ji wan navenda ne ku wê layiqî navê xwe be. Ji ber vê yekê jî me xwest wek gava pêşiyê ji bo nasandina vê navendê em bi du karbidestên Navendê re bipeyivin. Bê guman dûre emê li ser problemên navendê yan jî tiştên ku Navend li ser dixebitin binivîsînin



Prof. Şakirê Xudo

Dr. Beşîr Resûl

Armanc: Pêwîstiya damezrandina navendeke Kurdî li Moskovayê ji ku hat?

Ş. Xudo: Ez û kek Beşîr emê hewl bidin ku bersîva we bidin. Wek tê zanîn li Yekîtîya Sovyetên berê xebata li ser kurdan pir dewlemend bû. Di qirnê 19`an de zanayên Rûs wek; LEX, DITTEL û yd., di destpêka vê sedsalê de Minorsky, Nikitin û yd., paşê Orbellî gelek kar kirin. Karê Kurdanîyê ne tenê li Moskova û St. Petersburgê, her weha li Erîvanê, Tîblîsê û wextekî li Bakûyê jî hate kirin. Nuha jî li Moskova û Erîvanê li Enstîtuya Rojhilatzanînê beşê Kurdzaniyê heye. Ku em werin ser pirsa we, du pêwîstî hebûn ku tên dereceya pêşîn, Ya yekê: Îro li Rusyayê xebata karên zanistiyê pirr zehmet bûye, ev jî ji ber rewşa aborîyê ye. Ji xwe dema bê ser beşê Kurdzaniyê ev yek dibe kadastrof (felaket).

Ya duwem: her çend em dibêjin di dema Yekîtîya Sovyetên berê de gelek kar hatine kirin jî, gelek kar jî nehatine kirin. Ev yek jî ji ber têkilêyên wan ên bi dewletên ku Kurd kiribûn bindestê xwe dihat. Loma jî îzin tunebû ku her tişt bête nivîsîn. Her weha hin tişt jî xelet dihatin nivîsandin. Wek nimûne di derheqê Peymana Sewrê de. Divê ev tişt ji nûve bêne nivîsandin. Wek nimûne Şoreşa Oktobrê ne li dijî kurdan bû, lê nêzîkbûna Tirkan û Rûsyayê, Rûsya ji dostê kurdan bir kir dostê Tirkiyeyê. Ji aliyê din tevgera kurdên Kur-distana Başûr bû qurbana têkiliyên baş yên di navbera Yekîtiya Sovyetê û Rejîma Baasê.

Bi însiyatîfa grûbek rojhilatnasan, yek ji wan jî Dr. Beşîr e, biryar dan ku bi piştgiriya kurdên me grûbekê çêbikin. Di destpêkê de ***Mizgîn Mêqerî*** -her çiqas ev demeke girêdanên me tunene jî em nikar-in keda wî înkar bikin- piştgiriya me kir. Vê gavê li navenda me 10-12 kes kar dikin. Ji van sê kes her tim li wir rûdinin. Dr. Beşîr, Silêman Elî û ez.

Armanc: Kesên din kî ne?

Ş. Xudo: Ez ji profesoran dest pê bikim; ez im, Lazerof, Hasretyan, Çapûlav, Vasîleva û Zerê Yusarova ne. Doktor jî ev in; Jegalîna, Beşîr Resûl, Jakîlîna Musaîlyan, Bavê Nazê (ne li ba me ye lê têkiliya me heye) û Seîd Melle.

Me di destpêka 1993`an de dest bi karê xwe kir. Lê wek resmî di Gulana 93`an de em bûn resmî.

Armanc: Di destpêkê de çi astengî derketin pêşiya we?

Dr. Beşîr: Beriya astengiyan ez dixwazim hin tiştan lê zêde bikim. Li Rûsyayê piştî destpêkirina prosesa demokrasiyê kare Akademiya Zanistî ya Rojhilatê têk çû. Hat wê dereceyê ku gotin êdî ev kar ne pêwîst in. Beşên ku li ser Tirkiyeyê, Îranê, Afga-nistanê û Pakistanê ji aliyê van dewletan ve piştgirî lê hat kirin. Lê em Kurd dewleta me tuneye ku piştgiriya karekî weha bike, loma jî beşê Kurdî wek sêwîyan ma. Em fikirîn ku weha be lêkolînên ku çêbin dê li gor daxwaza van dewletan be û ew jî dijminên Kurdan in. Em fikirîn em çawa dikarin pêşî li van tiştan bigrin. Pêşî me bi hin hevalên ku li Berlînê dijîn re têkilî danîn. Yek ji wan jî Mizgîn Mêqerî bû. Hin hevalan gotin bi alîkariya hin hevalan ev kar dikare bimeşe. Lê Mizgîn rewşa vir dizanîbû loma jî got weha nameşe. Wî got ez amade me ku mesrefa salekê-sal û nîvê bigrim ser xwe. Helbet dema merivek tenê vî karî bike pêşeroj ne zelal e. Û wilo jî bû. Karên vî hevalî baş nemeşiyan û piştî 3-4 mehan nikarîbû alîka-riya me bike. Astengiya mezin rewşa wî hevalî bû. Problemên me aborî bûn yan na tu astengiyên me yên zanistî nebûn. Lêkolînerên ku nuha bi me re kar dikin bi pêşniyara me ya damezrandina navendeke weha pirr kêfxweş bûn û gotin madam Kurd tevî ku bê dewlet in li vî karî xwedî derdikevin, em hazir in ku di şertên ne baş de kar bikin û ev yek pêşketina neteweyî ya kurdan nîşan dide.

Ya duwem, divîyabû navenda me bibe resmî û ji bo vê jî divîyabû ku hemwelatiyek vî welatî xwe bide ber kar. Me pêşniyar ji kek Şakiro re bir û wî bi kêfxweşî qebûl kir. Me di destpêkê de diyar kir ku em ne organîzasyokeke siyasî ne, her çend karên ku em bikin piraniya wan wek naverok siyasî ne jî. Dema em dibêjin em ne siyasî ne, yanê em ne girêdayî partiyekê ne. Loma jî em serbest in û ne li gor dîrektîfan kar dikin. Lê ji aliyê din ji ber ku xwediyê me tune destê alîkariye nerdem direjî me nabe. PKK'ê gelek xwest ku em pê re kar bikin û gotin hûn çi bi-xwazin em dê bidin. Lê em qima xwe bi vê rewşê tûnin, ev kar bi partiyekê tenê nabe.

Ciyê navenda me heta nuha bi kirê ye, heger xwedî rabe û kirê bike du qat em dê çi bikin nizanim. Me bikarîba avahiyek kirrîbana dê baş biya.

Armanc: Xaniyekî weha bi çi mal dibe?

Dr. Beşîr: Li Moskovayê kirrîna xaniyan pirr buha ye. Xaniyek sê odeyî di navbera 80-100 hezar Dolarî ye.

Armanc: Baş e di nav van du sal û nîvan de we çi kar kirine û planên we yên nêzîk çi ne?

Şakiro: Xebata me ya esasî nivîsandina dîroka gelê Kurd e. Xebateke weha wek kronolojîk heta nuha nehatiye nivîsandin. Me cara pêşî ev yek kir. Pênc kesan ev tişt nivîsandin. Ev xebat nuha amade ye û tê redaktekirin.

Armanc: Ev pênc kes kî nin?

Ş. Xudo: Dr. Vasîlîva, Prof. Lazaref, Prof. Hasretyan, Dr. Jigalîna û ez im, lê hevalên din beşdarî vê xebatê dibin. Yên vê pirtûkê bixwînin dê bizanibin ku tevgera kurdan bi Barzanî an bi Apo dest pê nekiriye lê ew berdewamiya xebata bi sed salan in.

Xebateke me yê din jî heye ku bi Rûsî ye û nuha di çapê de ye. Navê wê "Kurdistana Îroyîn" e. Ji pênc beşan pêk hatiye. Her çar beş her yek li ser perçeyekî Kurdistanê ye û beşê pêncan jî li ser problemên navneteweyî ye. Wergera wê ya Kurmancî jî tête hazirkirin û em dixwazin wergerînin Soranî jî. Em dê bi-xebitin ku bikin Îngilîzî da ku kesên biyanî jî bikaribin bixwînin. Xebateke me ya din jî heye ku li ser pirsên civakî, aborî û siyasî yên Kurdistana Îranê ye. Ji aliyê din me biryar daye ku her sal almanakekê derbixin û ya îsal amade ye. Ev dê bi Kurmancî, Soranî û Rûsî be.

Armanc: We di destpêkê de behsa problemên aborî kir. Nuha hûnê bikaribin van berheman çap bikin, aboriya we dest dide ku hûn van li Rûsyayê çap bikin, yan mesela aborî bûye sebeb ku ev berhem dereng bimînin?

Ş. Xudo: Heta nuha dereng mayina berheman ne ji ber rewşa aborî bû lê ji vir û şûnde aborî dikare bibe asteng.

Dr. Beşîr: Me pirtûka "Kurdistana Îroyîn" bi erzanî daye çapê, bi 2 milyon Rûbleyî. Lê ya "Dîroka Kurdistanê" mezin e û çapa wê dê bibe problem. Eger em ji derekê alîkarî wernegrin zehmet e.

Ş. Xudo: Divê em li vir bidin diyarkirin ku biraderên me yên li Swêdê piştgiriyeke baş bi me re kirin. Ev 6-7 meh in em bi wê alîkariyê li ser lingan mane. Ez par hatibûm vir, hin hevalan wek; ***Hanefî Celeplî, Şivan Perwer, Hemîd Newroz, Fayiq*** û yd. ji bo alîkariya me aktîf xebitîn.

Li Moskovayê jî nuha du heval piştgiriya me dikin. Yek ***Emînê Hesen*** e, yê din ***Hesen Xerîb*** e. Ew bi xwe karsazên kurdperwer in. Ev salek û nîv e kiriya me didin, hemû tiştên teknîkî kirîne û mesrefên me girtine ser xwe. Di destpêka salê de du hezar Dolar dan me û soz dane me ku dê bi berdewamî alîkariya me bikin. Lê heta ku bingehek baş nebe meriv ji pêşerojê ditirse.

Armanc: Heta nuha çi rêxistinên siyasî yên herçar perçeyên Kurdistanê bin û çi jî yên demokratîk ên li derveyî welêt bin, bi we re li ser problemên we peyivîne?

Ş. Xudo: Na kesî tu têkilî bi me re girênedaye. Min ji Kendal re jî gotiye û ya Belçîkayê jî dizane.

Armanc: Di vî warî de goteneke we ji rêxistinên Kurdan ên siyasî û yên demokratîk yên li Ewrûpayê re heye?

Dr. Beşîr: Wexta em li damezrandina navendê fikirin û hevalan xwe dan ber, min xwe gelek bextewer û serfiraz didît. Ew kurdnasên ku 30-40 sal in bi pirsa Kurd mijûl dibin bi dil û can xwe dan ber vî karî. Em ji bîr nekin ku hukûmetên Îraq, Îran û Tirkiyeyê gelek caran ji van kesan xwestine ku bi wan re kar bikin. Lê wan ev (ku îmkanên baş bûn) qebûl nekir, ûjdanê wan razî nebû. Lê dema meriv piştgiriyekê nabîne hêviya meriv û ya wan kesan dişkê. Lazarev, piştî vegera xwe ya ji Kurdistana Îraqê di nivîsa xwe de go ez bûm şahidê dewleta Kurdistanê. Lê ku bê xwedî man dilê wan sar bû.

Ez dixwazim li vir vê firseta ku we daye me bi kar bînim û gaziyê kurdên welatparêz bikim ku bila ji bîr nekin ku pirs ne tenê ya me ye, ya ma hemûyan e. Li Rûsyayê kesek dergevaniyê bike milyonekê verdigre, lê ev kesana bi 200 hezar rûbleyî ku ne tiştekî ye qelema xwe xistine xizmeta gelê me. Em hêvîdar in ku çi rêxistinên siyasî, demokratik û çi jî kesên welatparêz me ji bîr nekin. Îro dem ne dema tifingê ye, ya nivîsandin û siyasetê ye. Navenda me di vî warî de dikare gelek tiştan bike.

Armanc: Baş e, kurdên ku bixwazin alîkariya we bikin dê çawa bighêjin we, dema ev hejmara Armancê bighêje destê xwendevanan û ew bixwazin alîkariya we bikin dê çawa bikin?

Ş. Xudo: Di bankê de hesaba me heye hûn dikarin bi vê hepeyvînê re biweşînin. Hesaba me ya Rûbleyan jî heye û ya Dolaran jî heye.

Armanc: Û gotina we ya dawî?

Dr. Beşîr: Em dê gelek kêfxweş bin ku di nav me û Armancê de danûstendinek berhemî hebe. Armanc rojnameya gelê Kurd e û bîr û baweriya kurdîniyê diparêze, zimanê wê pirr xweş e û dema dighêje me em pirr kêfxweş dibin. Em serkeftina we dixwazin.

Ş. Xudo: Ez dixwazim ji xwendevanan re bibêjim ku yên hay ji me hene li hêviya berhemên me ne û dilezînin. Ez dixwazim bibêjim ku îro di çentê me de gelek xebat hene û em dê wan derînin ronahiyê. Em gelek qîmetê didin keda Armancê ya di vî warî de. Li ba Armancê her ~~çiqas kêmasî hebin jî kulturcke~~ rojnamevaniyê pêk hatiye.

Adresa Navendê:
Centre of Kurdology (Navenda Lêkolînên Kurdî) Moskva
103062Pokrovka 38/A RUSSIA
Tel-Faks:+7- 095-9170087

Hesaba bankê

Please pay to Bankers Trust Company, New York favour Unity Co-opbank, Moscow account No. 04-096-978 CHIPS UID 323757 favour Centre of Kurdology account No 1020076/01

Gotineke pêdivî

Piştî nasîna min bi Rewşen Xanimê re, her roja pêncşemê min berê xwe dida mala wê. Rojekê min xwe amade kir, dunya zivistan, dem nîvroj û saet dido bû, otobusa me ji bajarê Şamê bi rê ket. Ji bextê min ê spî re bi barîna baranekê re em gihane bajarê ku Rewşen Xanim lê dimîne; bajarê Banyasê. Ev bajar şên û beravî ye, piraniya xelkên wê Elewî ne. Mala Rewşen Xanimê li devê riya parêzgeha Lazqîyeyê ye û ji hêla bakur ve li ber qeraxa Derya Sipî dimîne.

Min li zengilê derî xist, berdesta wê Abla Sebah derî vekir û pê re silava min bi germî vegerand. Tiştê ecêb Abla Sebah nêzî sî û heft salan li nav mala Rewşen Xanimê maye û hînî zimanê Kurdî nebûye. Tenê bi zimanê Erebî û Tirkî dizanîbû. Di temenê xwe de li ser zimanê Rewşen Xanimê ew nod salî ye. Lê eger merivî jê dipirsî, digot "Ez pêncî salî me!" Abla Sebah bi xwe baltûz (diş)a mezin ya Qedrî Can bû.

Min û Rewşen Xanimê me li rewakê silav li hev kir, piştî şîvê em li hev rûniştin û ketin behsa Mîr û nivîsandinê. Çend pirs ji mêj de di serê min de diçûn û dihatin. Vêca min ji Rewşen Xanimê pirsî:

"-Dayê çi bi kutubxane û destnivîsên Mîr hatin?"

Rewşen Xanimê got:

"-Di sala 1971'î de li ser daxwaza Korrî Zanyarî Kurd li Silêmaniyê, Celal Talebanî û Mesûd Mihemmed, berpirsiyarê Korrî Zanyarî Kurd, kutubxana Mîr birin Kurdistanê. Di nav wê kutubxanê de ferhengeke destnivîs hebû. Ji wê ferhengê kopyeyek li nik min jî hebû. Berî demekê min ew jî sparte destê xortekî ji Kurdistana Tirkîyê, jê re dibêjin Şêx Seîd lê mixabin tu haya min jê tune!"

Rewşen Xanimê bi kişandina çixarê re gotina xwe berdewam kir û got: "Berî demekî xortek ji Kurdistana Tirkîyê; Mehemed Uzun bi riya Xelîl Xoce hate ba min û li dor mehekê li mala min ma. Wî xortî gelek destnivîs, reşbelek û wêne ji min girtin û birin. Li ser soz û gotinên wî, gerek niha hin ji wan çap kiribin. Lê mixabin tu deng ji wî jî nehat."

Bi vê gotinê re lêvên xwe diguvaştin ser hev û çend keser hildianîn, durvên ruyê wê pê re guherîn û dest avêt ji pakêta xwe ya Kentê, cixareyek derxist û kişand. Bêdengiyekê girt ser rûniştina me. Ez di hundurê xwe de pir pê êşîyam. Lê dengê xumxuma baranê, şirqîna birûskan, fîze fîza bayê û dengê pêlên deryayê hinekî barê min sivik kirin, hin bi hin ceger hate min, ez pê re girnijîm û min got: "Dayê, ezê jî tu sozê nedim te, lê eger tiştek ji wan destnivîsan hebe bi kêmasî ez dikarim biparêzim."

Bi gotina min re kenîya û got: "Kurê min tu pir dereng hatî, xwezî berî çend salan me hevûdu naskiriba, me yê bi hev re gelek kar bikira, lê mixabin dem li min derbas bûye, tu hêz di dest û çavên min de nemane. Lê ji bo destnivîsên min, ezê bi tevayî bispêrim destên te. Ez bawer im, te çawa "Name Ji Mistefa Kemal Paşa Re", "Bîranînên Salih Bedirxan" û çend pirtûkên din çap kirin û belav kirin, tu yê bikaribî wan jî derxînî."

Piştî hinekî ji pêjniyê, serê xwe hilda û got: "Di sala 1957'an de li Beyrûdê rojnameyek bi destê dostê me Yûsif Melek derdiket. Di wê rojnamê de min hinek ji bîranînên Mîr celadet dane belavkirin."

Piştre wê çend hejmar ji wê rojnamê spartin destê min. Lê mixabin hejmarên bîranînan ne li pey hev bûn. Ez pir li dû yên mayî gerîyam. Lê vê dawîyê li nik hin dostan yên mayî min peyde kirin. Bi lez min wergerandin zimanê Kurdî. Hêvîya min ew e ku ji van bîranînan sûdek were stendin.

Dîlawerê Zengî

Bîranînên Celadet Bedirxan...

"Nestûrî heta dewra padîşah EbdilMecîd, li Cezîrê û Botanê di bin stûbariya begên Kurdan de rûniştî bûn, ji mêj de baca xwe li gorî lihevkirinê didan. Ingilîzan tevlîhevdan kir. Nestûriyan nema baca xwe dan. Di wê demê de, Mîr Bedirxan serekê began bû û dû re bû paşa."

Piştî çûna Salih Beg, Bedirxanî xeber ji xwediyê kewan re şand û doza kirîna cotên kewan bi nirxekî biha jê kir. Yê Nestûrî pir baweriya wî bi dadimendiya Bedirxan dihat. Ewî jî nirxê cotên kewên xwe bihatir ji nirxê hespekî resen xwest. Bedirxanî jî kew kirîn.

Çaxê kew gihane destên Mîr Bedirxan, di cî de berê xwe da mala birayê xwe. Piştî ku Mîr destê birayê xwe yê mezin maç kir, cotên kewan dane destê wî û jê re got: "Karê min î din ji bo giringî û erkê stûbar û mîrnişîniyê bû. Lê karê min î îroyîn ew ji bo giringî û erkê biratî û mervantiyê ye". (**)

Carekê ji caran, Mîr Bedirxan xwest fermandarî û bindestkirina wêrîn û piştrastkirina wêrîn û piştrastkirinê li mîrnîşîna xwe nas bike. Kûzek ji peran li devê riya bajêr danî. Çavên xelkên bajêr li kûzê peran ket, riya xwe jê dagerandin û jê bi dûr ketin.

Xelkên bajêr ji çûn û hatina xwe ya di rê û xaçirêkên teng û dijwar de, westiyan û pir tengezar bûn. Zanyarekî berê xwe da dîwana Mîr û jê re got: - Mîrê min ! ma tu ji Xwedê natirsî...! Te berê xelkên bajêr ji riya wan î serekî guhert û te şopa wan jê qut kir!?

Mîr ji vê gotinê mat û zehî ma.

Mîr pir hingirî û bi zirtî got: Dêmek xelk sitembar in... ji çend gundên piçûk ev bar tev bêne hevdan... ma îşê aqila ye !!? Ji tiştê hatî komkirin, nêvî li xwediyan vegerînin, ji vê carê û pê de, divê ez tiştekî weha nebînim û nebihîzim. Lê, heger nebû, ezê wê gavê, stemkaran bi sertî û bê dilovanî arih kim.

Carekê, Mîr Bedirxan li nav dibîstanan ger û zêrevanî dikir. Ji mamostayekî re, mamostayê helbest û pêlewazan dide re got: - Ezê dînarekê xelat û pêşkêşî bidim her Şagirtekî ku rûpelekî ji rûpelên pirtûka Mûtewel (2) bê şaşî ji min re bixwîne.

Şagirt yek bi yek nêzî Mîr dibûn û rûpelê xwe bê şaşî dixwendin. Mîr jî xelat û pêşkêşî diyarî wan dikir.

Şagirtek hat , ji mamostê xwe re got: - Heger Mîr li ser xwendina rûpelekê dînarekê xelat dide ! Wê li ser xwendina Mûtewel bi tevayî û ji ber kirî çi bide...?

Mamoste pirsa şagirtê xwe ji Mîr re got. Mîr şagirt xwest. Piştî ku şagirt Mûtewel bi tevayî û bê şaşî li ber Mîr xwend, Mîr ji zîrekiya şagirt pirr mat û kêfxweş bû. Li hember her xwendina rûpelekê pênc dînar xelat û pêşkêşî danê.

Li nêzî Cezîra Botan çemek heye, jê re dibêjin "Çemê Zanyar gotina xwe berdewamkir û jê re got:

Te kûzek ji peran, avêtiye derê riya serekî ya bajêr û xelkên wî, ji tirsa peran, newêrin tê re herin û bên, berê xwe dane xaçirêh û riyin teng û dijwar.

Mîr, bi vê bawerî û spartindeya xelkên xwe, pir kefxweş bû. Di cih de, fermana hilanîna kûzê peran û belavkirina zêran li şagirtên dibistanan kir.

Mîr Bedirxan li Cezîra Botan, di Birca Belek de, rûniştî bû. Çavê wî li panzde- bîst qantirên ji ceh û genim barkirî ket. Mîr bang li berdestê xwe kir, jê xwest bizane, ev çi qantirên barkirî ne û ji ku ve tên?

Piştî berdestê Mîr vegeriya jê re got: -Mîrê min, ev qantirên barkirî baca gundê "Taqiyanê" ne û ew ji nav Kildanan tên.

Di rojnamaya Telgiraf ya Turkî de, hejmar: 128, roja Çarşemê, Çiriya pêşîn, sal 1340 koçî (1924 Z.), ji gotareke di bin navê Nestûrî de, nîvisa Torevan Silêman Nazîf Beg hatiye girtin:

"Di sînorê me yî başûrê rojhilat de, Nestûrî, birîneke ku bi dijwarî devê wê bê hev. Evî nijadî gelek caran dewlet westandiye, û bûye sedema aloziya Mûsilê û bûne sebeb ku Îngilîz debasî vê herêmê bibin.

Ev miletê xurt, yê li wilayeta Mûsil û Hekariyê ku nêzî sînorê Îranê rûniştî ye, ji hêla rehê ve ew Kildan in, û ji hêla olê (mezheb) ve Nestûrî ne. Digel ku ev ol (mezheb) ne wek tu mezhebî ji mezhebên Fila ye jî. Lê bila di koka xwe de rehek ji Filetiyê jî bin. Heger çawa be, tenê bes e ku File ne, dibin sebeb ku Îngilîz wan li hemberî me biparêzin û bi riya wan derbasî vir bin.

Nestûrî heta dewra padîşah EbdilMecîd, li Cezîrê û Botanê di bin stûbariya begên Kurdan de rûniştî bûn, ji mêj de baca xwe li gorî lihevkirinê didan. Ingilîzan tevlîhevdan kir. Nestûriyan nema baca xwe dan. Di wê demê de, Mîr Bedirxan serekê began bû û dûre bû paşa.

Bedirxanî bi hêzeke xurt êrîşeke zor bir ser Nestûriyan û ew şikandin, xûk û bac jî, ji wan girt. Di vê bizava Mîrê Kurdan de tu akam û mebesta asêbûnê li hemberî dewletê tunebû. Lê Mîr îdarekirina vê rîayetê ku ji bav û kalan hatibû, ji bo xwe tişteke meşrû didît, belkî ev yek ji bo xwe wek meseleya şerefê dizanî.

Di wê demê de, mîrza Henrî Layard li Mûsilê konsolosê

"Mîr Bedirxan li Birca

"Çaxê kew gihane destên Mîr Bedirxan, di cî de berê xwe da mala birayê xwe. Piştî ku Mîr destê birayê xwe yê mezin maç kir, cotên kewan dane destê wî û jê re got: "Karê min î din ji bo giringî û erkê stûbar û mîrnişîniyê bû. Lê karê min î îroyîn ew ji bo giringî û erkê biratî û mervantiyê ye."

Di vê pirtûkê de, ezê dîrok û bîranînên malbata Bedirxanîyan bicivînim. Dibe hin bûyêrên weşandî, ne pêderpê û di demên ne wekhev de ji bin, wê hin bûyêr û serpêhatîyên ne weşandî jî hebin. Lê li ser zar û zimanan bi awayekî çîrokî hatibin gotin.

Heger ev pirtûk dibe belgeyek , ji bo bicîhkirina dîroka Bedirxanê Azîzî, ji hêlekê din ve jî dibe belgeyeke qenc û alîkar; ji bo diroknasên dîroka Kurdistanê.

Di vê pirtûkê de, wê hîn nifşin din jî, ji nivîsandinê hebin, ew jî hest û dîtinin hin kesên Kurd û rojhilatnasên biyanî yên ku li ser kesina Bedirxanî nivîsîne. Dibe ev nifş ji hin kesan re ne pêwîst û girîng be, lê ji bo min pir girîng e. Mebesta min jê bicîhkirina celebê navdarîya navê Bedirxan e, yê pir caran bi gotegotan hatîye êşandin.

Min got celebê navdarîyê .....tenha bûyerek hate bîra min:

Cara pêşî di sala 1922'an de bû, ku min li bajarê Munîhê, li Almanya, Prof. Zos Haym dît û wî ji min re got:

"Çaxê ku tu pirtûkekê li ser Kurdistanê dixwînî an bi kesekî re, li ser Kurdan dipeyîvî, di cih de behsa Bedirxan dibe. Ta bi "Karl May" yê ku dipêvîdirîya wêne û pirtûkan de, tu tişt li ser Kurdan nizane, di pirtûka xwe ya "Gerek Li Kurdistanê" de bi xurtî behsa Mîr Bedirxan kirîye.

Li vir dixwazim şanekê diyarkim. Di vê pirtûkê de, ne her tiştê dinivisînim ji bo belavkirin û weşandinê ye, yên ji bo weşanê bêne helbijartin, û yên mayî di nav destên xortên malbatê de bimînin, jo bo taybetiyên bav û xalen xwe binasin. (*)

Rojekê ji rojan, Salih Beg (1) bihîst ku cotek ji kewên qenc li nik mirovekî Nestûrî hene.

Salih beg dilçûnê kewan bû, û pir ji nêçîra wan hez dikir. Çavên xwe bera Kewên mêrih dan; doza kirînê kir, lê xwediyê kewan razî nebû û nefirotin.

Salih beg pir hingirî û di riya peya û zelamên xwe re, bi kotekî û zorê, cotên kewan ji xwedî stendin. Xwediyê kewan berê xwe da dîwana Bedirxanî û gilîyê xwe li ber destê wî kir. Mîr Bedirxanî di cih de rêkir dû birayê xwe Salih. Piştî ku rastî ji Bedirxanî ve hate xuyakirin, kew li xwediyê wan vegerandin.

Salih beg pir li ber xwe ket, bê çawa birayê wî, ya mirovekî nestûrî û [illegible]ben, bi ya wî neda...! Bi lez ji dîwanê derket û berê xwe da malê.

Cuhiyan". Li ber vî çemî, Cuhû bi erkên xwe yî olî ve radibin, û li gorî yasa ola xwe, xwe perhîz û paqij dikin. Kurdên misilman û xaçparêzan ew pir tengezar dikirin û nedihiştin bi erkên xwe yên olî rabin.

Rojekê Haxamê Cuhiyan gilî li ber destê Mîr Bedirxan kir, Mîr jî pirsa navê cihê ku dest dirêjkirin lê bûye jê kir.

Haxam bi tiliya xwe cîh nîşanî Mîr da, bê ku navê cîh bêje. Mîr dîsan pirsa navê cîh û yê Çem jê kir. Haxam bi tiliya xwe , dîsa cîh nîşan dikir. Wêgavê Mîr girnijî û got: Ma cihê tu nîşan dikî ne "Çemê Cuhiyan" e ? Haxam jê re got: Mîrê min ê gewre, bi vê gotina xwe tu rastgoya arziya çem ji Cuhiyan re bi cîh dikî !! Wê gavê Mîrê gewre, ferman da, ku çem Çemê Cuhiyan e, divê tu kes ji Îngilîzan bû û entîke û kevnareyên ku ji kavil û wêraniyên Nînowayê derdiketin, ewî dighandin British Museumê ya li bajarê Londonê. Wî Ingilîz agedarî pirsa Nestûriyan kir û serçimandina Bedirxan jî xwest. Bixwe, ew li dû mezinkirina pirsa Nestûrî û Bedirxan bû; ta ku Ingilîzan doza derxistina Bedirxan ji welatê wî ji Tirkan kir.

Bedirxan dê bi hesanî dev ji mîrnişîna pêmaya bav û kalên xwe berneda, nemaze, miletê wî di bin fermandariya wî de ne, û bi çavin mezin û pîroz lê dinêrin. Guhdariya fermanên Bab-i Alî nakin. Padîşahiya Osmanî dît guhnedan û bersîvnedana fermanên wê, asêbûn û liberrabûn e, vêca bi leşkerekî giran êrîşî Bedirxan kir, zilamên Bedirxan pêdariyeke zor kirin û bi serketin. Hemû têkiliyên xwe bi dewleta Osmanî re birîn û serxwebûna welatê xwe hildan û wîlayeta Sêrtê jî girtin.

Tê bîra min, min di biçûkaniya xwe de, di sala 1258`an de(koçî), perên çêkirî dîtin ku li ser rûyê wê "Mîrê Botan Bedirxan e" nivîsandîbû. Bedirxan mirovekî aqilmend û pirr zîrek bû, ji tevger û karên dijwar nediwestiya, di dan

Bîranînên Celadet Bedirxan...

Ji mêj de, min dil hebû, ku bîranînên xwe di pirtûkekê de bicivînim. Berî niha bi demekê, min hin jê civandin. Lê, mixabin li bajarê Xarpûtê, ji hêla "Dadgeha Îstiklal"ê bi kaxezin min re hatin girtin. Tevî ku dilê min û nivîsandina tu karî jî tune ye lê ezê vê carê dest bi nivîsandina bîranînên xwe bikim û binivîsînim; Ji ber ku pergela derûna min ne tebitî û aşufte ye; cangiranîyekê jî xwe bera wergeya min daye. Ev hest dike bibe sedemê dûrxistina min ji gelek kar û nivisandinan.

Min dest bi nivisandinê kir û ezê berdewam kim. Ez bawer im, birayên min jî dixwazin van bîranînan bicivînin. Lê heger min berî xelaskirin û pêkanîna vî karî çavê xwe damirand, hêvîya min ew e. ku ew ji devla min, bi vî karî rabin. Bi vê yekê vatiniya xwe û daxwaza min bi cih tînin

Beyrûd, 16.8.1929 **Celadet Bedirxan**

Yê Rûsî ji mazûvan xwest, carekê berî çûna cem Mistefa Paşa bi hev re bilîzin. Bi hev re lîstin, yê mazûvan zora mêvanê xwe bir, bê ku mêvan ber xwe bide, ew pir li ber xwe ket, û ji Çûna cem Mistefa paşa rûsar ma; ji ber ku mazûvanê wî, tûcarî zora Mistefa paşa nebir ye dêmek tu hêviyên wî di bindestkirina Mistefa paşa de nema.

Belek rûnîştî bû"

bû.

Fermandariya Bedirxanî roj bi roj fireh dibû, ta ku gihişte bajarê Diyarbekrê (Amedê).

Ev pesin û salixdanên hanê, bes in ku Mîr Bedirxan di nav gelê ku hîn di jîneke sazûmanî û pevbendî de kedî nebûbe; bigihêje bilindiya Emîr el-Muminîn.

Ji ber asêbûn û liberrabûna Mîr Bedirxan, Îngilîz dijminê wî yê taybetî û Nestûrî yên gelemperî bûn. Li Stembolê, Misilmanan jî ji Mîrê Kurdan hezdikirin, pirtirî ku ji padîşah hezbikin. Lê padîşahiyê ji ber zora Ingilîz... bi serdariya Îsmaîl Paşayê Çerkes, leşkerekî xurt, bi çekên giran ve şande ser Bedirxanî.

Di gumana min de, Serdar Îsmaîl Paşayê Çerkes, di Şerê Belqan de serokê erkan bû.

Mîr, li hemberî êrîşê dikarîbû şer kiriba û zora wan jî biriba lê mixabin pismamê wî Êzdîn Şêr dev jê berda û bi 15-20 hezar şervanî ve li kêleka leşkeran sekinî. Ji naçarî Bedirxan xwe sparte mercên xwehermendiyê û şer rawestand.

Ev bûyer, di sala 1262`an de (koçî), bû. (1845 Z.)

Vê bûyara dijwar û xinîziya Êzdîn Şêr, serî li Bedirxan gerandin û bûn sedem ku Bab-i Alî û padîşah bixwe lê bêne mehderiyê. Pêvî bê çi bi serê malbat, êl û eşîra wî û eşîrên li der-dora wî hat kirin. Emir dan wilayeta Amedê û heyeta erkanê ku Bedirxan û malbata wî bi awayekî şayeste û kubarî bigihînin Istembolê.

Dema ku ew gihandin bajarê Istembolê, di cîh de, derbasî dîwana padîşah Ebdilmecîd kirin.

Bedirxan, li ber padîşah, xuyakirina sedem û dehifdanan ne li şayesteyî cih û meqamê xwene jî li gorî sazûman û toreya ku li ser xwedî bûye dit. Ji lewra, ewî didariya cihnişîn (baz`an) baştir didît; ji bo wî sûcdar û gunehkareke û tenê perçeyek ji çarînên Umer Xeyam li ber bixwîne:

Ka kî li cîhanê bê guneh heye, bêje min?

Yê bê guneh çawa jiyaye, bêje min?

Nepakiyê bi te dikim, tu jî nepakiyê bi min dikî.

Çi cudayî di nav min û te de heye, bêje min.

Xwendina vê çarînê, dilê padîşah pir şa kir û pirtir bi Bedirxanî ve hate girêdan û navnîşana padîşahiyê pê ve kir.

Piştî karbidestiya Bedirxan ji ser Nestûriyan rabû, bûn wek şêrên devbixwîn, û bi mîrnişîn û padîşahiyê ve ketin. Roj bi roj bûyerên wan ên xerabûnê pir dibûn, ta ku lîstikên wan jî diyar bûn. Ev sedemên seretayî û serekî yê hilweşîna padîşahî û mîrnîşîniyê bûn.

Rojekê ji rojan, Xelefê Şewqî (3) pêrgî hevalek ji hevalên Mîrê Behdînan hat, bi hev re, li ser bûyer û karên mîrên hev peyivîn. Hevdê Mîrê Behdînan ji Xelef re got:

-Ma ev çi rewş e li Botan e? Herdem di nav şer û nakokiyan de ne. Lê mîrê min, li welat û herêmên wî herdem xweşî, bêdengî û haşbûn e.

Xelef lê vegerand û got:

-Mîrê te dîkê di nav sedên mirîşkan de ye. Lê mîrê min beranê di nav hezarên ji beranan de ye û ev e sedemê haşbûna li nik we û nakokiyên li nik me ye.

Ji Çîrokên Jinenıgariya Bedirxan Yên Taybetî.

Bedirxan, di şêst û pênc saliya xwe de mir. ji carekê pêve nesax neket, ew car jî pê çû. Di saxiya xwe de, pir bi hêz bû, bi liba genim digirt û ji nav tiliyên xwe de davêt, cam quldikir. Di dema li Tirkiyê surgon bû, pereyên mecîdî nû derketibûn, mecîdî bi tiliyên destên xwe digirt û difirikand, nivîsandina wê dimal û jê dibir wî canbaziyeke taybetî hebû, Carekê min ji apê xwe Ebdilrehman beg bihîst, Bedirxan di zivistanê de qeşa dişkenandî û bi ava sar û qeşagirt serê xwe dişûşt. Pir ji canbaziya binavê hezdikir, gelek caran bi dost û hevalên xwe re dilîst.

Heskirina vê lîskê di dilê zarokên xwe de diçand. Beşdarî lîskên wan dibû,yên di yek temen û xurtiyê deba wan be ra hev dida, û yê serkeftî diyarîya wî xencer an dimançek bû.

Mîr pir ji lîska setrencê jî hezdikir, ji ber ola (mezheb) wî şafiî bû, ji nav lîskan setrenc jê re helal û rewa bû. çawa lîskvanin zîrek ji nav hevalên wî diyar bûn, weha jî di nav zarokên wî de. Lawê wî peyar Mistefa Paşa lîskvanekî pir jîr û jêhatî bû. Rojekê zora bavê xwe Bedirxan Paşa bir. Mîr pir hingirî û bênteng bû; ji ber tukesî zora wî nebirbû, di nav henek û genekan de, dar di nav serê lawê xwe de xist, lê lawê wî ji cihê xwe nelivî û bê deng ma.

Min ev bûyer ji peyar bavê xwe Emîn Alî beg bihîst. Rojekê, di destpêka şerê Cîhanê yê pêşî de, min û bavê xwe, me bi hev re lîska cetrencê lîst, nizanim çawa bû, ji min re li hev hat û min zora wî bir, hema lîsk kuta bû, ji nişkave, ez rabûm û ji paş ve vegeriham, bi dû-sê gavan dûrî masê ketim. Bavê min ji vê tevgera min î ew jî qut û şikandina êzingan e. Çewa celebên qalûn û pîpên wî, yên ku pê tûtin dikişand bi cîgeh û xizaneyîn taybetî bûn, weha cîgeh û xizanên ji bo parastina celeb û rengên biviran jî linik wî hebûn.

Ev e rûpelek ji jiyana wî ya li surgonê (Turkiyê):

Piştî ku darên stûr û mezin tanîn, li orta hewşê şipya datanîn. her roj, piştî nîvroj Mîr Bedirxan Paşa du demjimêr (seet) xwe bi qutkirina darê êzingan mijûl dikir. Piştî ku karê xwe kuta dikir, tasek mezin dew vedixwar. Havîn ba, zivistan ba, wî bi ava sar destnimêj digirt.

Ji biçûkaniya xwe de (ango ji dema bavê xwe de) di riyeke xweşî û saxiyê de xwe dîtibû. ji nişka ve mat û zehî ma !! Ewî ji min re got: Çi bi te hat ? Min bersiva wî da: Min texmîna darê lêxistinê kir, vêca, ez dûr ketim. Mîrzoyê mîr, ji vê henekê, peyar pir kenî û şabû. Wî bixwe ji henekan pir hez dikir.

Li ser daxwaza Mîr Bedirxan, zarokên wî bi gelemperî hînî lîska setrencê bibûn.

Peyar Mistefa paşa lîskvanekî navdar bû di dema ku ew li bajarê Şamê dima, rûspiyekî Rûsî navdar û yê yekemîn di nav lîskvanên welatê xwe û di nav yê Ewripayê de bû, pir ji naskirin, serdan û gera rojhilatê hez dikir. Rojekê bi mêvandarî hate bajarê Şamê. Di vê hatina xwe de, pirsa navê lîskvanekî xurt li bajêr kir, xelkê berê wî dan Mistefa paşa.

Di wê demê de çayxanek taybetî ji maqûl û mezinên bajêr re hebû, mêvanê gerok berê xwe de wê çayxanê, li derbasbûnê pêrgî lîskvanekî hat û sedemê hatina xwe yî çayxanê jê re got, lîskvan wê êvarê soz bi çûna nik Mistefa paşa dayê, piştî ku bîstekê dagerin mala wî bi mêvandarî. Yê gerok bi mazûvanê xwe re berî dan malê. Li derbasbûna oda mêvanan çavên mêvan bi masa setrencê ket. Di cîh de, yê mêvan ji mazûvan pirsî! Diyar e ku tu dilçûnê lîska setrencê yî, gelo te tu carî bi Mistefa Paşa re lîstiye? Mazûvan lê vegerand û got: Min gelek caran pêre lîst, lê min yekcarî zora wî nebirye.

Yê Rûsî ji mazûvan xwest, carekê berî çûna cem Mistefa Paşa bi hev re bilîzin. Bi hev re lîstin, yê mazûvan zora mêvanê xwe bir, bê ku mêvan ber xwe bide, ew pir li ber xwe ket, û ji çûna cem Mistefa paşa rûsar ma; ji ber ku mazûvanê wî, tûcarî zora Mistefa paşa nebir ye nexwe tu hêviyên wî di bindestkirina Mistefa paşa de nema.

Di wê gavê de, mêvanek derbasî malê dibû, û bang li xwediyê malê bi navê Mistefa paşa kir. Di cîh de, yê mêvan ji yê derbasbûyî haydar bû, ku mazûvanê wî Mistefa paşa bi xwe ye. Ew ji vê rewşê mat û zehî ma. Ji mêvanê xwe pirsî. Sedemê nediyarkirina fereziya xwe. Mistefa Paşa bersiva wî da û got ;" Ta bi niha tu kesî zora min nebiriye. Ez bi xwe te nasnakim û ne jî ji jêhatîbûna dizanim. Min baştir dît, xwe bi te nedim naskirin û bi te re bilîzim. Heger te zora min bibira, minê wê gavê vergerandin û rênê din jê re bidîta. Tirsa min ew bû, ku te ji bajarê Şamê bida rê serbest û Mistefa Paşa bima bindest.

Cara pêşî bû, min ew çîrok ji devê lawê metika xwe peyar Yûsif begê Turk bihîst, çîrokeke baş li Sûrî û Libnanê nas kiriye. Min bi xwe ji devê gelek kesan bihîstiye.

"Ev miletê xurt, yê li wilayeta Mûsil û Hekariyê ku nêzî sînorê Îranê rûnîştî ye, ji hêla rehê ve ew Kildanin, û ji hêla olê (mezheb) ve Nestûrî ne. Digel ku ev ol (mezheb) ne wek tu mezhebî ji mezhebên Fila ye jî. Lê bila di koka xwe de rehek ji Filetiyê jî bin. Heger çawa be, tenê bes e ku File ne, dibin sebeb ku Îngilîz wan li hemberî me biparêzin û bi riya wan derbasî vir bin."

Têbinî

(*) Berî ku mîr Celadet biranînên xwe kuta bike, ji nav me bar kir û çavê xwe damirand, ji ber vê çûnê, her tişt jî wehî xwe man û bîranînên wî di pertûkekê de nehatin civandin û belavkirin. (Wergêr)

(**) Ev kurtegotin ji bîranînên peyar Mîdhet Beg e, di sala 1908-1909 an de, di dema gera wî û birayê wî yê mezin Bedrî Paşa de, li Kurdistanê nivisîye.

1) Salih Beg: Birayê Bedirxan yê mezin e û lawê Mîr Ebdilxan yê mezin e. Bixwe ew jêgirtiyê rewayî ji mîr nîşaniya Botan re bû. Lê ji ber ku mirovekî dîndar û sofî bû ne li gorî kar û barê erkê mîrnîşînî û fermandariyê bû. Bi dilê xwe, mîretî da destê birayê xwe Mîr Bedirxan û wî şayesteyê wî cîhî dît.

(2)Mûtewel: Pertûka Sededînê Teftezanî ye, di warê rêziman, vegûhartin û pêlewazên helbestan de ye. Muxteser: Kurtepertûka Mûtewel e, di nav Feqe û Melên Kurdan de tê xwendin. (Wergêr).

3. Xelef: yek ji heval û hogirên Bedirxan Paşa yê nêzîk bû. Ji ber peyakî qenc, mêr û jêhatî bû; Mîr Bedirxan pir jê hez dikir. Pir jê stran û dîlok li ser kar, mêranî û hişariya wî hatine gotin. Li nêzî Nisêbînê cihek heye jê re "Girê Xelef" dibêjin ew jî li ser navê wî hatiye bi nav kirin.

Çavkanî: -Rojnnameya "El- Huriye" sal 1, hej. 5, rûp. 3, 5.03. 1957 hej. 6, rûp. 2, 16. 03. 1957 hej. 7, rûp. 3, 1957, hej. 8, rûp. 4 , 17. 04. 1957 hej. 9, rûp. 2, 7. 05. 1957 hej .10, rûp. 3, 12. 05. 1957

Rejîsor Mano Xelîl

"Ez di rûyê zarokê Kurd de, di çavên jina Kurd de dîroka şînê û renckêşanê dibînim!"

Di navbera 5-12`ê Adarê de mehrecana 9`an ya sînemayê li bajarê FRIBOURG`ê hatibû lidarxistin.

* Ev mehrîcan salê carekê çê dibe; û li rada heftiyekê fîlmên dirêj û belgefîlm pêşkêş dibin. Fîlmên mehrecanê ji cîhana sêyemîn in (Asya, Afrika, Latîn Amerîka), mehrecan di bin navê (Mehrecana FRIBOURG`ê a fîlmên başûr) de lidar dikeve.

* Fîlmên ku îsal ji Asyayê beşdarî mehrecanê bûbûn, piraniya wan, ji Moxolistanê, Koreyê, Hindistanê û ji çend welatên li dorhêla wan, bûn. di gel çend beşdariyên pirr hindik ji Rojhilata Navîn wek Mano Xelîl ji Kurdistanê û Can Şemûn Xelîl ji Lubnanê.

* Di mehrecanê de fîlmê Mano Xelîl (Kurdistan cihê ku Xwedê lê radizê) bi van gotinan hatibû dannasandin:

"Nêrîneke jixwebawer ji bo rastiyeke mezin pêşkêş dike" û "Em dayikên kuran in, em zarokan xwedî dikin, perwerde dikin, bi wan re dikenin, lê ne xem e em wan ji bo welêt jî dikin bi qurban!!" û "Em Kurd in... em li vir in!"

* Pêwîste bê gotin ku fîlmê Mano Xelîl berya niha bi du salan li mehrecana OGSBERG`ê li Almanyayê xelata yekemîn wergirtibû.

* Min ev hevpeyivîn di mehrecanê de ji bo Armancê amadekiriye.

Amadekar: TAHA XELÎL

Hevpeyivîn

Armanc: Mano Xelîl çawa dikare xwe û berhemên xwe pêşkêşî xwendevanên Armancê bike?

Mano Xelîl: Roja çêbûna xwe ya rastîn nizanim lê dibêjin ku ez di sala 1964`an de ji dayik bûme.

Ez dê hinekî hişê xwe ber bi paş de vegerînim, di salên xwendina seretayî, navîn û lîseyê de ez di nav şagirtên dibistanê de wek piçûktirîn û kintirîn şagirt dixuyam.. Ji nişkêve li xwendegeha bilind bejna min dest bi dirêjbûnê kir. Hergav ez ditirsiyam ku bejna min jî wek endamên min ên dîtir wisa kurt bimîne. .. Min berya temenê xwe bi salekê xwendina seretayî dest pê kir. Digel ku dibistan li gundê me hebû jî lê min li gundekî dîtir dixwend, her roj du seetan diçûm û dihatim. Di navbera bavê min û berpirsyarên *Partiya Baas* yê gundî nakokî hergav peyda dibûn lewra wan jî xwendina zarokên wî li dibistana gund qedexe kiribûn. Dema ku min dibistana navîn jî xwend careke dî renckêşana meşê dûbare bû, dawiya heftiyê ez şeş seetan li ser piyên xwe dimeşiyam, min nanê xwe û rûnê kurmancî û savara xwe li ser milê xwe dikirin û min bi kotekî xwe ji nav golên heriyê ber bi gund ve radikişand, heftiyekê li wir dimam û pişt re dizîvirîm gundê xwe. Bi vî awayî min sê salên xwendina navîn kuta kirin.

Piştî ku min salên dibistana navîn qedandin bavê min berê min da dibistana olî çinkî axret jî ji bo wî pêwîstiyek bû. Me bi hev re berê xwe da Dêrazorê da ku min li dibistanê bi cih bike, lê di kêlîka dawîn de bavê min ramana xwe guhert; sedemên wê guhertinê jî pir komîk bûn hêjî xweşik tên bîra min , " Kurê min tu li ber van şagirtan pirr biçûkî ez ditirsim ku...(!?) Ji bo vê yekê ez û wî bi hev re ji hewşa dibistana olî derketin. Bavê min berê xwe da qeraxa çemê Ferat; havîn bû; çakêtê xwe li erdê raxist û nimêja nîvro kir û ramana ku kurê wî Mano dê bibe Mele yan şêx heta heta li ber pêlên çemê Feratê berda. Em vegeriyan Hisiçayê û ez li dibistana pîşeyî bi cî kirim. Bavê min sindoqek serdîn û hinek nanê zuha ji min re kirîbû , lê qederê wilo kir ku birêvebirên dibistanê navê min di beşê xerratiyê de hilbijartibûn, carek bavê min hat û bi destê min girt û ji min re got: Ez dê di seetekê de te fêrî çêkirina dergeh û pencereyan bikim, de rab em herin, pêwist nake ku tu çend salan ji temenê xwe di vê xwendinê de winda bikî...

Em vegeriyan Qamişlokê û min dest bi xwendina lîseyê kir. Ji xwe birêvwbirê dibistane bi kare polisan radibû, ne ku em perwerde dikirin. Di dibistanê de herûher di navbera xwendevanan û birêvebiran û çavdêran de ji bo peyivîna bi zimanê Kurdî pevçûn çêdibûn. Piştî lîseyê min li xendegeha Şamê bi qasî nîv salê dest bi xwendina huqûqê kir û vegeriyam Qamişlokê (bejna min dirêj bûbû!) da ku li dibistanekê dest bi mamostayetiyê bikim. Lê mehek derbas nebûbû bi egera ku temenê min bûçûke wan ez ji mamostayetiyê avêtim. Salekê ez bêkar mam, ta ku temenê min bû 18 dîsa vegeriyam dibistanê û mamostayetiyê, dîsa vegeriyam jiyana şagirtan a mişt renckêşan û hejarî û perîşanî... Du sal dibuhurin û ez hewl didim ku ez beşa dîrokê bixwînim îca pêwist nake ku ez li ser wê dîroka ku em fêrdikirin bipeyivim...! Pişt re min berê xwe da Çekoslovakyayê da ku rejîsoriya sînemayê bixwînim, û berî sê salan min xwendina xwe kuta kir.

Mano Xelîl: *"Xewna min ew e ku ez fîlmê xwe biafirînim. Eger hat û ev xewn pêkhat wê gavê dê gelek bizanibin ku çîrok ne hema behreyeke serberdayî ye"*

Armanc: Lê te çima xwendina sînemayê hilbijart; ez dizanim ku te gelek asteng dîtine ta ku te ew xwendin bi dest xistiye?

M. Xelîl: -Ez bi xwe jî nizanim çawa û di kîjan kêlîkê de ramana sînemayê ketiye bîra min, lê tişta ku dizanim ew e ku hergav, li Qamişloyê, piştî ku fîlmê sînemayê dest pê dikir, min cihê xwe bi vedizîn li goşeyekê digirt, min ji fîlmên "Karatê" hez dikir, reng e min bi qehremanên wan fîlman lawazî û biçûkbûna laşê xwe yê dema dibistanê dinuxumand, çinkî li dibistanê min dixwest ku kulma min jî wek kulma wan be da ku ez bikaribim mezinan perwerde bikim.

Piştî ku min fîlmê " ODIB" dîtibû min hew ji wan fîlmên dijwar hez kir .

Pişt re ez ji bo xwendinê çûm Çekoslovakyayê, li wir, ez beşdarî pêşbirka pejirandina beşê sînemayê bûm, di pêşbirkê de ji nav çar xwendevanan, wek yekemîn xwendevanê biyanî ji nav çar xwendevanan, ku ji bo wê salê hatibûn hilbijartin, di beşê sînemayê de bi ser ketim û hatim pejirandin. Bêguman di destpêkê de ez bi tundî li beramberî wan kesên ku min hinartibûn xwendinê rawestiyam çinkî wan dixwest ku ez hendeseyê (muhendisiyê) bixwînim..

Armanc: Ma gelo tu dixwazî sînemayeke kurdî yan jî fîlmeke kurdî pêk bînî, gelo çi şiyan di vî warî de di nav destê te de heye, asteng û alozî çi ne?

M. Xelîl: Ez sînemazanekî kurd im, di baweriya min de netewe û welatê sînemayê nîne. Sînema zimanekî navnetewî ye, lê çanda min û zimanê min û hestên min û nasnameya min kurdî ne, berî her tiştî ez dixwazim bi cîhanê re bipeyivim, lê wek lawekî kurd bêguman doza kurdî ji bo min dozeke bingehîn e.

Lê piroblema me kurdan ew e ku her yek ji me xwe wek filosofekî dibîne, her tiştî dizane, eger tu ji kurdekî bipirsî ma tu dizanî balefirê bajo, wê bibêje hê min najotiye, nikare bibêje na ez nizanim, çinkî ji rastgoyîyê şerm dike..Her kes ji me dikare di warê xwe de dahêner û hosta be, nanpêj dikare di warê karê xwe de nanpêjekî jîr û zana be; bêyî ku xwe tevlî karê tixtoriyê bike, dengbêj jî dikare dengbêj be ne ku nivîskar û romannivîs û sînemazan be, sînemazan jî dikare sînemazan be ne ku serokekî siyasî be

Ez dixwazim li vir vê bûyerê ji te re bêjim: Berî du salan li mehrecana Berlînê ez pêrgî hin rêxistinên kurdan hatim, ji min weye ku dê bikaribin bi alîkariya min fîlmekî çêbikin. Li ser vê çîrokê ez bi wan re peyivîm, wan jî ji aliyê xwe mirovek destnîşan kirin da ku li ser projeyê bi min re danûstendinê bike. Piştî du rojan ji guftûgoyan, birader ji min pirsî: Em dê çava çîrokê bikin senaryo. Min dest bi şirovekirinê kir û min gavên bingehîn ên prosesa guhertinê jê re ron kirin. Piştî pênc deqîqeyan biraderê me ji min re got: Mano, te çaş salan ji bo vêya xwendiye, lê va ye min di pênc deqîqeyan de fahm kir û a nuha ez dizanim çawan çerokekê bikim senaryo, ne tenê wilo aniha ez dikarim deh senaryoyan je binivîsînim!!

Min jî hetaheta dev ji ramanê berda...Gerek ez li hinekan bigerim ku guh bidin sînemayê wek huner ne wek propaganda partiyekê. Aniha ez hewl didim ku ji bo fîlmê xwe yê dirêj zemînekê peyda bikim. Bêguman asteng pir in wek: peydakirina nûneran, cihê wênekêşanê. Ez dixwazim ku fîlm bi zimanê kurdî be ev jî pirr zor e çinkî nûnerên me yê jîr , yan jî yên ku bi rastî pispor bin nîn in. Xewna min ew e ku ez fîlmê xwe biafirînim. Eger hat û ev xewn pêk hat, wê gavê dê gelek bizanibin ku çîrok ne hema behreyeke serberdayî ye.

Armanc: Min çend fîlmên te yên kin dîtine, her wisa min fîlmê te yê ku beşdarî mehrîcana FRIBORG`ê bûbû dîtiye, di hemû fîlman de tu bi awayekî balkêş li ser rûyê mirovan radiwestî, ji bo çi?

M. Xelîl: Li ba min, derbirînên ku di rû û çavan de peyda dibin renge di peyv û hevokan de peyda nebin. Mirov dikare helbestekê bike çend dîmenên sînemayê ; bêyî bikaranîna diyalogê. Ez di rûyê zarokê kurd de, di çavên jina kurd de dîrokekê ji şînê û ji renckêşanê dibînim. Her wisa ez hêviyê dibînim... Rû û çavên wan pêwistî şirovekirinê nabin.. Sînema ji hunerên dîtir hinekî cihê ye çinkî ji bo xwegihandinê dikare gelek rêçan bikar bîne wek wêneyan, dengan, bandorkeran, rengan, ronahiyê û birrînê. Di hin fîlman de rola diyalogê serekî ye, di hinan de rol ya birrînê yan jî ya ronahiyê ye. Ez bi xwe dixwazim di fîlmên xwe de wêneyên ku nêzîkî resimkêşanê ne pêşkêş bikim, ez dixwazim ê temaşevan hest bike ku li pêşengahekê ye. Carcaran ez guh nadim hersê regezan (bûyer, cih, dem), lê xwe dispêrim ser nîşanên ku bi hestan re dipeyivin, ji bo min hestdariya temaşevan girîng e, lewra her gav ez dixwazim ku wênekêsana fîlmên xwe bi xwe bikim.

Armanc: Tu ji şêweyê kîjan rejîsorî hez dikî yan jî tu xwe nêzîkî kê dibînî?

M. Xelîl: Min ji helbestvaniya rejîsorê Qirxizîstanî Paradjanov, ji rengên wî û ji sembolên wî û ji gotinên wî yên xweş ên li ser Qirxizîstanê hez kiriye.. Min ji fîlmekî Çekoslovakî yê li ser cengê bi navê (Firoşgeha li ser kolana serekî) ku ji alî herdu rejîsoran (Elmarklos û Yan Kadar) hatiye çêkirin, hezkiriye. Ez ji hişmendiya tund û ji bêserûberiya şêweyê Jim Karmoş hez dikim. Bi giştî ez fîlmên ku bûyerê berz dikin, hez dikim. Apê min digot ez ji xwarinên xweş hez dikim, ez jî wek wî ji fîlmên xweş hez dikim.

Armanc: Tu bi belgefîlmekî xwe beşdarî mehrecana FRIBORG`ê bûyî, ma gelo tu dikarî li ser helwêstên li ser fîlm bipeyivî?

M. Xelîl: Tiştekî pirr xweşik e ku welatekî wek Swîsreyê guhbide fîlmên cîhana sêyem. Fîlmê min "Kurdistan cihê ku Xwedê lê radizê" du caran hat pêşkêş kirin. Piştî du rojan ji pêşkêşkirina fîlm, jinekê ez rawestandim, ji min re got: Ev serê du rojan e ku ez di cîhana fîlmê te de diramim.. Jineke din jî ji min re got: Kêfa min pir ji fîlmê te re hat, di fîlmê te de mirov dijwariyeke mezin û renckêşaneke req hest dike, digel ku fîlm bi xwe pirr rewan e jî.

Bêguman van derbirînan ez kêfxweş dikirim, ya ku bêtir ez kêfxweş kirim ew e ku fîlm ji bo pêşkêşkirina li 18 bajarên Swîsreyê hatiye hilbijartin.

Fîl Hemdî çawa hat girtin

Çîrok

Azîz Nesîn

Ji terefê mudurîyeta Emnîyeta Stenbûlê ve, ji bo hemû wilayetên taşrayê (yên dervayî Stenbûlê) ev telegraf hatibû şandin: Yekî sî û pênc salî, bejindirêj, du sed kîlo giran, kej, sê diranên wî kêm, di çenga jorîn de diranekî wi yê kursîyan dagirtî, qîlê wî yê jêrîn ê hêla çepê zêrkirî, kincên xetxetî û qehweyî lê, porweşiyayî, rûgirover, çavqahweyî, bi navê "Fîl Hemdî", sucdarekî dijwar î sextekar, ji destên du polîsên me yên ku di kulûbeya nobetê de sê roj û sê şevan bi baldarîyeke mezin nobet girtibûn û ji ber wê bê xew mabûn û bi rê ve de ra-zabûn, firsetekê peyde dike û direve. Piştî lêkolîn, lêgerîn û lêpirsina me, reva Fîl Hemdî bi temamî hatiye fahmkirin.

Ger bê qereqola wîlayeta we an qereqolek ji yên qezayên ku bi wîlayeta we ve giraêdayî ye, an ji polîsekî rê, navnîşanê bipirse, ji kerema xwe re jê re bibêjin ku çavên me li rêya wî ye, em rica dikin ku bila me zêde di întizarê de nehêle û di wexteke munasîb de bê Mudurîyeta Emnîyeta Stenbûlê û teslîm bibe. Sûretê sabiqalîyê dijwar Fîl Hemdî bi vê telegrafê re ye."

* * *

Li îstasyoneke wîlayeteke taşrayê du polîs dipeyivîn:

- Kek Remezan, ev mêrikê ku salepê vedixwe muhaqaq Fîl Hemdî ye.

- Hii... Dişibê... Sûretê wî derxîne em tê binêrin.

Sûretekî derdixîne û rê hevalê xwe dide.

- Ne ev e, lo Remezan. Ev sûretê te ye.

- Hii... Min di eydê de kişandibû, çawa ye?

- Baş e, lê tu hebekî bikenîya lo!.. Sûretê Fîl Hemdî bibîne.

Remezan ji bêrîka xwe gellek sûretan derdixîne û lê dinihêre.

- Ev sûretê bavê min e... Ev bîranîneke eskerîyê ye... Ev kî bû Mehmûd?

- Ev? Çiko ye...Qaçaxçîyê eroînê Dûman Elî...

- Ev jî mişkê otêlê Suphî... Sûret tev li hevdû bûne.

- Vî fîlî peyde bike, lo Remezan!.

Mehmûd û Remezan sûretan tev didin û li sûretê Fîl Hemdî digerin.

- Zû Mehmûd... Mêrik salep vexwar, wê bireve...

- Lê binêre, bê çawa li dora xwe dinihêre.

- Va min dît, wê ev sûret be. Temam ev bi xwe ye!

Herdu diçin ba wî merikê ku jê şuphe dikin.

- Hemşerim, hele weha bisekine...

Li sûret dinihêrin û li rûyê mêrik dinihêrin.

- Carekê jî kêleka xwe bide me.

- Wey, naşibê law Remezan!

- Bila qomiser beg jî wî bibîne Mehmûd, belkî ew wî bişibînê.

- Hemşerim de bimeşe... Tu ê heta qereqolê werî...

Li bazara wîlayeteke taşrayê ya din, du polîs dipeyivin:

-Pirr eyb e, lo kek Şukrî. Em heta êvarî gerîyan jî, me ev Fîl Hemdî zevt nekir.

- Ev mêrik ne ew be?

- Belkî jî ew e. Ka em bipirsin. Ew diçin ba mêrik...

- Begê min, navê te çîye?

- Mustafa...

Di guhê hevdû de:

-Dibêje Mustafa...

- Ê, qey nabêje Hemdî... Navê xwe vedişêre.

- Ji wî heye ku wê me bixapîne.

- Begê min, tu dikarî hebekî werî...

* * *

Li qehwexaneyeke wîlayeteke din a taşrayê, du polîs dipeyivin:

- Min do sê Fîl Hemdî girtin, lê qomisêr yek ji wan jî ne eciband.

- Ev komsêrê me jî çi qas muşkulpesend e, ha...

- Hişşş!... Hêdî bipeyive. Bila pê nehese. Di bin çavan re li vî mêrikî binêre!...

- Ew e kuro... Ew bi xwe ye...!

- Lê di wî ewraqê ku hatibû de, dibêje, şîşman e. Vîya zeîf e, mêrikekî wek skeletekî ye.

- Zeîf bûye, keko. Ma gera bi mehkûmî ewqas rehet e?

- Ew jî weha ye... Lê ev esmer e. Fîl Hemdî kej e.

- Hingî li çîyayan û li kendalan gerîyaye, rengê wî hatîye guhertin.

- Heqê te heye. Lê keko, porê vîya reş e û tof e. Di wî ewraqî de dibêje, porê Fîl Hemdî weşîyaye.

- Ê, êdî ewqas jî dibe. Mêrik belkî ji bo ku neyê naskirin, perûk xistîye serê xwe.

- Ma em ji bo çi sekinîne? Em wî bigrin.

Nêzikî li mêrik dikin.

- Navê te çî ye?

- Hemdî...

Ew bi mahne li hevdû dinihêrin û dikenin.

- Haydê qereqolê... Haydê!..

- Çi heye?... Çi bûye?...

- Zêde nepirse! Tu ê li qereqolê fahm bikî.

* * *

Li ser rêya wîlayeteke taşrayê ya ku bi qasî çend kîlometreyan asfalt e, wek ku li hemû wilayetên din ên taşrayê dibe, du polîs mêrikekî ku bi rê ve diçe, dig-rin.

- Devê xwe veke!

Di devê min de tu tişt tuneye.

- Madem tuneye, tu ê vekî.

Mêrik devê xwe vedike. Her du bi hevdû re li diranên mêrik dinihêrin. Polîsek ji yê din dipirse:

- Li vî ewraqî binihêre, çend diranên wî tunebûn?

Yê din ewrêq dixwîne:

-"Sê diranên wî kêm in, di çenga jorîn de diranekî kursiyan dagirtî û di çenga jêrîn de li alîyê çepê diranekî wî yê qîl zêrkirî..."

Polîs diranên mêrik dihejmêre:

- Yek, dudu, sisê, çar... Tev nelive lo, te ez şaş kirim. Yek, dudu, sisê, çar, pênc... bîst û çar. Bîst û çar diranên wî hene.

- Bîst û çar? Ma tu dizanî çend heb kêm in? Çend diranên te kêm in?!

- Heyşt.

- Rakirine. Ji bo delîlan ji ortê rake, diranên xwe rakirine.

- Diranên min taxim e. Di devê min de tu diranê ku yê min bi xwe be, tuneye... Tew çar heb jî, gava min garis xwar, şikestin.

- Ma di ewrêq de dibêje ku taxim e an na?

- Na, nabêje. Ji bîr kirine. Ev e rihê min, ev e... Ew bi xwe ye. Tu li diranê wî yê qîl binihêre. Zêrkirî ye. Begê min, bi me re were.

- Bi kuderê?

- Qereqolê! Bimeşe...

* * *

Ji mudurîyeta Emnî-yetên wîlayetên taşrayê rojê bi sedan telegraf dihatin Mudurîyeta Emnîyeta Stenbûlê:

"Bersiva telegrafa falan falan tarîxê û filan filan hejmarê ye:

Di wîlayeta me de çar heb Fîl Hemdî yên ku kincên wan qahweyî û xetxetî ne û heyşt kesên ku diranên wan ên qîl zêrkirî hatine girtin. Em bi hurmet rica dikin ku di warê besbûn an nebesbûna hejmarê û domandin an devjêberdana lêgerînê de, emir bête dayin."

"Bersiva telegrafa we ya hêja ya filan tarîxê û filan filan hejmarê ye: Ez bi hurmet pêşkêş dikim ku di wîlayeta me de yên ku giranîya wan di navbera 180 û 220 kîloyan de ne, du duzîne Fîl Hemdî hatine girtin. Ferqîya di warê kîloyan de, ji ber bê ayarbûna kantaran tê. Li gor ku çavên hemuyan qahwerengî ne, di warê Fîl Hemdîbûna wan de, cîh ji tu şikan re nemaye. Fîl Hamdiyên girtî, hatine şandin, ger yên ji ber çava revîyabin, hebin, li wan jî bi diqet tê gerandin û em ê wan jî peyder pey bişînin."

Telegrafa ku Mudurîyeta Emnîyeta Stenbûlê ji bo hemû mudurîyetên emnîyetên taşrayê şand:

"Ji ber ku hemû cîh hatine dagirtin, Fîl Hamdiyên ku nuha di destên me de ne, têr dikin. Ez bi sipasîyên xwe ve rîca dikim ku heta emrê duyem, divê ji bo girtina Fîl Hemdiyan û lêgerîna wan navbirek bête dayîn."

Not: Fîl Hemdîyê ku firar kiribû, hatiye girtin.

Wergera ji Tirkî:
Mustafa Aydogan

Weşanên Nû

Kitêba "Kurdish Cultur"

Felat Dilgêş

Gel bi kirinên xwe yên çê, bi kultur û zimanê xwe di hiş û bîra mirovatiyê de cih distînin. Carna tişt zû ji bîra mirov dertên, mirov ji bîr dike û ji demekê bi şûn de bi bîr nayne; lê belê bîra mirovatiyê kûr û şiyar e, tiştê girîng, bi tenê xwe gihandina vê bîra mirovatiyê ye. Bêguman riyeke vê yekê jî nivîs û kitêb in.

Qet şik tune ye ku kultura Kurdî di dîroka mirovatiyê de ciyekî gelek giring digre. Lê çi heyf e ku ev mîrasa mirovatiyê ya dewlemend, bi bêsihudiya siyasî ya Kurdan re bêrûmet bûye, hatiye bê rûmetkirin; sosret û tofanên mezin jiya ye. Xwestine ku bê jibîrkirin, ji rastiya xwe bê dûrxistin û heta ji holê bê rakirin. Ma ji bo gelekî, ji bo kulturekê bêsihûdiya herî mezin ji bîr bûn û ji hiş û bîra mirovatiyê dûr mayin nîn be, çi ye!

Kitêba Kurdologa Amerîkî ***Denîse L. Sweetnam "Kurdîsh Cultur- A Cross- Cultural Guîde"*** li dijî jibîrbûn, û ji rastiya xwe dûrxistina kultura Kurdî vejîn û serhildanek e; raperînek kulturî ye. Herwekî ku ji navê kitêbê jî tê fêmkirin, kitêb bi Îngilîzî, bi Ingilîziyeke hêsan hatiye nivîsîn. Nivîskara kitêba Kurdîsh Culture zimanzan û Kurdologek e. Gelek baş bi zimanê Kurdî dizane û ji sala 1985 an vir de di nav Kurdan de ye, bi jiyan û kultura Kurdî re têkildar e. Nîviskar di kitêba xwe de bi awayekî piralî li ser her cûre çalekiyên kulturî yên jiyana Kurdan rawestiya ye. Xwendevanê vê kitêbê dema ku vê berhema hêja bigire destê xwe û di çav re derbas bike; ez bawerim di serî de dê ev yek bala wî/wê bikişîne: Çavdêriya nivîskarê. Bi vê kitêbê dilê Kurdan hatiye xwendin; ne bi tenê jiyana wan a kulturî, mêrxasî, camêrî, mêvanperwerî, xwarin, dîn şîn, şahî, rabûn û rûniştina Kurdan û hwd bi çavdêriyek objektîf hatiye nivîsîn.

Herwekî ku nivîskar di pêşgotina kitêba xwe de jî beyan dike li ser dîrok û rewşa siyasî ya Kurdan nesekiniye, jiyana kulturî ji bo xwe armanc hesibandiye û di vê yekê de bi ser jî ketiye. Kurdîsh Culture ji çar beşan pêk hatiye. Di beşê yekem de nivîskar bi awayekî berfireh li ser camêrî, mêvanperwerî, xîretkêşî, şerm, dilsozî, bênfirehî, yekîtî û bêtifaqiya Kurdan rawestiyaye. Di beşê duwem de li ser dîn û baweriyê; Xwedê, Melek, Cin, Felek, qismet, bereket, çêl, guneh, xêr, qurban, ziyaret, çavê xerab, nexweşîn, sihet, mirin, helal û heram, xewn; bawerî û bawermendên Sunnî (Îslam), Êzîdî, Elewî, File û Cihû sekiniye. Di beşê sêyemîn de li ser metoda fêrbûna kulturekê (li vir nimûne Kurdin) û têkiliyên kulturî hatiye rawestîn. Di beşê çaremîn ê kitêbê de li ser xwarin û vexwarinên Kurdan hatiye rawestîn û tarîfa gelek xwarin û vexwarinên Kurdî hatiye kirin.

Li gor mijarên ku di kitêbê de cîh sitandine, bi mesele û gotinên pêşiyan ên ku di nav gel de belavbûyî ne (li Kurdistanê), mijar bi hostayî hatine hunandin. Dema ku nivîskar bi awayekî gelek dorfireh li ser mêvanperweriya Kurdan radiweste, hin mamik û gotinên pêşiyan ên gelek balkêş ên weha jî dide

" Mala bê mêvan
Gundê bê şivan
Ev herdû jî bêguman"

"Mêvan mêvanê Xwede ye"

"Mêvanê yekî, mêvanê gundekî"

Nivîskara kultura Kurdî ji nîvis, weşan û berhemên li ser Kurdan ên ku ji alî lêkolînerên biyanî û nivîskarên Kurd bi xwe ve jî hatine nivîsîn haydar e, gelek ji wan xwendine û wek çavkanî di kitêba xwe de nîşan daye.

Di kitêbê de nifûsa Kurdan hindik hatiye nîşandan û li ser cejna netewî ya Kurdan Newrozê, bi berfirehî nehatiye rawestin. Ez hêvîdarim ku dê nivîskar, di çapa duwem de vê rastiyê bigire ber çawan.

Kitêba Denîse L. Sweetnam dilê min hênik kir, ji Îngilîstanê ez hilanîm birim Kurdistanê û min di Kurdîsh Culturê de Kurdistan dît; Kurdistan li ber serê min, di destê min, di himbêza min de bû. Bi Kurdîsh Culturê re ez çûm li maleke Kurdistanê ya camêr, dilsoz û mêvanperwer bûm mêvan.

Li Kurdistanê mêvanê yekî; mêvanê malekê, mêvanê gundekî,

Selîm Berekat

TOL

1

Hemû Palto li wir in.
Hemû bager li wir in.
Gavên di nav berfê de, û hemû berf li wir in.
çira, û xanî, û tarmayiyên dawîn, hemû li wir in.
Bi destên xwe yên kedî, hetanî ku tu bikaribî, ciwaniyê berhev bik!
Jîr be, da ku dîmen rengvedana te ya mêşinî be.

2

Bîntengiyek, di çeşnê gêwlên sibehan de, hatiyên ber bi kutayiyên min de, mijûl dike. Û ez, di kêferata xwe de, li bin pencereya mezin, wek şerwalên girtiyekî, li ser werîsê tenik, ê ji serê pêkenînê ta nalîna wî dirêjkiriye, şûnê radixînim

3

Merdiya boşayiyê û viyan gumana min e.

4

Toreyî nîşana şevê ye, av jî ramaneke, kamilbûna xwe ber bi pêş de rê dike.

5

Wek pêlava ku boyaxa wê diçuruse,
wek destikê derî yê ji nikel;
qîrîna te wisa ye

Peyv

Roj: Toreyeke, xwe di serçavka bayî de vedişêre.
Ba: Gava wişeyê ye ya bi alî nehêniya xwe de.
Deng: Wêrana form e.
Bêrekirin: Zêrê reşandî li ser qedîfeya kutayiyê ye.
Aso: Dahênerê ronahiyê ye.
Nebûn: Di şevbuhêrkên bîntengiya sîberan de pêkenîn e.
Nivesandin: Zordarî ye, jibîrbûyinê imtihan dike.
Hejmar: Serencama bêhûdeyiyê ye.
Mêwe: Rêberiya darê ya li ser paşerojê ye; paşeroja ku hemû rêberiyan dixapîne.
Serçavk: Nalîna xuyayiyê ye.
Qonax: Helkehelkeke dûbarekirî ye.
Dilniyayî: Li rexê dîtir kurtepist e.
Qiyamet: Zaroktiyek e, aqil diçesipîne.
Zêr: Pevçûna di Xanê de ye.
Jiyan: Gulleyek zêrîn e.

Mîrê hechecîkan

M:Efîf Huseynî

Ro diçe ava, Mîr dide dû şopa hechecîkan, li dûr li minarên bilind temaşe dike, çiyayên Wanê tîne bîra xwe... Hechecik bilind difirin; ji kolanên teng û hêwî derdiçin, li ser nermahiya çemê Nîlê xwe li ba dikin.. û li dora minaran bêwestan digerin.

-Ev hechecîkana li esmanan tîpên min in!

Giyanê Şêx Seîd bi ser de dibare, dilerize, ma kê bawer dikir ku dê li Qahîreyê bihêwire, kê bawer dikir ku du caran dê berî bide Iskenderiyê û li Kafafîs bigere?

Di destpêkê de wî nabîne, ji buroyên melevaniyê dipirse, li kuç û kolanan digere û bi zarekî bilind û nazik ji xelkê dipir-se..Payîz e ji nişkêve bi ser temenê wî de dibare, li derveyî hebûna wî kulîlk diçelmisin, çend gulan didehev, lingên xwe bi ava Iskenderiyê şil dike, çend terhan bilind dike.. Yên çelmisî dide alî, û bi bêdengî, payîzê bîn dike, pişt re li Misrê li buroya wezareta karên giştî cihê helbestvanê ku lê digere destnîşan dike...(Car-caran ji paş berçavkên xwe çend awir li min vedidan, min çavên wî yên reş didîtin, min di çavê wî de cîhaneke xweser û bê sînor didît) bi vî awayî Mîr piştî çend salan ji mirina helbestvanê mezin nivîsandibû, laşên ter dipesinand, dema bêzar dipesinand:

(Li hêwanê xaniyê dolemend/ Neynikeke mezin î kevnar/ Bi kêmanî berî 80 salî hatiye kirîn/ Xortekî rûxweşik, alîkarê terzî û di rojên yekşeman de werzişvan-/ şipya bû û nameyeke qalind di destê wî de bû/ Name spart kesekî ji malê/ Name bir û çû / çû da ku kvîtoyê bîne/ Alîkarê terzî bi tenha xwe ma, bendewarî dikir/ Piştî pênc deqan kivîto anîn, kivîto bir û çû/ lê neynika ku li seranserî temenê xwe yî dirêj dîtibû û dîtibû/ Hezar tişt û hezar rû dîtibû/ Ev neynika kevnar, aniha pir kêfxweş e, pir serbilind e/ ku di van çend deqan de pêşwaziya vê spehîtiyê kiriye...

* * *

Hêdî hêdî bi nêrdewana kevî şikestî ve hildikişin, ji koşeyan bîna tenhatî û salan difûre, valahiyeke dagirtî ye, gerek berî bide kûrbûna xwe..

Li hundir, di wê kûrahiyê de , Mîr di vê kûrbûnê de diramiya, Peykelê Homeros, çend peykelên bê serî ji Atînayê, ronahîkirina laşên kor, perdeyên reş, belgên rewan, pirtûkên li ser Kurdan ên gerokên Yewnaniyan...Bi zimanê Firansî bi hev re peyivîn û di gumlekên hevûdû de dilsojî û bîranîn diçandin.... Nêrdewanek kin, bafon, laliyek şikestî, belgên daran bi gêwlên hestdar, qaşilên hinaran, hejmareke pir ji kevirên çarkoşe, li ser keviran 1989/11/ 24 nivîsandiye, çakûçekî mîxan, çûkên çelmisî, bêdengî, xirecir, taristaneke dilbijandî, êşên germ, du mişext û du biyanî li bajarekî deryayî, her tişt tevlihev bûye..

Kafafîs li gel gumlekên xwe yên neqişandî, li gel berçavkên xwe yên li ser maseyan avêtîne, berçavkên ku ji serê bêvila wî ber bi hingivandina destê wî ve dadikevin, destên ku bêdengiya miriyên li welêt nemirdikin, dengê bangê û roavahê, roavahiyeke bi tenha.. ji gewriya bangevan diherike, û li ser keviya perdeyan her tişt ligel xwe mijûl dibe.

- Leşkerên Iskender di Amûdê re derbas bûbûn.

Caweke kesk li ser gora miriyên sifirene li ba dibe, bagerek goristanê derbas dike, qutiyên tûtinê vala ne, simên bizinan, qelûnên zer, katjimêrên dawîn ên mirina apê min.

- Kurê min jiyana te ji destnivîsê xweşiktir e.. çinkî serpêhatiya êşê ye!

Gulle.. Gulle, û Amûdê di nivê êşê de ye, Kurdistan... Kurdistan, jimara pêşîn ji Qahîreyê, Bedirxanî, Kafafîs, Hechecik, Sala 1898`an, sala 1988`an, 90 sal in ez çavdêriya masiyên piçûk dikim; masiyên ku li hawirdor gola piçûk digerin bêyî ku kenarekî ji xwe re bibînin.

Dadgeha Gel

Diya Ciwan

Piştî gotin û gazind westehan, xelkê gilhên dîkên xwe avêtin dadgehê, dadgehê şand pey herdû aliyan, û ew hemberî hev kirin. Qadî berê xwe da xelkê û got: Hûn çi ji dîkan dixwazin?

Xelkê bi yek carî re, çavên xwe girtin û devên xwe vekirin û gotin: Hîn ev dîkên han di hêkan de bîn, me ew ji devê mar û dûpişkan parastin, dema ji qalik derketin; me rahişte wan û cihê wan ji erdê bilind kir, dema bi firê ketin em bi dûv wan de bûn, me ew ji devê rovî û wawîkan diparastin, her û her em nobetçî û guhdarên wan bûn, ku yek ji wan, êvarî nehata malê, xew nedikete çavên me, ji mista destên me xwarin, ji hêstirên çavên me vexwarin, bi vîna me gerim dibûn, dema perweste bûn, me ew li ber destên Melayekî zana danîn, deris û dewr dane wan, ew hînî bang û yasînan kirin, dengê banga wan bilind û zelal bû, xelkê li ser dengê wan berê xwe dan kar û barên xwe. Hew me dît roj bi roj bi nikila çûne serê hev, her yek ji wan got: ez dîkim û yên dî dîkloşkin. Her yek ji wan got: Li ser banga min nimêj bikin, yên dî dijî olê ne. Her cara ku dadiberizîn hev, perçe ji laşê hev dikirin. Her yek ji wan navek li xwe kir, û rengek wergirt.

Rovî û Çeqelan keys li wan anîn, xefk û dav li ber wan vegirtin. Her yek ji wan, bi awazekî bang da, deng- tevlî hev bûn, nêzîk û dûr nizim û bilind qenc û xerab, ketin nav hev, deris û dewr ji bîr kirin. Her yek ji wan got: Ez im Mela. Bi vê gotinê xelkê gotinên xwe birrîn.

Qadî berê xwe da dîka, û ji wan re got: Hûn bi çi berevaniya xwe dikin?. Dîka li hev û dû nêrîn, li hev êwirîn, li kwîrikên xwe gerehan, yek bersiva ku Qadî pê qayil bikin nedîtin.

Qadî berê xwe da xelkê û got: Ji ber ku hebûna wan bi we ye, ez fermanê têxim destên we de.

Piştî dan û standineke dirêj, xelk bi biryarekê derketin: Ji îro pê ve çi dîkê li xwe venegere, em dê wî li pişta derî bihêlin, da bibe şîva gur û roviya.

Wêjeya Mezopotamyayê -1-

Jorgen Læssøe

Werger

Berfirebûna çanda Sumeriyan

Ew zimanên ku di hezarsalên siyemîn, duyemîn û yekemîn ên berî Îsa de, di beşek ji rojhilata navîn ku Grekiyan navê "Me-zopotamya" lê kiribûn, de dihate xeberdan bi awayê gotin û nivîsandinê çandeke wusa di xwe de digirt ku ne jê bûna wê cîhana îro bi awayekî din bihatina dîtin. Mezopotamya, We-latê navbera herdu çeman– çemê Dîcle û yê Firat– bi dîtin û ramanên gelheyê (nifûs) xwe, bi zîrekiya wî ya afirandinê, bi çîka wî ya birêvebirin û bi hissên lihevrastkirinê, mora xwe li sê hezar sal ji wê dema dîroka cîhanê ya ku pirên pêşangeh, bîrewerî, pîvan, û –kêm û zêde– çinyat û bawerî jî tê de derketin holê, daye û digel girankirina barê kultura dahatu ya rojavayê Ewropa, ew xuert jî kiriye. Bêguman ger ne ji vê çandê bûna dibû ku sal ne weke vêga lê bi hinek awayên cuda bihatina sazkirin, ne pêwîst bû ku heftiyek heft roj be. Herweha Xwedê jî biryar nedaye ku wê saetek 60 deqe û deqeyek jî 60 saniye be. Ango evên han giş di dema berî dîrokê de li Mezopotamya hatine dîtin û peydakirin, ne ku afirandin. Di destpêka sêhezarsaliya berî Îsa de wê dema ku mezopotamiyan pêşangehên xwe yên hunerî ramî didan hingê haziriyên pêşî yên nivî-sandinê jî derdiketin holê, digel ku nivîs bi xwe bi wî awayê ku em jê re "wêje" dibêjin hê 500 sal piştre hatiye xebitandin jî.

Çanda pêşî ya Mezopotamya ji aliyê Sumeriyan ve hatiye afirandin; zimanê wan yê ku di berkêliyan de hatiye bikaranîn nakeve nav tu famîleyên zimanan yên ku ta niha lêkolîn li ser çêbûne û di tekstên Asya kevnare de tên dîtin. Ji ber vê yekê jî agahdariyên me yên li ser hatina Sumeriyan ber bi Mezopotamyayê ve, bê we ku ew çewa û ji kur ve hatine, bê bingeh dimînin û nayêne eseyîkirin. Bes tu guman tê de nîne ku ew, nêzî 3000 sal berî Îsa ji navçeyên rojhilat û yên bakurê rojhilata Mezo,potamyayêveyanîjipesarûqiracênhêla Îranê ve hatine. Wan li Mezopotamya gelek civakên bajarvaniyê ku mîna bûn dewltên şaristanî yên Grekiyan danîbûn. Di navbera salên 3000 û 2000 berî Îsa de– ew qonaxa ku Sumeriyan tê de bi awayekî siyasî bandorî kirine û çanda wan şax vedaye– wan axa xwe fireh kiriye, biriye heyanî başûrê Mezopotamya û hingê li wir ew derketine pêşberî bînahiyên dîrokê.

Ji deftergiriya bi wêneşanî ber bi nivîsa helbestvanî ve

Ger ne ji sîstema nivîsandinê û parastina pê bûna ew agahdariyên berdest ku ji şaxên cihê yên birêvebirinê dihatin, qeyd dibûn û digihan pêgehên (merciyên) dadî, ev civaka han zor dixebitî. Ji xwe diyar e ku dîtina nivîsandinê bi pêşveçûna têkiliyên civakî ve girêdayî ye. Bê şik di sedsala pêşî ya dema dîrokê de nivîsandin amûretekî deftergirîyê bûye ku bi alîkariya wê aboriya xelk û civakê li hev dihate rastkirin.

Nimûneyên nivîsandinê yên herî kevn ku li Mezopotamya têne zanîn sîstemeke wêneşaniyê pêş me dikin. Hê 2500 sal berî Îsa li Mesopotamya alavên nivîsê wer kemilîbûn ku nivîskarên jêhatî bi wan bêkêmasî dikaribûn nuansên peyvê yên bêhejmar digel dayina formên rêzimanî yên berbiçav û yên din derînin holê. Herweha derketina edebiyata Sumeriyan ya rastî jî leqayî wê demê tê. Ji xwe ti guman tê de nîne ku di wê pêla dûvedirêj ya berî 2500 salî de adetekî devkî yê salixdana bûyerên efsanewî (mîtolojîk) û nîv mêjûyî hebûye. Ew nivîsa Mezopotamî ku Sumeriyan dîtibû nêzî 2300 sal berî Îsa încar bi zimanekî din ji yê Samî ku îro bi piranî zimanê Erebî nûneriya wî dike lê gelek zimanên xwedî kulturên cuda mîna Heberî (Hebreî), Aramî û Etyopî jê derketine, hate bikaranîn.

Bicihbûna gelê Samî li Mezo-potamyayê rewşa nivîsandinê jî bi xwe re xurtir kiriye û wê bi pêş ve biriye. Çiku hingê diviyabû ku nivîskar û deftergirên Su-merî navên ne Sumerî û sîmge û navlêkên amûretên ne Sumerî jî di belge û hejmariyên xwe de binivsînin

Bi piranî wêjeya Mezopotam-yayê bê nav e, lê kêm be jî di hin rewşan de navê rastî yê xwedîyê berhemê jî hatiye dayîn. Di gelek rewşan de çavkaniyan, li gor awayê belabûna wan besteyên wêjeyî ya dercîhanî, navê sernivîserê (redektor yan jî keşe) wan jî, dane. Di dibistanên nivîsênê de destpêka perwerdekariyê bi xebata ser listeyan çêbû û bi vî awayî wêjeyeke zanistî hate holê.

Ferhengên lewheyî (leweheferheng)

Di nîveka sêhezarsalî ya berî Îsa de, dema zimanên Sumerî û Samî li Mezopotamyayê li kêleka hev dihatin xeberdan hingê pêwîstî çêbû ku wergerên bi zimanê Samî (Akkadî) bên amade kirin. Çiku hingê ew ziman ji aliyê desthilatdarên wê navçeyê ve dihate xeberdan û bi vê yekê re wêjeya ferhengan derkete holê. Di pêvajoya duhezar salî [ya berî Îsa] de gava di bin mezinatiya Babîlî û Asûriyan de derebegiyên cihê cihê li beşeke mezin ji başûrê rojavayê Asya derketin, hingê li gor hewcedariya peywendiyan bi gelên din û zimanê wan yê biyanî re: mîna Hurriyan li bakurê Me-zopotamya û heîtiyan li Asya piçûk, edebiyata ferhengî hate saz kirin. Heyamê welatê Babîliyan ji aliyê Kassîtiyan, xelkek ji yên wan çiyayên rojhilat ku çend sedsalan bandorî li Mezopotamya kirine, ve hate vegirtin hingê ferheng hatine nivîsandin û di wan de navlêk û nîşaneyên Sumerî û Samî bi zimanê Kassîtî, zimanekî ku ne ji yek wan zimanên kevnare ye, hatine wergerandin.

Meriv dikare sehî bike û bibîne ku hê ji mêj ve daxwaziya sîste-meke tekûz û lihevhatî di hewildanên hunerên nivîsandinê de hebûne. Ev meyl û daxwaziya lihevrastkirinê bûye wek xuy û karakterek ji bo çanda Mezopotamî ku besta derbasbûna ji nîşaneyan ber bi wêjeya ferhengê ve daye wan. Yek ji wan ferhengan ew e ku Assurînas wê bi navê "Har-ra" (bi Sumerî)="Hubullu" (bi Ak-kadî) binav dikin, ew ji 24 lewheyan pêkhatîye û di heqê rewşa aborî û destmizan, ya tiştên zagonî û îdarî de ye.

Her lewheyek 400-500 rêz tê de ne û di wan de bûyer û navên tiştên din jî qeydkirî ne. Di wan de qala dar û ber û deviyan, bahsa wan amûretên ku ji darên xurmeyan çêdibûn, dihate kirin û li ser hûr û mûrên malan yên razanê, derdanên dar û yên qafik, kasik û firaqên xwarin û avê, li ser çîçek, qabor û guldanikên (vazoyên) wan agahdarî dihate dayin. Ev berhemên han ku mîna ansîk-lopediya hatine amadekirin nêzî 2000 sal berî Îsa çêbûne, lê mixabin ku gelek ji wan yan ji ber bikaranînê yan jî di nav demê de ji holê rabûne.

Zanistiya Suruştî ya hunerê Reml û Falê û ya Xwedayî

Di dema destpêka erdajotin û çandiniyan de, ji bo pîvana pahnahiya axa ajotinê, pirsên geometriyê derketine pêşberî Mezo-potamiyan û ew bi wan ve lepikîne. Nexwe mirov dikare bibêje ku: "Destpêka matematîka Babîlyan ji bo pîvana ax û erdan derketiye û ew qaîdeyên matematîk û astronomiya Keldaniyan (Babîliyên dawî) ku Grekiyan vê dawiyê ew pir meraq kirine, jî ji xebat û lêkolîneke dirêj î sedsalne ya şarezayên Babîlî û Assuriyan hatine holê. Herweha fal û remlan jî li Mezopotamyayê roleke gelek girîng leyîstiye, ev zanistiya ku vî aliyê jiyanê digre destê xwe vê dawiyê bi dûrdîtin û kerametan hatiye binavkirin.

Di jiyana gelê Mezopotamî de gelek Xwedayên mezin û piçûk hatine û çûne. Ew Xwedayên (pût, senem) mezin ku Mezopotamiyan wan wek beşdarê afirandina gerdûnê dîtiye lê dawî jî ew mîna afirînendeyên mirovan jî hatine zanîn ji sê hezarî zahftir in. Xwedanê Babîliyan yê netewî, "Marduk" di salên 1700 i yê berî Îsa de mîna kurê Xwedanê Sume-riyan, "Enkî" derketiye holê. Navê wan Xwedayan giş di wan lewheyên mezin de rêzkirîne, li pey wan jî mêr, jin, şêwirmend, nivîskar û xweda-yên piçûk yên berdevkên wan hatine nivîsîn.

Mîrata (kelepûr) Babîliyan

Bê guman tu şik tê de tune ku ev zanistiya Babîliyan digel wan merc û pevgirêdanên Sumerî ku bi saya lêdomandina Assuriyan gihîştiye welatên rojava, çûye nav Heberî, Grekî, Romayiyan û ne yekser be jî dîsa xwe berdaye wan hawîrdorên Asya piçûk, zanistiyeke rastî û eceyî bûye. Çimkî em niha dibînin ku teoremên pîtagorî hê di salên duhezarî yê berî destpêka tarîxa me de dihate zanîn û di dema hezarê berî îsa de jî astronomên Babîliyan li gor libtên stêran karibûne girtinên hîv û rojê derînin. Ji xwe meraqkirina zaniyariya wan û şarezayiya Kel-daniyan li her derên cîhanê ne vale bû.

Hûrrî û Hesp

Di xilaseka hezarsala sisiyan de hinek komikên piçûk ji wan gelên hêla çiya ber bi wan deverên ku me li jor anî ziman ve hatin. Wan bi zimanekî xerîb î cuda xeberdida û tu têkiliyê wî bi wan zimanên ku wê demê li cîhanê dihatin axavtin, tunebû. Ji ber ku wan ji zimanê xwe re "zimanê Hûrrî" gotiye em wan bi xwe jî bi navê "Hûrrî" bi nav dikin. Hûrriyan bi hatina xwe re, di rojhilata kevnare de, guhartinên mezin anîn holê, çiku wan bi xwe re hesp jî anî deverê. Hesp bû heywana Mezo-potamî ya herî hêja ku paşînê bû makîneya cengê ji bo Asûriyan. Yên ku dema vegirtina navdar ya Hîksos, hespan birin Misrê jî dîsa Hûrrî bûn.

Gava Hûrriyan Hespan anîn Mezopotamyayê qet ne tiştekî, xerîb bû ku hingê wan ji bo pêwîstiyê, li ser kedîkirin û xwe-dîkirina wan kitêbeke destan amade kir; lê ya ecêb û xerîb ew bû ku avakirina dewleta Mîtannî ne bi giraniya Hûrriyan bi xwe lê ji aliyê hinek esilzadeyên Îndo-Ewropî ve ku wê demê giraniyeke wan ya siyasî di nav gelê Hûrrî de hebû, dihate meşandin. Sedemê vê yekê jî bikaranîna wan topên ku bi hespan dihatin kişandin, ji aliyê wan ve bû.

Çavkaniyeke zanistî ku niha di destê me de ye dide xuyakirin bê çilo li cem Îndo-Ewropiyan kedîkirin û xwedîkirina hespan hunereke hêja bûye. Di teksteke ku li bajarekî Turkiye bi navê "Boğazköy", bi zimanê heîtî lê eslê wê bi zimanê Hûrriyan e, hatiye dîtin de gelek termên teknîkî yên zimanê Îndo-Îranî hene, mîna peyva "vartana" ji bo qulabtin ku di Hindîya kevn de "vartate", xwe diqelêbe, tê. Herweha hejmarên tê de jî hima çi bigir eynî formên hindî ne: "1" *aika* (sansikrîtî: *eka*), "3" *tera* (sansikrîtî: *trî*), "5" *Panza* (sansikrîtî: *pantja* : *pança*) "7" *satta* (sansikrîtî: *sapta*), "9" *nawa* (sansikrîtî: *nava*).

Girtina notên dîrokî û pirtûkên rojane

Pirsa Çaxê nivîsandina dîrokê ji aliyê gelên Mezopotamî ve bê bersîv dimîne. Herweha ew awayê dîroknivîsînê ku em niha pê dizanin jî ka gelo ji bo agahdrîkirina dercîhanî ye yan na dîsa nediyar e? Nîşanên nivîsandina dîrokê li Mezopotamya bi awayekî zanistiya wêjeyî heyanî demek kurt berî pêla Tîglatpîleserê seyemîn (li dora 740-ê berî Îsa) ku digihê nêzî pêla seleukîdiyan (li dora 250-yê berî Îsa), nehatine dîtin. Ew nivîsên dîrokî ku hingê hatine nivîsîn bûyerên sal bi sal yên girîng beş bi beş di xwe de digrin.

Di wan de bûyerên cengê lê nîvco nîvco, bi piranî jî lihevhatinên hingê û kuştina kesên ku ji malbata serokên wan in, dihate dayîn.

Ji bo dîroka wêjeyî meriv dikare çend tekstan ji lîsteyên padîşahan bide; ku meriv di wan de li gor bajar û welatan, navê serok û şahên Me-zopotamî yên li pey hev rêzkirî dibîne. Rewşa peywendiyên navbera Babîlî û Asuriyan yên salên 1400 û 700-ê berî Îsa jî di wan de tên dayîn.

Gilgamêş destana hevaltî û mirinê

Nêzî sed sal berî niha lêkolînerê Îngilîzî George Smith (M. 1876) di xebata xwe ya ser tekstên kitêbxaneya Assûrba-nîpal ya Nîne-we de rastî serpêhatiyeke ku qala rabûna lehiyê dike û bi gelek awayên xwe mîna ye Tofana Nebî Nûh, hat. Wer dixwuyê ku bûyera Tofana Nebî Nûh ya Heberî dê ji ber berhemeke wêjeyî ya wê demê hatibe girtin. Destana Gilgamêş di vî formê xwe yê Klasîkî de nêzî sala 1600-ê berî Îsa çêbûye. Redaktorekî Babîlî hinek ji wan bûyer û serpêhatiyên ku hingê qewimîne daye hev li ser wan xebitiye û ji nû ve di vê forma niha de amade kiriye Lehengê me, Gilgamêş, di salên 2600-î yên berî Îsa de li başûrê Mezopotamya mezinê bajarê Uruk bûye. Hê ji hingê ve saloxên hinek qahremanî û tolgirtinên mezin ku di nav gelê Sumerî de pir bi rûmet û pêbawer bûn, jê dihatin dayîn.

Destana Gilgamêş ji 12 lewheyan pêkhatiye û her yek ji wan 300 rêz tê de ne. Di lewheya pêşî de Gilgamêş mîna xortekî jêhatî, hukumdarekî bêrawestan, haydarê ji hertiştî û xwey tecrûbe tê ramîdan. Ew, sûra bajarê Uruk û dîwarê dora ziyareta Eanna (cihê Xwe-dawen Îshtars) avadike. Piştre li ser daxwaza gelê bajêr, Xwe-dawen Aruru hevalekî bi navê Enkidu ji bo Gilgamêş diafirîne, lê pêşî wî davêje navsera çiya nav heywanan. Piştî gelek serpêhatiyan herdu digihîjin hev û dibin dost û heval. Enkîdu li cem mala Gilgamêş dimîne, ew bi hev re gelek pêlên xweş derbas dikin, pir caran serên wan dikeve xaxên giran û gelek macera û serpêhatiyên mezin bi ser wan ve tên lê ew di he-mûyan de bi ser dikevin. Duvre êşeke giran li Enkîdu peyda dibe û dibe sedemê mirina wî. Gilgamêş pir bi ber Enkidu dikeve, ew bi hêviya saxkirinê radihêje cendekê wî û derdikve rêwingiyeke dûr û dirêj. Gilgamêş berê xwe dide oxirê û pişta xwe dide felekê, ew bi çol û pesaran dikeve, li deşt û newalan, qirac û berpalan digere, di ser gelî û kendalan, çiya û zinaran de derbas dibe heyanî ku digihîje dawiya dinyayê û li wir rastî Xwedawen Sidûrî tê:

"Gilgamêş tu bi kur ve diçî?
Jiyana ku tu lê digerî tu qet nabînî!
Dema Yezdan mirovan afirand,
wan mirinê para mirovan xist,
û jiyanê jî ji xwe re hildan"

Lêbelê Gilgamêş bi şîretên wê nasekine û digere heyanî digihîje himberî Keştîvanê mezin Utnapîştim [Nebî Nûhê Babîliyan e, Bra Böckers Lexikon Brepols, Beljîk 1990, cild 24, r 141] û jê pirs kir:

"Ey Utnapîştim gava ez te dibînim, meziniya te cuda nîne, eynî mîna min.
Erê, tu ne cuda yî, eynî fena min.
Lê ji dilê te zahftir, yê min amade ye ji bo cengê -tu li ser piştê dirêjkirî!
Çewa tu ketî nav koma Yezdanan û gihayî jiyanê?"

Bersîva Utnapîştim ya dirêj ji ber pirsa Gilgamêş ve mînakek Sumerî ye ku em di salixdanên dîrokî yên Sumeriyan de dibînin. Meseleya Utnapîştim eyn mîna ya Nebî Nûh e ku Tewrata Mûsa de tê. Çewa Nûh li ser gotina Yezdan, wusa Utnapîştim (Utna-pishtim) jî li ser ya Ea [navê Xwdayê Sumerî û Babîliya ye] keştiyekê ava dike û jin û zaruyên xwe, tevî cotek ji her cureyên heywanan ji Tofanê rizgar dike.

Di dawiya destanê de Gilgamêş bi rihê Enkîdu re dipeyive û hînî nexwşî û bêkêfiya ku di mirinê de heye, dibe:

"Bibêje ey heval bibêje min!
lihevanîna cîhanê ku te dît bibêje!"
-"Ez wê ji te re nabêjim heval ez nabêjim!
Ger ez lihevanîna cîhanê ku min dît, bibêjim
hingê dê tu runêyî û bigirî!"-

Destana Gilgamêş du tiştan rûbarî hev dike: Hevaltî û mirinê, şîn û şahiya hebûnê, kêf û jidiliyê, herweha ew salixa ji macera û serpêhatiyên balkêş, ji mêrxasî û hêzeke xurt a dûrî beşerîyê dide. Bi vê re ew van pirsên han jî tûne rojeva mirovaniyê: Çima meriv dimire? Gelo piştî mirinê jiyan çewa ye û heye yan na? Çi qîmeta jiyanê heye? Gelo Bihişt û Dojeh çewan in û bi çi awayî mirov digihîje wan?

Bîrûbaweriyên jiyaneke din piştî vê

Nivîsên edebiyata Mezopo-tamî ku nifş bi nifş ji devan hatine veguhaztin, di formê xwe yê diyar û pejirandî de bi nameyên navbera mîr, walî, cîgirşah, kargêr û dezgehên dadgehî, hatne temamkirin. Bîrûbaweriyên hebûna barî-geha (alema) berzexê (bin erdê) ku rihê Enkidu ji Gilgamêş re salix dide dibe ku dîtineke oldarî û ne ber bi rastiyê ve be. Ji xwe gava qala wêjeya Mezo-potamyayê bê kirin divê du aliyên wê bêne dîtin: yek aliyê fermî û ya din jî aliyê gelêrî ye. Ji hin tekstên wan yên cihê cihê meriv kêm û zêde dîtinên mirovên Mezopotamî li ser dinya wî alî dibîne û ji xwe di wê ahengê de jî qet hewce nake ku meriv xwe dervayî vê bûyera destanwarî bibîne. Herweha efsaneya rêwingiya Xwedawen Îştar (Ishtar) ya barîgeha bin erdê [alema berzexê] jî bi salixdanên xwe ve dibe alîkarê dîtina baweriya bi jiyana dinya wî alî li Mezopotamyayê. Ew der "welatek e ku kes jê danagere"; li wir mirî di tarîtiyê de dijîn, Xwarin û vexwarina wan toz û herî ye. Bin axê [dinya din] xaniyekî wusa ye ku kesê tê de be bêrohnî dimîne, cilên wî ji pirtikên teyrikan e û perr û baskên wî hene, deriyê wî bendkirî û qefaltî ye.

Wêjeya Zanistî

Ew texlîtê wêjeyê ku jê re "edebyata zanistî" tê gotin, li herêma Mezopotamya bi awa-yên cuda tên pêşkêşkirin. Ev navlêk ji wan lêkolînên ser Tewratê hatine girtin, wek mînak bûyera Job [Eyyûb Pêxember, Eyyûbê Kurma-xwarî] û pirtûka li ser gotinên pêşiya ji vê beşê tên jimartin. Herweha di zimanê Akkadî de jî hinek peyv hene ku ji bo "zanistî" hatine bikaranîn; lê carna bi van navlêkan rewşa rewiştî (moralî) û exlaqî jî tê qestkirin. Bes vê dawiyê zanistî li cem Mezopotamiyan bûye hînbûn û zanîna di heqê aliyên jiyanê yên girîng de, mîna zanîna li ser pirsên Xwedahî û yên efsûnî. Ji xwe bê şik olperestî jî fena beşeke zanistiyê hatiye dîtin.

Em di serpêhatiya ku bi navê "Ludlul bêl nêmeqî" (Destûra min bide ez pesnê mezinê aqilmendîyê bidim) tê navdan de, dibînin ku çewa ji ber hinek sedemên ne diyar belayên cuda têne serê çîrokbêjî. Xweda berê xwe jê dadigerînin, dost, heval û merivên wî jî ji serek û mîrekan bigire heyanî bigihê rêncber û xulaman, kesek wî nasnake û di ser de ew bi êşeke xedar jî dikeve.

Wer tê zanîn ku helbesta "Ludlul" di dawîya salên hezarî (berî Îsa) de tevî naverokek xweşbîn hatiye ziman, bes çend pêl piştre ew wek hevpeyvînek di navbera merivekî û xulamê wî de belav bûye ku hingê meriv tê de rastî jiyaneke bedbînî tê û herweha li wê derê nirxên hebûnê yên hêja û eseyî jî tên înkar kirin. Diyaloga nav wan weha ye:

"Bende (Kole), a niha bi ya min bike!"
"Belê, ez benî.
"Avê bide min, da ku ez destê xwe bişom, çiku ez ê qurabanekê pêşkêş Xwedayê xwe bikim."
"Fermo ez benî qurbana xwe bide, ew ê ku qurbanekê pêşkêşî Xwedayê xwe bike pir şad e".

Ev nivîsar bi kurtayî ji aliyê Emîn Narozî ve ji hin deverên berhema Swêdî ya bi navê "Litteraturens Världs Historia Forntiden", beşa Mezopotamya, hatiye wergerandin.

Lewheyek tevî nexşeyeke cîhanê ya Babîliyan e. Eva han dawiyê ji ber yeka ku bi texmî-nî nêzî 2300 sal berî Îsa çêbûye hatiye nivîsîn

Lewheyeke Asûrî ya heriyê ji vê ne mezintir e. Ev lewheya ku Prof. Læssøe nîşan dide nameyek e ji nûçevanekî dîplomasiyê di navbera qiralê Assûriyan Şamşî-Adad (Shamshi-Adad) I de û waliyek ji yên wê herêma Kurdistana niha ve. Nêzî 1750 sal berî Îsa, wêne Gunvor Jørgsholm

Ev nivîsar bi kurtayî ji aliyê Emîn Narozî ve ji hin deverên berhema Swêdî ya bi navê "Litteraturens Världs Historia Forntiden", beşa Mezopotamya, hatiye wergerandin.

Mahmûd Lewendî

Helbesteke "Û" warî

Û roj hilat
Û roj çû ava
Û tarî daket
Û xewa min hat
Û ez razam
Û min xewn dît
Û bû sibe
Û bi dengê dîk û melê re
Û bi hilatina rojê re
dîsa şîyar bûm
Û mala min viritî
Û dîsa xwirînî
Û taştê
Û firavîn
Û şîv
Û roj çû ava
Û paşşîv
Û dîsa xew
Û dunya pûç û derew!!

CONTENS, CONTENU, INHALT, ÎÇÎNDEKÎLER, EL-FIHRIS Û YÊN ME...!

Zimanê me zimanekî zor zor, pir û gelek û zaf dewlemend e. Bi rastî hela tewr xwedê kêmanîya wan bide -pardon nedehin zimanzanên me hene ku bi kar û bar û şuxul û îş û xebatên xwe yên ilmî-zanistî zimanê me hîn dewlemendtir dikin, berbi pêşde dibin.

Hela tewr gava ku bi tirkî, farisî, erebî an jî bi zimanekî din difikirin û bi kurdî dinivîsin, bi rastî wê gavê ew zimên gelek dewlemend dikin, bêje û peyv û peyvik û kelîme û wuşeyên nuh, tabîrên nuh dixin nava zimanê me û zimanê me jî welê dewlemend dibe ku êdî milletê me (yên ku xwende ne) pêre nagihîjin ku xwe fêrî bêje û peyv û peyvik û wuşe û kelîme û gotinên nuh bikin. Ji ber ku zimanê me roj bi roj (hetta hin kes dibêjin saet bi saet) bi saya van zimanzanên me pêş de diçe, hetta welê pêşde diçe ku mirov gava ku ferqên di nabêna kurdîya mehek berê û ya mehek şûn de (wekî kurdîya meha temmûz û tebaxê)dide ber hev, bi serê xwe tenê ji wan peyvik û gotinên nuh ferhengek pêk tê.

Ji ber vê yekê jî divê mirov ji bo kesên xwende qurseke zimanê kurdî veke daku hîn baştir xwe fêrî zimanê xwe bikin. Her weha divê ku mirov mehê carekê jî ferhengekê derxe.

Nuha emê li vê derê mîsalekê (hûn dikarin wekok, mînak û nimûne jî bi kar bînin) raxin ber çavên we ku wê gavê hûnê bi xwe jî bibînin û fam bikin û her weha jî bigihên ku bi saya van zimanzanên me, zimanê me çiqas pêş ve çûye.

Belê wekî me got emê tenê li ser bareyekê (mewzûyekê) mînakekê bidin.



Kelîmeyek (hûn dikarin wişe, ûşe, peyv, peyvik, gotin, qise, bêje, xeber, qezî jî bi kar bînin) heye ku îngilîz jê re dibêjin CONTENS, Fransiz dibêjin CONTENU, Alman dibêjin INHALT, Swêdî dibêjin INNEHÅL, Tirk dibêjin İÇİNDEKİLER û Kurd jî dibêjin:

1-Têdayî
2-Têxistinî
3-Serecem
4-Naverok
5-Nawerok
6-Nêwerok
7-Têkirinî
8-Hundurî
9-Têda
10-Têde
11-Fêhrist
12-Navî
13-Yêtêda
14-Zikîda
15-Dizikda
16-Zikî (yê di zik de)
17-Di hundur da
18-Di vê jimarê de
19-Di vî hejmarî de
20-Lem jimare da
21-Fêhristî basekan
22-Fêhristî em jimare

Di dewsa bavê xwe de
Polîs:
-Tu çend salî yî?
-Deh salî.
-Deh salî yî û tu dizîyê dikî ha?
-Welleh polîs efendî ez bi xwe ne diz im. Bavê min nexweş e, ez di dewsa wî de kar dikim!



Bajarê Bismilêye gîdipseeen?

Li hêla Bismilê ji gundê Koseliya merivek wê biçe bajêr. Jina wî jê re dibêje:
-Ma bajarê Bismilêye gîdipseeen, Fato êye bîr don getiiir!
-Ma ne bilim ne qedemdiiir?
-Wîîî, ma hema bîr mîtro bîr nigine
Bîr mîtro jî dîger nigine
Ellî santîm nav nigine
Gimî bê santîm jî pizîsine getir bestir!

XAÇEPIRS



ÇEPERAST: 1) a-Rojnameya Kurdî ya ku hejmara wê ya yekem di Gulana 1979`an de li Swêdê dest bi we ana xwe kiriye. b- Manzara. 2) a- Ne wir. b- Navê fîlmek Yilmaz Guney. 3) a-Erd (berevajî) b-Peyveke pesindayinê. 4) a-Hevmaneyeke (sînonîma) zenggirtî (berevajî). b-Baxçeyê buhu tê yê mîtolojîk (berevajî) 5) a-Tewanga piraniyê. b-Peyveke dirûtinê. c-Ne girî. 6) a- Ax b- ne ev. c-pa daçekek. 7) a- Rojeke hefteyê. b- bergeh, navekî lawan. 8) a- Li pasaportê dikeve. b- Dezî. c- Sebir. 9) a-Xezal. b- Beriya ku bibe nan. 10) a-Fikir, dîtin. b- Sala ku em tê de na. 11) a-Navê mehekê. b-Bersiveke bangê. c-Heywanek. 12) a- Li Afrîkayê çolek. b- Bingeh , erd.

SEREJÊR: 1) Zevîya bi av. b-Paytextê Ermenistanê. 2) a- Ji agirî derdiçe, alaw. b- Ne e-kere, bi dizî. 3) a- Ne sar (berevajî) b- Dengê gur û rûvîyan. 4) a-Sembola çînkoyê. b- Pêxemberê fileyan 5) a- Ne kevn. b- Di Kurmancî de ji bo kes û ti tên mê tewanga vegetandekê. c- Hevmaneya anuha. 6) a- Navekî lawan. b-Di alfabeya Kurdî de tîpa hivdemîn û ya dawîyê. 7) a- Zivistanê didine heywanan. b- Ne bi ewr. 8) a-Estrumenteke mûsîkê. b- Ne sibe û ne ob. c- Li ser xwarin tê xwarin. (berevajî) 9) a- Hevmaneya meriv. b- Bîna, xanî. 10) a- Nevek (berevajî) b- Pareyê Tirkiyeyê. (berevajî) 11) a- Bi Dimilî kêber. (berevajî) b- Hevmaneya agirî. 12) a- Hevmaneya tuneye. b- Mirov li ser heywên di idîne.

Serencam

Qedrî CAN

Wexto ki merdim haldê xwi ra razî nêbo û musteqbeldê xwi ra bi guman bo, ageyreno rojandê xwi yê verênan ra ewnêno (winêno). Ze pîranê rizayeyan ki nêwazenê bimirê, tenya û tenya rojandê xwi yê verênan bifikiriyê, xortaneya xwi, qêçekeya xwi biyarê xwi vîrî û bi no awa boya xwi verradê.

Ez jî wina biya, ez jî biya xortêndo pîr. Hewnena vernîda xwi ra: Leylan û gumanî. Hewnena çorşmedê xwi ra, mij û dûman!

E, ez jî ze ê kal û pîrandê xurdebiyayeyan rojanê xwi yê verênan, nemaze rojanê qeçekeyda xwi ana xwi vîrî, zerriya xwi bi hezar û jew hesretî pirr kena û înan ra lezetêndo zerreyên gîna.

Ez ewro parçanê rizayeyanê ê riperanê ki kitabdê umirdê mi ra ameyê dirnayiş arê kena û pê ya dusnena. Wazena înan ra kitabê bextiyarey viraza. Sond. Guna. Rojê vêrdey. Serencam. Nînan ra her jew, kitabdê umirdê min ê şîndarî ra riperêndo rengin o. Labelê renginî benê, zengînî benê, fina jî çend riperrê diratey û rizayey ê. Serencam jî ê riperran ra riperrê yo.

Vîst û panc serrî ra ver bi. Bi meng û hefteyandê xwi, bi şew û rojandê xwi, vîst û panc serrî. Zerrey kê ma di nişka ra hayhûyê dest pa kerd; birayê mi Fethî, nêweşiyênda bol kilmi, nêweşiyênda di-hîrê rojan dim a merdê. A şîn û bermi qandê ey bi.

Fethî ser û nîm mi ra qijêr bi. Çimsiya; rigewr. Mi ra dergêr û qelafetunêr bi.

Ez hem qandê hezkerdişdê xwi hem jî qandê gunadê xwi, herkesî ra vêşêr mergdê ey ver kewtê. Mi xwi mergdê ey rê mesûl û guhakar zanabi.

Welatdê ma di adetê esto; her kes mêwe û êmîşanê xwi yê ki amnan û payîzî ra pêser kenê, dekenê denne û kupan, fekê înan sewax kenê û serrnewe di akenê. Ne wişk benê ne jî kehan. Zey verî tern û teze manenê. A serri ma jî zey her serri êmîşê xwi yê zimistanî hewadaybî. Hewt heşt denneyê girdî pirrî bî û fekê înan sewaxkerdey bî. Şanê serrnewî kê ma bi dost û merdimanê ma pirr bibi. Qeçekê werdî (qijî) bi meraq a bendedê merasîmê akerdişê denneyan bî.

Gama ki maya mi şî mexzena êmîşan denneyê fekakerde û veng dî. Bi riyêndo tirş a polê mi girot ez tê şanaya. Hewna mi ra çiyê nêpersaybî, mi va: "Fethî... Fethî fekê dennî akerd û sincix û kesme qeçekandê mehla ra vila kerdî." Fethî wija di nêbi, şibi serneweyê emda xwi. Ageyrayiş di maya min o tepişt û di sîlleyê şidênayey day piro. Belingaz haya ci çiyê ra çinêbî, hilp hilp berma.

Fekê dennî mi akerdbi û mi bi destandê xwi êmîşê ki miyandê ci hêdî hêdî antîbî. Labelê qandê xwi rê nê, qandê estanikvatoxa hunakari Xeci.

Xeci, pîrênda estanikvatoxi bî. Di seyekê ci estîbî; jew keyna bî, jew jî lajek. Xeci xwi û qeçekê xwi bi estanikan a warî kerdê. Her şanê zimistanî zerreyê kê ci, qeçanê zey mi şeş-hewt serran a pirr bîyê. Werdeni, şimiteni, şîrine, cixara û gaza ay ma ser o bî. A serri êmîşê ay mi ser o bî. Her şan mi may û piyê xwi xapeynayê, mi vatê: Ez do şira embazdê xwi yê mektebî Xurşîtî het, piya dersê xwi biwana.Wija ra, dehlîzêdo teng û tari ra mi xwi resnayê denneyê êmîşan û mi tûnikê çakêt û poltoyê xwi pirr sincox û kesme kerdê û mi berdê estanikvatoxa xwi ver di veng kerdê. Timo mi ra vatê eferim lajê mi, eferim!

Heta goştaritoxê ci temam nêbiyayê, Xeci dest bi estanikan nêkerdê. Verî çimê xwi çorşmedê xwi ra çarnayê û vatê:

- Sado tiya di yo? Ka Remo kotî di yo. Ka Çemo?

Mirîdî jew bi jew hazir biyê. Ay jî dest bi estanikanê xwi kerdê. Ne a ecizyayê ne jî ma mird biyê. Gama ki newe dest pey kerdê, vengê ci hêdî hêdî vijyayê. Qandê ki ma rind bieşnawê ma xwi erd ra kaş kerdê û ma waştê ma nezdiyê ay bibê. Dim a îcab nêkerdê, çende ki şiyê vengê ci berz biyê. Heyecan ameyê ci. Ma jî ze ay kewtê cezbe, dest û lepê ma bêhemdê ma liwayê. A gami qurmê daran jî adirganî miyan di gim gim veşayê. Germê adirî û hilmê qeçekan zerê banî kerdê ze hemam. Xeci cixara cixara ra civistê û xorî xorî antê qirda xwi. Dûnê cixara pirnikandê ci ra pêl pêl vijyayê. Dima vatê: Belê, ma amey kotî? "Mîrza Mehemed xortêndo vîst serre bi. Hewndê xwi di keyna padîşahê perîyan dî. Qandê heskerdişdê ay terkê dîna bi. Rayda ey ser o hewt dêwî estîbî. Bi şimşêrê xwiyê dilejgî ya, serê înan jew bi jew cikerd."

Xeci, heta nîmedê şew ma rê estanikê dêw, perî, cin û ejdîhayan vatê û ma jî zerrîda xwi ra goştareya ay kerdê û ma qehremananê nê estanikan rê heyran heşmetkar mendê.

Mi estanikanê dêwan ra xeylê hes kerdê. Mi zerrîda xwi di vatê: Ax! Werrekîna ez jî rojê zey "Mîrza Mehemedî" qehremanê estanikanê dêwan biyayê û şimşêrêdê min o dilejgî estbiyayê. Ganê mi qandê (semedê) nê efsaneyan recifîyayê, zerriya min bi nê serguzeştan malemal biyê.

Fethîyê bê gunay ê di sîlley marda xwi ra werdî tepîya, şi kujêndê odî di ronişt û dexeriya. Nimajî Fethî bi tayênda germi kewt. Nêşabi cadê xwi miyan ra werzo. Meştêrî taya ci giranêrî bî, fekê ci nêgeyrayê. Pîyê min doktor ard ser, doktorî daru da ci û va: Nêweşiya ci çîyê niya grîpênda şenik a.

Labelê heyf! Roja hîrini birayê minê delalî çimê xwi yewrayî girotî û ma şîn û bermî miyan di verday.

E, nê bî vîst û panc serrî. No serencamo şîndar, heyatê min jahrdaye keno, ez jî zerrîda xwi di, a cinêka pîri ra, a estanikvatoxa gunakari û gûnîni ra hezar û jew nefretî kena.

Labelê tenya -eke nêmerda- ez wazena finê a pîri bivîna û ci rê vaja: Mi jî hes kerd. Mi jî Koyê Qafî ravêrnay. Ez jî kewta dêw û ejdîhayan miyan û înan di pencpenc lej kena. Tenya çiyê mi ra kemî yo; şimşêrê zey şimşêrê "Mîrza Mehemed"î yo dilejg.

Cidêdê, 14.4.1943
Roja Nû, Amor: 2 (10.5.1943), r. 4

Kirdasî ra tadayox: N. Elî

Ferhengekê Kurdkî-Pehlewkî-Kurmanckî -VII

Kirdkî (Zazakî)	Pehlewkî (1)	Kurmanckî
gewat, gewwat	kevat	gewad, qewad
gewezi	gevazen (2)	gewez
gewi, gowi	gobend	gov
gêrayîş, geyrayîş, agêrayîş	gertîten	gerrîn, gerriyan
gêsi, gila	gês, gêsûk	kezî
gi, cî	guh, gu	gû
gil, qil	ger	gir
gilbi, qirrike	gelûk	gewrî, qirrik
gilgil	girgir	gilgil
gilor, gulover, gudilikin	girt	gilol, gilor, gulor, girover
gira, gire, girey	greh, grêh, grih	girê
giran	geran, giran	giran
girane, giryane	gerîvpan, girîvpan, grêv	hustukur, hustuvank
giranî, giraney	geranîh	giranî
girewte	grîftek, grew, grewîk; girîfar	girtî
girewtiş, guretene	grîften, grewîten, stanîden	girtin, stendin, standin
girewtox	grîftar	yê ku digre
goge, gogi, guve	goy, god	gog, go
gorr	gor, gûr	gorr
goşare, gûşare	goşwar	guhar
goşdariti, gos dayêne; eş nawitiş, şinawitiş, hesnayêne	goşîten, oşnûten	guhdan, guhdarî kirin; bihîstin
goşe, koşe	koşek	goşe, koşe
goşt, gûşt	goşt	goşt
goştin	goşten	bi goşt, goştî
goze, gûzi, gwaz	goz, gûz, gûç	gûz, goz, gwîz
gudi, gudilikin, gilor, gulover	girt, ged, get	gil, girover, gulor
gudi, gurz	ged, get	gurz
gule, guli	gul	gul
gum, alişki	gonek	gep, lame
guman	guman	guman
guman kerdiş	gumanîten	guman kirin
[cira] gumankerde	gumangerîk	yê ku jê tê gumankirin
gun, hak	gun, xayek, xayik, hayîk	gun
guna, gune, gunek	gunak, vînas	guneh
gurrî (keçel û gurrî), keçel	ger	gurrî, keçel
gurz	verz	gurz
gûnî, gûnî, gonî, gwîni	xon, xûn	xûn, xwîn
gûnîrijnayî, gûnîricnayey	xonrêçişnîh	xûnrêjî, xwînrêjî

(1)Kelîmeyê Pehlewkîyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Frewşî, Ferhengê Pehlevî

(2)Pehlewkî di "gevazen" yeno me'na "gayê koyî".

Şêx û Mela

Mehdî ÖZSOY

Ey xalê mi, Xalê Hese!
Şêx, melay ma geyren parse
Fitr û zika xwi r' ken hîsse
Çehergûm vazden cûyi* dîy se.

Ey xalê mi, Xal Remezû!
Qey ti ina mendî nezû?
Şêx, melay ma geyren bizû
Wenî kergû, mûnen kuzû.

Ey şêxê mino rilişte*
Ti ma r' kenî qûm û nuşte
Tue **Kird** xwi r' kew yew helquşte*
Ti şew û ruec he y ser ruenişte.

Ey şêxê min fekşuelaqi*
Çi ben însû pey exlaqi
Kirdi r' nî heyon nûn tueraqi
Ti wen nîm leşê bueraqi.

Benû umnû qîjen mele
Kird şin bajar ben 'emele
Dewûn d' xelû, cewû kenû cele
Şêx, melay ma ben qimul*, mele.

Şêx, melay ma şinî dewû
Wenî kergû, dîkû; şimin çayû, qehwû
Çim ginen veywû*, ciniyû
Qirrik qurtnen, liesen lewû.

Ti sera* şin? Ti sera şin?
Ti cezme* kuwen, hewa ra şin
Ti sey fuzû, teyara şin
Tue **Kird** kew pird, ti ser ra şin.

***cezme**: cezbe
cûyi: cuwen, ciwen, ciwîn
fekşuelaqi: fekgilêjgin, fekmalêz
helquşte: Tirkî di "tahterevalli"
qimul: qumili
rilişte: keso ki riyê yê amewo liştiş
ruec: roj, roc, roze
sera: kura, kure, kotî, ça, komca
veywi: veyvi, vêwe

Armanc

Amor: 1
Temûz 1995

Vayi: 40 000 TL
20 SKR
4 DM

Adresê teberdê welatî:
Box: 152 26
161 15 Bromma/Sweden

Endi Qur'an Ki Yasaq O

Mûnzûr ÇEM

Hûmara (amora) 29`ê asma Gulane ya gazeteya "Yeni Politika" de mi xeberê (xeverê) wende. Eke ez mordemêde xam bîyêne, mi dewleta Tirkîya û ûsul û torê dayê rind nas nêkerdêne, ez ecayîvêde giran de mendêne. Ewro eke na xevere mordemêde xêrîvî rê bêro qesêykerdene, sikê min te de çîno ke, îman nêkenê ke çîyêde henên beno. Çi esto ke dewleta ke ma ser o vindeme, Tirkîya wa, cayêde bîn nîyo. Hardê na dewlete ser o, hetê xiravên û rîşî-yayênî ra çîyo ke nêbo, çîno.

Xevere ra gore, Hokmatê Tirkî, "Qanûnê Serekîya Dîyanetî" (Diyanetişleri BaşkanlÞğÞ YasasÞ) rêyna gureto xo dest û te de tayê çî vurnê, o ra têpîya kî Meclîsî rê rusno ke bêro niqaşkerdene, bibo qanun.

Hata naza, kato ke amo kerdene, mordem besekeno vazo ke te de çîyê çîno, karêde normal o. Hama madêda newîye kerda ci ke, mordem ganî (gereke) daye ser o rind vindone.

Na mada ra gore, derheqa dînî de çapkerdena kitav, broşûr û çîyanê henênanê bî-nan ya kî hazirkerdene û vilakerdena film û bandan (kasetan) hata ke îzna Dîyanetî çîne bo, mumkune nîya. Eke welatanê bînan de bêrê hazirkerdene kî têpîya ardena înan be Tirkîya, êynî ûsul ra girêdayî ya. Kam ke na qanûnî ra gore hereket mekero ya kî dustê dêy de kar bikero, ceza xo şeş asmî ra hata 2 serrî hepis û 10 milyonî ra hata 50 milyon lîra pere wo.

Eskera wo ke na qanûn, yanê qanûno ke derheqa Dî-yanetî der o kî bêsebeb (bêsevev) nîno vurrnayîş. Se-bebo ke hokmat na qanûn nîya vurrneno, na wo:

Ez hen zonen ke yêno ra wendoxû vîrî, par moredemêde Kurdî (namê xo kî Abdullah Varli yo), Qur'an çarna Kurdkî (zaravê Kurmancî) û çap kerd. Waxto ke na kitav vêjîya kî, tekit şî Çankaya, Süleyman Demirel zîyaret kerd û ci ra zû, zê halête (hedîye) da ci.

Ma eve Kurdkî kitavê bêro çapkerdene, hem kî no kitav Qur'an bo, dewleta Tirkîya qe bêveng vindena? Îdarê a dewlete, mumkuno ke çîyêde nî-yanên qebûl bikero? Nê, mumkun nîyo. Nika wazenê ke yê Qûr'anî yasaq kerê û îyê ke êhtîmal esto ke na ra têpîya vêjîyênê, raye ro dîne kî bibirnêne.

Çi esto ke bêbextî rasterast nêvanê ke "eve Kurdkî mesela dînî ser o kitav nusnayêne yasaq a". Hurêndîya naye de, zê her waxtî fêlbazênî nanê ro xo ver, wazenê ke eve qurnazênî karê xo berê ser. Uzay ser o kî, vanê " karo nîyanên bê îzna Dîyanetî nêbeno". Her kes zoneno ke, mesela Kurdan ser o qe ferqêde Dîyanetî û polîsê Tirkî çîno.

"Naza de noxtêda bîne ki esta ke mordem ganî (gereke) weş ser o vindone û verê çimonê xo ra durî mefîyone: Dismenê miletê ma, honde fetelneno ke zonê ma werte ra wedaro û seva na karê xiravinî, çi ke dest ra ame keno; yê ma kî hona tayê, qiymetê zonî çik o nêzonenê, zonê xo qesêy nêkenê, eve dêy (êy) nêwanenê û nênusenê. Dismen dismenayêna xo keno, ma na halê mawo nîya xirav çik o? "

Mordem naye kî xo vîr a mekero ke, qanûno nîyanên, raya virêne nîya ke Tirkîya de vêjîno. Tirkan di ser-rî ra ravêr, qanûnê radyo û televîzyonî kî êynî şekîl de vet. Yîne o qanûn de îlan kerd ke "Tir-kî ra qederî (bêxeyja Tirkî), zonêde bîn de hazirkerdena programanê radyo û televîzyonî yasaq a". Hama heto zû ra na qanûn vet, heto bîn ra kî radyo û televîzyonê Tirkan de eve zaf zonû programî amêne hazirkerdene. Mesela Îngilîzkî, Frensizkî, Almankî dêyme radyo û televizyononê Tirkan de nêame yasaqkerdene. Çike qanûn têyna seva Kurdkî vê-jîyavî, hama name eve şekîlêde bîn amêvî dayêne.

Nayê ke Tirkîya îdare kenê, peroz û pesewe îddîa kenê vanê ke "Ma têde Musilmanî me û wertê ma de birayîye esta". Ma na senê birayîya nîyanên a ke birawo zû, zonê birayê bînî de kitavanê dînî kî yasaq keno? Eke Kurdê dîndarî peroz-pesewe minete bikerê, vazê "Heqo, na Tirkê ke Tirkîya îdare kenê, ti ma birayîya dîne ra bisevekne" neq ê? Nê, neqî nîyê.

Naza de noxtêda bîne ki esta ke mordem ganî (gereke) weş ser o vindone û verê çimonê xo ra durî mefîyone: Dismenê miletê ma, honde fetelneno ke zonê ma werte ra wedaro û seva na karê xiravinî, çi ke dest ra ame keno; yê ma kî hona tayê, qiymetê zonî çik o nêzonenê, zonê xo qesêy nêkenê, eve dêy (êy) nêwanenê û nênusenê. Dismen dismena-yêna xo keno, na na halê mawo nîya xirav çik o? ❐

Foto: Armanc

Ordiyê Tirkan fina dekewt Kurdistanê Başûrî

Ordiyê Tirkiye rojê 6. 7. 1995 fina hucûmê Kurdistanê Başûrî kerd. Gorey beyanê PDK- Îraqî, eskerê Tirkan seat 11.30 di mintiqada Mizûra ra, qezada Mêrgesor ra 15 kîlometrey kewtê erdê Kurdistanê Başûrî miyan. Beyan di yeno nuştiş ki hîrê dewijî birîndar biyê û di dewijî jî vinî biyê. Qandê ki Tirkî ebi top û teyaran a mintiqa bombardiman kenê, dewijê 18 dewan ki 800 keye yê û nufûsê înan 3 hezarî vêşêrî yo dewê xwi teriknayê û ameyê mintiqada Dîyana û Sardar.

Dewê ki ameyê bombardimankerdiş nê yê: Şîva, Birkela, Mîrûz, Bûsa, Bizyan, Koran, Balan, Dîzo, Sipin-dar, Binavê, Bêndero, Çema, Kuwîzî, Sîlka, Sitobî, Sîfya, Mûka û Soma.

Mehkema HADEP

Rojê 6.7.1995 di mehkema HADEP (Partiya Şarî ya Demokrasî) estbî û semedê na ra xeylê kesî şîbî wija ki goştareya mehkema bikerê û bimûsnê ki ê HADEP hetek dir ê. Labelê mehkema qerar girot ki celseyê mehkema nimite dewam bikero, cora jî ê kesê ki waştê goştareya mehkema bikerê nêgirotî zere. Nay ser o ê kesan dest bi protestoy kerd û waştî ki mehkema eşkera bibo. Polîsan ê bînada mehkema ra vetî teber. Wexto ki înan teber a jî wina dewam kerd, noqor polîsan înan ra 250 kesî ki parlamenterê DEP yo verên SÞrrÞ SakÞk jî miyan di bi, nişnay (wenay) otobusan û berdî nezaret.

Waliyê Halo Îstisnaî Unal Erkan

Halo Istisnaî dewam keno

Halo îstisnaî (Olağanüstü Hal) yo ki xeylê cayandê Kurdistanê Vakurî di bi serrana wo esto, çihar mengîna ame dergkerdiş. Zeki yeno zanayiş no bi çend finî ki hukmat vano na fin fina peyen a, labelê wexto ki mohletê nê halî qedêno, MGK (Konseya Emniyetê Mîllî) qerar gîna ki no hal hewna dewam bikero.

Ne 17 serrî yo ki Kurdistanê Vakurî di ya îdareyê urfî ya jî halo îstisnaî esto ki Kurdistanî

Wa Halo Îstisnaî Werzo!



Azîz Nesîn şi rehmet

Nuştoxo namedar Azîz Nesîn rojê 6.7.1995 di Çeşme di wefat kerd. A. Nesîn şibi Çeşme ki kitabanê xwi qandê wendoxandê xwi îmza bikero, labelê zerriya ci xwi ver o nêda û ey 80 serreyda xwi di na dinya ra bar kerd. Azîz Nesîn nuştoxêndê mîzahî bi ki nezdiyê se kitabî nûştê û nê kitabê ci tadiyayê (açarniyayê) xeylê ziwanandê bînan jî ki nê ziwanan miyan di Kurdkî jî esto.

Zeki yeno zanayiş îslamîstan waşt di serrî ra ver ey Sêwas di biveşnê, o merg ra reyabi labelê wica di 37 kesî ameybî veşnayiş. A. Nesîn merdimêndo ateîst bi co ra jî îslamîstan fetwaya kiştena ci daybî.